

BERNAMEGEH

**MERVAN
SERHILDAN**

**BAHADÎN
ROBAR**

**ÎKRAM
OGUZ**

**NÎHAT
GULTEKÎN**

**OCCO
MAHABAD**

**LOKMAN
POLAT**



NAVEROK

- 04 Ji Edîtor
- 05 Nihat Gültekin / Fêrîkê Ûsiv, Hecîyê Cindî û Fîncana Rıza Kurmet
- 11 Nûroj Munzur / Notayên Bê Xew
- 12 Occo Mahabad / Di Qesrên Osmanî de Helbestvanek: Şikriyê Bedlisî
- 15 Nezehat Dogan / Êşperest im
- 16 Lokman Polat / Di Edebiyatê De Hunera Gotinê
- 19 Serdar Kômürcü / Lê Tu Çû
- 20 Ersin Tek / Peyv
- 22 Cahit Aybar / Bo Tenê Em
- 23 Îkram Oguz / Dengbêjî û Axaftina Stranbêjan
- 26 Rêber Hebûn / Keça Kanî
- 27 Rostem Xamoş / Ez Zarok im
- 28 Keyhan Mihemedînijad / Gelê Kurd Piştî Bi Dawîhatina Peymana Lozanê Dê Bibe Bi Dewletek Serbixwe?
- 31 Hasbeg Koksal / Heyva Çardeşevî
- 33 Rûbar Elî / Tu Bi Xêr Hatî
- 34 Konê Reş / Bi Xêra Mîr Celadet Bedirxan Zimanê Me ji Axaftinê Bûye Zimanê Nivîsandinê
- 36 Xizan Şîlan / Çavzeytûna Min
- 37 Remezan Bakur / Li Kurdistanê Nasyonalizima Bawerî û Bîrdozîyan
- 39 Azad Ekkaş / Îdameke Li Taximê Gund
- 40 Dennis Dargul / Ala Min
- 41 Îhsan Bîrgul / Ziman û Siyaset
- 43 Ciwan Serhedyan / Ez ê Werim

NAVEROK

44 Siraç Oguz / Dr. Nûrî Dersimî Ronahîya
Çavê Gelê Kurd e!

47 Dilazad A.R.T / Nêrîneke Giştî
Li Ser Edebiyata Nûjen Ya Kurdî

50 Zozan Sarica / Evîn û Êş

51 Mervan Serhildan / Xewna Min

55 Çayan Okuduci / Venekir

56 Mehmûd Badilî / Vexwendina Li Malê

60 Mamo Kader / Di Navbera 2 Metreyan û
Valahiyê de

61 Rûmet Med / Pêşengê Sînemaya Rêbaza
Rastîbîniya Nû; Vittorio De Sica

63 Ehmedê Goyî / Helbest

64 Muqades Agirî / Stêrka Helbestan Mestûre
Erdelan

67 Ezîzê Gerdenzerî / Çil Romanên Kurdî

69 Rojbîn Özkan / Çîrokek Ji Devê Bavê Min
Melle Muhammed: Arraf (Pispor)

71 Umîd Demîrhan / Kurd û Teoriya Dewletê

78 Helbest: Wefaî Leyla - Bavê Min Mir /
Wergera Kurdî ji Erebî: Mîran Dilêr

79 Soran Hemereş / ÊL Begê Caf : Mux,
Pîrmend û Pêşbînvanekî Mezin Ê Kurd Ê Ji
Bîrçûyî?
Wergera Ji zaravayê Soranî: Muhsîn
Ozdemîr

82 Newaf Mîro / Êzîdiyo

83 Bahadîn Robar / Girîngiya Zimanê Nivîskî



Ji Edîtor

Xwendevanên hêja piştî ewqas zehmetiyan em dîsa bi hejmareke nû bi we re ne.

Em dibînin ku berî her tiştî ji bo Kurdan demokrasiyeke hundirîn pêwîst e. Sazî û dezgehên her roj demokrasiyê dixwazin û taleb dikin mixabin di nava xwe de ne demokrat in û bi awayeke demokratîk kar û barên xwe nameşînin. Kî kê rexne bike wek xayîn û xêrnexwaz tê dîtin. Divê em ji bîr nekin ku talûkeya herî xedar yek dengî yek rengî û yek fikrî ye. Kurdên ku ji hev cudatir difikirin divê ji hev re hurmetkar bin. Pirsgirêkên xwe bi rê û rêbazên aştiyane çareser bikin.

Di vê hejmarê de Nîhat Gultekîn mijara Fêrîkê Ûsiv, Hecîyê Cindî û Fîncana Rîza Kurmet hildaye dest, Occo Mahabad ji me re behsa helbestvanê hêja yê dema Osmanî Şikriyê Bedlisî kiriye, Siraç Oguz berê xwe daye jiyana û xebatên Dr. Nûrî Dersimî û daye pey dewreke girîng, Lokman Polat li ser edebiyatê û hunera vegotinê sekiniye da ku bê fêmkirin. Di vê hejmarê de gellek gotar, çîrok û helbest li benda xwendin û nixandina we ye.

Koordînatore Gîştî: Occo Mahabad

Edîtor: Mihemed Keskîn, Cîhan Soylu

Redaksiyon: Serhad Aslan

Rûpelsazî: Mîtannî Ajans

Email: bernamegeh@gmail.com

Malper: www.bernamegeh.org

Her nivîskar ji nivîsên xwe berpirsiyar in.



Nihat Gültekin

Fêrîkê Ûsiv, Hecîyê Cindî û Fîncana Rıza Kurmet

Di dema sala 1917'an de Rûsyayê Şoreşa Oktoberê dest pê bû. Leşker û qewatên Êzîdî di nav sînoren tirkîyê dikişin û diçin. Di gava şerê cihanê ya yekemîn qedîya, sala 1918'an rewşa Kurdên Êzîdî êdî reş dibe, her rojên wan her diçe xirab dibe. Qismek Êzîdiyên Serhedê taybetî ya bajarê Qersê, li navçe û gundan, mal û milkê xwe dihêlin, ber bi Ermenîstanê, Azerbaycanê, Gurcistanê direvin. Gelek malên Êzîdî jî hev belav dibin, koka wan tê qelandinê. Dema cî û warên xwe derbas dibin aliyê Êzîdî, bi rê de wan malbatan gelek kes dimirin, gelek birîndar dibin, gelek ji wan jî winda dibin. Gelek nivîskaran saloxên rêwîtiya Êzîdîya bi hûrgilî nivîsandine.

Li ser wan rojên man û nemanê, zor zehmetiyên ku wê deme li ser malbat û civata Êzîdîyan hebûye sekinîne. Piraniya van malbatan karesat û çîrokên mezin li dû xwe dihelin. Armanca min di vê nivîsê de, çîroka malbateke Êzîdîya ya sed salan e. Di nav wan malbatan yek jî, malbata Îvovê Hemo û Zeyneva jina wî bû. Ew malbat xelke li gunde Emançayîra Qersê bû. Nêvîyên wan bave folklorê kurdan Hecîyê Cindî dema gund derdikeve heşt salî bûye û dayîka wî Zozan gund dimîne. Hecîyê Cindî gundê xwe, zarokatîya wî ku derê derbas bûye pir hez dike. Bîranînên wî yên pir şîrin bi wî gundî va, Emançayîrê re girêdayîye.

Di bîranînên xwe de behsa gunde xwe dike wiha neql dike; "...Emançayîr, raste, gundekî biçûke, lê ji aliyê xwezayêda gelekî dewlemende; gundê çîya, gelî-geboza, çayîra, çîmana, gul û gîhaye, gundê kulilkêd cure-cure sersorka, beybûna, piltana, pilitoka, xaşxaşika, gulê gulgeş û yêd mayîna bînxweşe....Navê gundê me û navê dîya min navê tebîyetêva girêdayîne. Kî dihate gundê me, wan çayîr, çîmana mêze dikir, digot;" Eman.....çayir..." Lê navê dîya min jî – Zozan, hemîn navê zozanêd meye delale...

...Lê xazma baharê qîz û bûkêd gund bi dêrê qîçik, sor, kesk, temeziyêd reng-rengî, sêrî, kofî û kitan, fîno û qotik girêdayî, di nava gul-gîhadada pêqask, kereng, siping, cetirî, tirşo, mendik berev dikirin. Te digo, her yek kulilkeke; ewana û qul-sosinê wan çayîra pir li hev dikirin. Dengê sitranêd wane xweş ji herdera dihatin...

Gundiyê me payê pirê xweliyê bêcer dikirin, heywanet xwey dikirin. Kulfetê gundê me bi hostatî bert evinê rûdiniştin û xalî-xalîçê pir bedew çêdikirin.

...Gundê me qeza Qersêda eyan bû çawa gundê bedewa. Carna jî jêra digotin gundê Zozana Îvo. Zozan haqa bedew, jêhatî bû, kê lê binhêrya, jê têr nedibû... Merivê ji şêherê padişê (S.Pêtêrsbûrgê) hatî xwestibûn şikilê wê bikşînin; wanara pesnê Zozana dîya min dabûn. Lê malbavanê wê keça xwe veşartibûn. Kalkê minî Îvo gotibû;- Kî zane, dewlete, dive şikilê wê bikşînin, paşê bên Zozanê hildin, bivin?

Minê xwelîya wî gundî bi dilê tijî paç kira. Ew xwelîya, ku xûşk û bira, pîrik û kalkê min, dê û bavê mine pir hizkirî, min ra timê bedew û cahil mayî lê geryane..."

Malbata Îvoyê Hemo û Zeyneva jina wî ji êla Sîpkan, bereka Witîyan bûn. Şeş zarên wan, Hesên, Zozan, Çîlê, Xezal, Kidê û Ûsiv hebûne.

Dema derbasbûna sinorên Rûsya yê dibin, Zozan, Çîlê û Xezal li Emançayîra Qersê dimînin. Ûsiv, Hesên, Kidê jî tevî qewm û pismamên xwe pêşiyê li Tiffîsê star dibin. Paşê tên Ermenîstanê li gundê Pampa Kurdan (Sîpan) dihêwirin. Hecîyê Cindî paşwextîye pê dihese ku, wekî xatîya wî Kidê, xalên wî Hesên û Ûsiv saxin û li gundê Pampa Kurdan da dijîn. Dema hevdu dibînin Hecîyê Cindî wiha kal dike;"...Em rastî hev hatin. Te bidîta şabûna Kida xatîya min....digirîya, dora min diçû-dihat. "Pî, digot eva kurê Zozana xuşke...Ez bi qurban, de were rûnê, de gilîke, de bêje...qurbana bejin-bala tebim.." Kida xatî êpêce dîya min danî bîr; kinêz, xîret û karkireke zor bû. Min ew dîtin, min tirê min hebûneke bê hed- hesav ditîye....Peyra guhê me tim ser hev bû."

Dema koçberbûne de mêrê Xezalê Koroxlî tê kuştinê, Hesênîkê Cemaldînî wek kevanîka xwe Xezalê xweyî dibe. Wan salan di nawça Dîgorê de dimînin. Dema birayê Fêrîk Hemo name gundê Qersê re binivîsandina, ew name dibirin cem Hecîyê Cindî. Wek tê zanîne Hecîyê Cindî li Ermenîstanê bi Erebe Şemo, Casimê Celîl, Emînê Evdal, Cerdoyê Gêncî, Wezîrê Nadîrî, Ahmedê Mîrazî re li ber çavkanîya wêjeya Kurdî li wê komara Sovyetê rawestîyabû, bi wan re hîmê wêjeya Kurdî li temamîya Sovyetîstanê danîbû. Hecîyê Cindî ew name werdigerand ser zimane tirkî. Paşê name dişandin û paşê bersîva derheqa Xezalê disekînin. Dema dişandin tu car hêvîya xwe nedibirîn. Gelek wext şûnda bersîva nama dihat. Riza dinivîsê Xezal ji vê dinyaya ronik xatir xwestîye. Lê ew bi xwe dixwaze bê dîtina xala, xatîyê xwe û lawên xatiya.

Kurê Xezalê Rîza, ji bo dayîka xwe zivistana sala 1978'an ji Qersê rê dikeve diçe Ermenîstanê.

Paşwextîyê Fêrîkê Ûsiv derhaqa hatina kurmetê xwe Riza de di destana xwe Rizayê Kurmet dinivîse. Min ew destana Rizayê Kurmet, cara ewil kitêba aliyê weşanxana Lîsê hatibû çapkirin a bi navê Êvara Zivistanê de xwendibû. Lê min mijara destanê nizanibû, ez paşê agahdar bûm.

Li Stenbolê qîza Fêrîkê Ûsiv Zerê xanim re me sala 2017'an meha nehan roja dehan (10.09.2017) hev dû dît. Zerê re nasîna min li ser medya sosyal de çêbû. Bo kitêbên bavê xwe bide çapkirinê me gelek hewil da. Di dawîyê de hinek dereng be jî hat weşandinê. Di nav wan heft kitêban da kitêba Dinya Delal de destana Rizayê Kurmet hat weşandinê. Ez cara peşîn pê dihesim ku Rizayê Kurmete Fêrîkê Ûsiv hatiye Ermenistanê. Ew bûyer her çiqas bo her dû malbatan balkeş be jî bo min jî gelek başkêş û watedar bû.

Dema ez havîna sala 2018'an çûm Ermenîstanê ez gundê Pampa Kurdan mala kurê birê Fêrîkê Ûsiv, di mala Ezîz de mêvan mam. Li wê gundî muzexana Fêrîkê Ûsiv û dibistana Fêrîkê Ûsiv hebû. Dema min wan her dû cî ziyaret kir, ez li vir mamoste Almast Hsoyan re nas bûm. Dema em ketine di nava mal muzeyê û dibistanê, mamoste Almast berê xwe da min û bi qedrekî gelekî giranbuha bixêr hatina min silav kir. Dema behsa xwe kir, xwe wek şagirte Fêrîkê Ûsiv da nasîne. Dema Fêrîkê Ûsiv di dibistanê de mamostetî kirîye Almast Hsoyan jî xwendekarê dibistanê bûye. Ji me re çend destan û helbestên Fêrîkê Ûsiv xwend, min gelek eciband bi dil xwendina helbesta. Dema me li wir behsa Fêrîkê Ûsiv dikir, me qala destana Rizayê Kurmet jî kir. Min re gotin tu derhaqa hatina Riza a Ermenistanê dikarî agahîyên baş xanima Fêrîk, Firîda Hecî Cewarî bigirî. Di bernama min de ziyareta wê jî hebû lê ew li gund nedima, mala wê Yêrêvanê bû, li wir dima.

Çend roj şûnda ez û kekê Ezîz çûn ziyareta Firîda Hecî Cewarî. Em dema teksîyê peya bûn, min kolanên Firîda Cewarî temaşe kir. Ev û Hecîyê Cindî li wan deran, wan kolanan geriyane. Cihê em li vir bûn, apartmana ku mala Firîda Cewarî lê dijî bû. Hejmara kolana wê 10 bû. Baxçeyê apartmanê tune bû, em rasterast diçin daîreya ew tê da dijî. Firîda Cewarî bi tevî kurê xwe Zoro va kelecana li benda me bû. Me li vir dê û kur re dût û dirêj xeber da. Zoro hem behsa hunera xwe dikir, wêneyên çêkirîbû min re nîşan dida, hem jî dikete di nav sohbeta min û dayîka xwe. Lê mixabin emrê dayîka wî zêde bû, nikaribû zêde xeber bide. Firîda Hecî Cewarî qîza Hecîyê Cindî ye, Hecîyê Cindî jî kurê Zozanê ye. Xezal, Zozan û bavê Fêrîkê Ûsiv tev kur û qîzên Îvoyê Hemo û Zeyneva jina wî ne. Mirov dikare bibêje hemû endamên malbatekê ne. Riza bi hesreta malbata xwe, teva nasên xwe bibîne tê Yêrêvanê. Neferên malbata xwe, xal û xarziyên xwe dibîne, diçe ser goristana gelek eqreba xwe. Di merzela eqreba xwe de xwulîyê hildide û bi xwe re dibe Qersê. Riza 40 sal berê hatibû wê malbatê. 40 sal derbas bû, me dîsa behsa hatina Riza li wî malê dikir.

Fêrîkê Ûsiv demek şûnda destana Riza Kurmet dinivîse. Ew helbest dema Riza Qersê tê Yêrêvanê li ser hatina wî tê nivîsandinê. Ew demana sinor derbaskirin gelek zehmet û çetin bû. Li bajarê Qersê hatina welatê Ûrîs birastî mirov dikare bibêje yê yekem bû. Em dema li mala Firîda Cewarî bûn, min ew çax seredana kurê Xezalê Riza jî jê pirsî. Min bîranînen xwe de nivîsiye got û min re wiha qal kirîbû; "Riza û Xanîma wî Gulê hatibûn. Sala 1978'an bû. Dema Riza hatibû Yêrêvanê, şeveke zivistanê bi têtêfonê me ra gotibûn; bersîva mêvanê xwe yê ji Tûrkiyê bidin. Mala me Pampa Kurdan bû.

Fêrîk jê re xeber da, got Riza tu yî? Tu kîjan hotêlê danî, emê bên xeberdin. Riza got, Fêrîk ezim, ez bi qurban, xalên min qe çawanin? Ez di hotêla Anî ye da me. Êvara dereng em çûn hotela ew li Yêrêvanê bû. Riza ewqas rê hatibû, em bi teksîyê zû çûn hotêlê. Me rê de qet xeber neda, her yek me di mitala da bûn. Me dixwest wekî deqekê zû Riza bibînin. Dergevanê hotêlê ji wan re dibêje; "Hêvîya wene, herine filan odê." Me derê odê xist, Riza derî vekir. Riza bi kiras û derpê ve derê oda xwe vekir, wî û Fêrîk hev hemêz kirin. Hey yekî digot birê min, hey ewê din. Riza bedew û xeberxweş bû. Ez û Gulê jî îske îska me bû, li dora wan diçûn, dihatin. Jina Riza Gulê, jineke zarxweşe xaşik bû. Riza dema derheqa xal û xatîya ji me pirsî, Fêrîk got ew çûne ax û barê sar. Ew çax girîya. Digot wax dayê, ez dereng hatim dîtina xwûşk û birên te. Riza pey mirina dayîka xwe, dixwe heşê xwe, dixwaze çî dibe bila bibe here Ermenîstanê. Dayka wî nasên xwe nedît, lê dixwaze dewsa dayîka xwe li Ermenîstanê xwûşk û birên dayîka xwe bibîne. Dema hat pey mirina xwûşk û birayên dayika xwe, digot dayka Xezal tu min bibaxşîne, ez dereng hat im. Fêrîk re digot ez ketime bextê te, em zû herin gund, ez herim ser mezelê wan.

Berbangê em hatin mala bavê min. Li wir jî ji şabûna girîyan. Bavê min dîgo; "Bera rehma Xwedê xatîya min be, bera rûhê xatîya min Xezalê ragihîje kesverê rem û rihetîya heta- hetayê. Digot, welle ez îro pir dilşame bona hatina Rizayê bira, Rizayê kurxatî û helala wî Gula xûşk. Digot, hûn ji gundê Qizilqulê heta vira ser herdu çavên min ra hatine." Hatina Riza ra bavê min pir kefxweş bûbû. Dayîka min paşwextîyê min re digot, dema Riza û Gulê lawikara çûne Pampê, Hecîyê Cindî nişkêva dudilî dibe. Gotiyê ku; "Gelo rastî Riza kurê xatîyê? Dibê merivê xerîbe, tirka wîya bona min şandine.

" Ji ber ku Hecîyê Cindî pê radiyoya Yêrêvanêye bi zimanê kurdî pir cara bo qetilyama û înkarkirina kurda dijî tirka xeber dida û xênjî wê, pey kela Bolşêvîk ra ji meriva ha-hanga bawer nedikir, ê ne wê demê çûyîn hatin jî pir çetin bû.

Sal derbas dibin, sînorên dewleta dikevin navbera xwûşk û bira. Bira nizanin çî hate serê xwûşka. Xezal malbavana xwe bîra nake. Riza gilî dike çawa dêya wî hertim destê wî digire û li malê dibê ber avê, wî alî sînor. Û li vir deya wî çawa gazî dike, ji sînorçiya pirsax xûşk birê xwe dike. Ew sereskerê sînorçiya behs dike, kurd bûye. Ew sînorçi Hecîyê Cindî re behs dike. Bavê Ferîdê Cewarî, dibêje navê wê neferê çima jêra negotîye, sînorçi neheq dike. Destana xwe de Fêrîkê Ûsiv wiha dibîne ziman;

.....Xezalê

Nuxurîyê xwe daye du xwe,

Hatîye xamê "Delfî-Qazî"

Û deyl sînorvane kirîye,

Ez Xezal im,

êzdîya Sîpkî, Qîza Îvo,

Xûşka Hesen,

xûşka Ûsiv,

Kevanîka Hesenîkê Cemaldînî,

Sînorçîyo ez bextê te me

Tuyê cawekê min ra bînî

Hesen sax e,

Ûsiv sax e,

Kidê sax e,

Gelo qet wan dera nakin

Pirsax halê xweyînga xwe?

Fêrîkê Ûsiv li gund re bi têtêfonê birê

xwera diaxife, dibêje; "Çevên we teva ronî

be, Riza jina xwe va hatine Yêrêvanê."

Birê wî jî dibêje; "Ser herdu çavê me, ser

serê mera hatine, bi xêr hatine....welle,

berf zehf ketiye, rê hatine girtinê, lê çawa

jî hebe emê îro bi "Wîlîsa" Hemo bên.

Birê Ferîk berdewam dikir, digot wekî

lawikê gund naka rêya Pampê û

gorîstanê vekirine. Êdî çûbûn gundê

Pampê.

Riza dema diçe goristana gundê Pampê, ji pey mirina dêya xwe dema tê Yêrêvanê ji mezelê dîya xw xwulî tîne li wir gorên xal û xatiyan xwûlîyê direjîne. Li wir jî hinek xweliya ser gorê hildide, wekî paşê bibe Qersê, biavêje ser gora deya xwe Xezalê. Çawa Fêrîkê Ûsiv destana xweye Rizayê kurmet de nivîsiye; Tevî xizm û xûnavê gund Xwey- xûnavê dereng hatî Diçe pala çiyayê bilind Ser mezelê xal û xatî....

Çenge xweliya mezelê xal
Û mezelê Kida xatî,
Dike nava dezmalala al
Bi tiberkî, tulizmatî

Wekî bibe here wira
Bireşîne bi şîn şayî
Ser mezelê xûşka wane
Ax û keser dilda mayî...

Fêrîk ew çax gilî dikir, "Der û cînar temam hatin, hilyşan ser me û herkesî çavronayî dida me. Tev di heyra Riza da bûn, digotin;"Ser çava ra hatî, bi xêr hatî." Her roj ew mêvanê birakî min bûn, her dera bi def û zûrnê va kêf dikirin, govend digirtin. Riza û Gulê jî dileşq diketin govendê.."

Wezîrê Eşo jî bîranîna xwe da dinivîse;" Min temî li lawên apê Ûsivê Îvo kir, ku ew Riza û Gulê ji Pampê bibin Sipîtakê, dîtina birê min. Şîraliyê Eşo, ku li nexweşxana wî bajarî da serokê xîrûrgiyê bû. Min dixwest, ku Şîraliyê weke min hisreta Qersiyana da jî Riza û jina wî bibîne, şa û kêfxweş bibe. Yekê jî Gulê ji sehet, tunduristiya xwe digazî. Min dixwest, ku Şîralî alîkarîya wê bike. Lawika daxweza min bi cî anî bûn, Riza û Gulê biribûn Sipîtakê mala Şîralî. Li wira Şîralî teseliya tunduristiya Gula bûk kiribû, boxçekî mezin jê ra dû derman danî bûn, ku piştî çûyîne ew wana bixwe.

Gava Riza û Gulê ji Pampê vegeryan, Gula bûk her wa heyîra Şîralî da bû, pesina wî dida û digot;"Şîraliyê min mîr e."

Berî çûyîna xwe ya Romê, Riza û Gulê vegeyîyan Yêrêvanê. Ew roj dîsa tên mala Hecîyê Cindî. Riza dema gilîyên dêya xwe derheqa şewitandina lodê, diziyê û derheqa mêrxasiya xatiya xweya Zozanê da gilî dike Hecîyê Cindî aram dibe. Ji ber ku Hecîyê Cindî wan gotina zanibû. Êdî Hecîyê Cindî Riza sedî sed bawer dike. Dîsa hatina wî re bêhed û hesab şadibe. Paşwextiyê pir berxwe dikeve, ji ber ku pêra negîhandîye Riza re foyê xwe bikşîne. Kurdên nas û nenas hemû hatibûn dîtina Rîza û jina wî. Paşê bi avtoyen lawikên gundê Pampê rêketin ber bi bajarê Gumrîyê, weki ji wir jî bi tîrenê herine Qersê. Dema li Gumrîyê xatir ji hev dixwazin, Riza dilşewat dibêje; "Qurbana we bim, ezê dîsa bêm dîtina we..." Fêrîkê Ûsiv wiha xeber dide; "Ew xeber bûn agir, dilê min şewitandin, wê deqê, nizanîm çima, min tirê ezê êdî Riza nebînim".


Riza dema vedigere rojekê jî cawa nebixêr malxalana ra tê;
Reş girêda xalojna pîr
Xalana kir şîn û girî,
Bi edetê êl û eşîr
Cînar hatin serxweşya wan....

Çi bi Riza hat, -ji hev pirsîn-
Bi wî mêrês ip- silamet,
Nexweşyê mir yan bi qezyê
Yanê kete tora nemerd?
Kî dizane sîyasete-
Setya mixenete mexsûs,
Dibe mêrkê bê zîyan-zede
Hesibandin çawa cesûs....
Fêrîkê Ûsiv vê helbesta dilşewat sala 1985'an dinivîse. Li ser temaya malbata xwe, sînor, hesret û mirinê hatiye nivîsandinê.



Wek tê zanîne helbest û destanên Fêrîkê
Ûsiv tev jî serketî û dewlemendîya
edebiyeta gelê me ne.

Dawîya hesreta salan hatibû. Ez qet
nedifikirîm ku piştî 100 salan, malbatên
her du aliyê sînor, bi alîkarîya min li hev
nas bin û bicivin. Hevdîtina neviçirkên
malbatê 100 sal şûnda pek hatibû. Em
tev cem hev bûn. Ev tev neviçirkên Îvoyê
Hemo û Zeyneva jina wî bû. Dema em
kurê Riza re hatin ba hev, axaftina wî ya
bi girî re em matmayîn man. Ji me re,
dema bavê wî Riza Yêrêvanê tê wek
dîyarîyekê taximek fîncan anîbûn, nîşanî
me da. 40 sale di mala xwe de we taqîma
fîncanê xwayî dikin. Min cend heb
wêneyên fîncana kişand. Ew mijara
fîncan û hevdîtina neviçirkên malbata jî
mijara nivîsek dinê ye.....



Çavkanî;
Hevdîtina min Frida Cewarî û kurê wê Zoro. Yêrêvan
2018
Hevdîtina min mamoste Almast Hsoyan. Pampa
Kurdan 2018
Hevdîtina min malbata kure Riza Nevzat û Sebrî.
İstanbul 2019
Bîranînen Min- Frida Hecî Cewarî – Weşanxana
Lîmûş, 2010
Bijare- Fêrîkê Ûsiv Weşanxana Lêgal Plyûs, 2010
Berevoka Berhema 3- Fêrîkê Ûsiv- Weşanxana
Lîmûş, 2009
Heciyê Cindî- Jîyan û Kar - Frida Hecî Cewarî-
Weşanxana Asoxîk, 2007

*”Ew xeber bûn agir, dilê min şewitandin, wê deqê,
nizanim çima, min tirê ezê êdî Riza nebînim”.*

NÛROJ MUNZUR



Notayên Bê Xew

Ji bo M.Ozdemir

Ew destê te yê sar
Ew destê ku
Ji yê din spîtir e
Bila li min bibore
Çi heyf
Min biharek tune
Ku di kuçeyên tiliyên te re
Kaniyê biherikîne
Dibêjin
Holika Reş
Hema çend metreyan tenê
Ji cihûka
Di navbera mil û singa te
Kûrtir e!
Lê qet nebe tu nebêje
Naxwazim bizanibim
Ku di zivistana bedena te de,
Çend mirî şiyar in.

Doh bi şev
Min di xew de didît
Li ser xêzên dilê te
Sîh û heft hezar û nehsed û not û pênc
nota rêz kiribûn ji nifirên ji devê diya te
Ger ku qolincan avêtin singa te
Metirse!
Heya tu dikarî vexwe
Noşî canê te be
Yanê dibêjim ku
Ji serî heya pî
Aliyê te yê çepê
Gelaleya Mûzîkala Welatê min e!

OCCO MAHABAD

Di Qesrên Osmanî de Helbestvanek: Şikriyê Bedlisî



Şikrî di warê hedîs, fiqih, kelim, tefsir û xîtabetê de hostayekî pirr baş e.

Di edebiyata klasîk ya Kurdî de Bedlis wekî Cîzir, Îmadiye, Silêmanî, Meyafarqîn û Kêrmanşahê navendeke girîng e. Gellek edîb û nivîskarên Bedlisê hene yek ji wan jî Şikriyê Bedlisî ye. Navê wî di hinek çavkaniyan de wek Mevlâna Şikrî û Mevlâna Aşiq hatiye nivîsandin. Şikriyê Bedlisî di sala çendan de hatiye dinyayê em nizanîn. Ew li navenda Bedlisê welidiye.

Helbestvanê sedsala panzdehem û dawiya sedsala şanzdehem e. Perwerdeya xwe ya pêşî li medreseya Şikrî distîne di ciwaniya xwe de berê xwe dide Gîlan û Heratê, perwerdeya xwe di wan bajaran de didomîne. Pişt re dikeve di bin xizmeta mîr Şerefxanê Bedlisî. Bi Şerefxan re beşdarî hinek şeran dibe. Şikrî di cihên cuda de miftî, qadî û miderisî dike. Şikrî ne bi tenê şair û xatibekî jêhatî ye ew bi muzîkê re eleqeder bûye û li tembûrê xistiye. Şikrî di warê hedîs, fiqih, kelim, tefsir û xîtabetê de hostayekî pirr baş e. Berhema wî ya herî girîng Selîmname ye ku mijara wê jiyannameya Siltan Selîmê Osmanî ye. Heya niha 9 nishayên vê berhemê hatine tesbîtkirin.

Di serdema Osmanî de dîroka jiyana û kirinên padişahê vê demê pîrr girîng bû loma pêwîst dihat dîtin ku ew dîrok bê nivîsandin. Ji bo dîroknivîseriya serdema Yavuz Selîm, Selîmname û ji bo serdema Kanunî Siltan Silêman, Suleymanname dihatin gotin. Di dewra Osmanî de nemaze yek ji Selîmnameya Îdrîsî Bedlisî ku bi fermana Yavuz Selîm bi Farisî hatiye nivîsandin navdar e yek jî Selîmnameya Şikrîyê Bedlisî ye ku bi Tirkî hatiye nivîsandin. Ji xeynî wan, Selîmnameyên Keşfî Mehmed Çelebi, Adâ'i-yi Şirâzî, Kadizâde, Sucudî, Celâlzâde Mustafa Çelebi, Hoca Sadeddin û Mahremî Çelebi bêhtirîn tînan zanîn û navdar in.


Dema ku di sala 1512an de Yavuz Selîm dibe padişah Şikrî jî diçe Stenbolê di huzûra Yavuz de qasîdeyek pêşkêşî wî dike. Ji ber vê, demekê di Meclîsa Taybet ya Yavuz de tê peywardarkirin. Dû re di mîrîtiya Dulqadirîyan de li cem begên Elî Beg û Koçî Beg dimîne, ji bo berjewendiyên wan xizmet dike. Şikrî hem bi Yavuz Selîm re beşdarî sefera Îran û Misrê dibe hem jî bi Kanunî re tevî sefera Belgrad û Rodosê dibe.

Ew bi mîrê Diyarbekirê yê yekem Bıyıklı Mehmed Paşa û bi Sedrazam İbrahîm Paşa re tîkiliyên xurt datîne. Şikrî bi xwesteka Elî Beg di sala 1521ê de Selîmnameya xwe dinivîse, pişt re bi pêşniyarên Koçî Beg hinek çewtiyên vê berhemê sererast dike (1523-1524). Bi alîkariya Sedrazam İbrahîm Paşa, berhema xwe di sala 1530an de pêşkêşî Kanunî Siltan Silêman dike. Ji ber vê bi 15 hezar akçeyê û her wiha li aliyê Diyarbekirê bi zeametekê tê xelatkirin.

Selîmname behsa bûyerên di navbera salên 1490 û 1531ê dike. Şikrî, bi taybetî seferên Misir û Îranê bi vegotîneke herikbar aniye zimên.

Di berhemê de tê dîtin ku erdnigariya Kurdistanê bi detayî hatiye nivîsandin. Selîmname dewr û jiyana Yavuz Siltan Selîm bi zimanekî balkêş ji me re neqil dike. Berhem di terza mesnewî de hatiye nivîsandin û bi tevahî 5829 beytan pêk hatiye. Selîmname di hinek çavkaniyan de bi navê Futûhât-u's-Selîmiyye an jî Futûhât-ı Selîm Han hatiye destnîşankirin.

Şikrî berhemên xwe bi şeş zimanî, Kurdî, Tirkî, Farsî, Erebî, Ermenkî û Hîndî nivîsandine. Heta niha helbestên wî yê Kurdî derneketine holê lê wî di fexriyeyeke xwe de ku bi Tirkî pêşkêşî Siltan Selîm kiribû behsa helbestnivîsandina xwe ya Kurmancî kiriye. Em dikarin bibêjin ku Şikrîyê Bedlisî, yekem helbestvanê Bedlisê ye ku di sedsala XV û XVIem de bi kurdî helbest nivîsandine. Tê angaştin ku Şikrî ji aliyê terz û teşeya helbestnivîsandinê ve di bin bandora şair Ali Şîr Nevâî de maye.





Şairê sed sala XVIIem yê dîwanî İbrahim Cevrî, ziman û rêbaza Selîmnameya Şikrî naecibîne, wezna orjînal ya vê berhemê diparêze, ji nû ve dinivîse. Ji vê nishaya guherandî heta îro libek maye û niha di Beşa Menzûm ya Pirtûkxaneya Milet de li numreya 1310an parastî ye. Yusufê Katibê Çerkezan, di sala 1620an de Selîmnameya Şikrî vediguherîne ser nesrê û bi zimanekî pexşanî ji nû ve dinivîse. Ji vê berhema pexşanî gellek nîşe gihîştine roja me. Alfons Leopold Steidl li ser Selîmname tezeke doktorayê amade dike û berhemê bi navê Die Wiener Handschrift des Selîmî-nâme werdigerîne zimanê Elmanî. Melle Şihabî ku nivîskarê kitêba Dîroka Yêmenê ya menzûm e kurê Şikriyê Bedlisî ye. Di destê me de li ser dîroka mirina Şikrî Bedlisî agahiyên teqez tune lê tê texmînkirin ku di sala 1531ê de wefat kiriye. Ew wekî Şerefxanê Bedlisê û Îdrîsê Bedlisê di dewra Osmanî de bi şexsiyet û hewldanên xwe nivîskarekî girîng e.

ÇAVKANÎ:

- Ahmet Uğur, Şükrî-i Bitlisî ve Selim-nâmesi, AÜİFD.
- Mustafa Argunşah, Bitlisli Şükrî'nin Yavuz Sultan Selim Mersiyesi, EÜ Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi.
- Mustafa Argunşah, Şükrî-i Bitlisî, Selim-name, Erciyes Üniversitesi Yayınları, Kayseri, 1997.
- Mustafa İsen, Gelibolulu Alî, Künhü'l-Ahbâr'ın Tezkire Kısmı, AKM Yay., Ankara.
- Kinalızade Hasan Çelebi, Tezkiretü'ş-Şu'arâ, Haz. İbrahim Kutluk, T.T.K.Yay., Ankara 1989.
- Franz Babinger, Osmanlı Tarih Yazarları ve Eserleri, Ankara, 2000.
- Bursalı Mehmet Tahir Bey, Osmanlı Müellifleri, 3. Cilt.
- Ercan Gümüş, 16. Yüzyıl Osmanlı Tarihçisi Şükri-yi Bitlisi ve Eseri Selimname.
- Kübra Ceren Kurşun, Selimnameler ve Süleymanamelerde Kudüs.
- Mehmed Süreyya, Sicill-i Osmani, Cild-3.
- Prof. Dr. M. C. Şehabeddin Tekindağ, "Selim-nameler", İst. Ün. Ed. Fak. Dergisi, Sayı: 1.



NEZEHAAT DOGAN

ÊŞPEREST IM

Êşeke ji birîneke avgirtî me
ne zuha dibim û ne jî diherikim
di himbêza çiyayên te de kezebşewitî me.
Di deryaya peyvan da li xwe digirim
nizanim, nizanim kîjan peyvê hilgirim de
ku di ferhenga hebûna te de deynim.
Dipirsim gelo çend bihar li ser bejna
çîrokên te serridîn?
Çend binefş û xeçxecok di himbêza
çiyayên te de çilmisîn bê av?
Û çend caran peneberî bi min re peneber
bû girî bi min re girî.
Li ber barbaroşkên xelkê qufilim ,qerisim,
cemidîm
gelo ev bêrikirine, an jî tekçûyine temenê
min e?
Ax çîroka min ax çiqas ji xwe xeydî me, ji
xelkê re xwedî me û
ji xwe re jî malxirab stûşikestî me.
Ji bo vê yekê li sikakên şevên te xamristî
me
êşperest im, çîrokperest im mîn e
kemanekê şikestî bi ser nota va venabim.
Nizanim, nizanim bi kîjan rengî
awazekê çêkim de ku dinyayê li te û li xwe
şiyar bikim,
lê şev her koremar e ji bo min
Çîroka emrê min şev koremar e.



Lokman Polat

DI EDEBIYATÊ/WÊJYÊ DE HUNERA GOTINÊ

Hunera gotinê helbest e, gotinên helbestkî ye. Helbest afirandinekî eqil e. Helbest ji hest û ruhê mirovî dertê. Her gotin xwedî wateyeke xwe ye. Mirov dikare di hevokê helbestê de dewlemendiyeke hunerî ye bêpayan bibîne. Bandora gotin û hevokên helbestê gelek e û ji gotinên normal cudatir e.

Mesela yekî kor bibêje: "Ez kor im." Ev gotineke normal e. Hevokê hunerî nîn e. Rewşa normal a korekî diyar dike. Lê heger yekî kor bibêje: "Bihar tê, lê ez nabînim." Ev hevok hem rewşa yê kor diyar dike û hem jî hevokê hunerî ye, xîtabê hest û ruhê mirovî dike, li mirov tesîr dike.

Helbest afirandineke madî ye û yê helbestvan divê xwedî zanîneke kûr û berfireh be, bi kultur be, xwedî asoyeke fireh be. Haz, anku xweşiya ku helbest dide xwendevanan, xweşiyeke bi tehm û çêjin e, dil û ruhê xwendevan coş dike.

Hevokên helbestan rengîn û pirwate ne. Dema mirov bi çavên xwerû lê binêre, mirov dê fêmaneke û ji mirov re bê wate tînin. Nimûne ev hevok: "Her deng stran û ramûsan e." Yê ku ji helbestê fam nekin, dikarin bibêjin "Ma deng çawa dibe stran û ramûsan?" Lê heger mirov ji helbestê fêman bike, ev "deng" dengê sihrî ye, efsûnî ye, di hest û ruhê mirovî de dibe wekî stran û ramûsanê.



Naveroka hinek helbestan wisa fereh û dewlemend e, ku tê de evîn, dilêşî, xweşî, derd û kul, şadimanî, felsefe, realîteya civakî û netewî, şîûr û hişmendiya netewî, fikr û raman û herweha gelek tişt hene. Ji bo ku helbest hunereke pirwate ye, danasîna wê jî wisa bi hêsanî nayê kirin. Helbest şaxeke wêjeyê ye û hunereke bêpayan e. Wek şaxên wêjeyê yê din, di helbestê de jî, rastî û xeyal li hevdu diquncin. Rastiya madî û xeyalî ya ruhî di nav yek helbestê de dikarin li hevdu bînin rapêçan.

Gelek helbestvanên navdar di helbestên xwe de behsa xwe, behsa evîna xwe kirine. Wan daxwazên xwe, xem û xeyalên xwe bi zimanekî helbestkî anîne zimên. Hinek helbestvan heger evîndar nebana, heger xeyalên wan yê kûr û berfireh tune bana, wanê çawa evîn û xeyalên xwe banîyana zimên?

Peyvên helbestan peyvên hîlbijartî ne û di gelek peyvên wateyên sihrî hene û ew nîşana sembolî ne.

Helbestvanê ku xeyalên wî/wê xurt bin, peyvên ku di nav hevokên helbestê de bi kar tînin, reng û ronahiyeke efsûnî didin helbestên wan. Helbestvan li gor daxwaza xwendevanan, li gor ku helbestên wan xweşa xwendevanan biçin, helbestê nanivîsin. Ew li gor hest û ruhê xwe, li gor xweşî û xweziya dilê xwe helbestên xwe dinivîsin. Loma jî helbestên wan dibe ku xweşa hinekan biçe û xweşa hinekan neçe. Mesela ez vê helbestê binivîsim:

"Negotina spehîbûna evînê

..Nîvco hêştina helbestê

...Bedewiya evînê

.....Hunera helbestê

.....Ji holê ranake "

Ji bo vê helbestê hinek xwendevan dikarin bibêjin: "Ev çi ye? Ma ev jî helbest e? Ev ji tiştê re nabe." Hinek xwendevan jî dikarin bibêjin: "Ev helbesteke gelek baş e, çarîneke bi wate ye, gotinên rasteqîniya jiyana evînî ye."

Helbest melodî nîne. Lê ji ber helbestê melodyên gelek xweş dikarin bînin afirandin. Helbest stran nîne, lê ji ber helbestê stranên gelek xweş dikarin bînin gotin. Helbet her helbest nabe stran, lê ji ber hinek helbestan stranên gelek baş û xweş tene pêkanîn.

Her helbestvan li gor xwe terzekî/stîleke wî/wê, şeweya nivîsîna wî/wê heye. Hinek helbestvan dikarin tiştên basît bi şeweyekî tevlihev pêşkêş bikin. Helbestên hinekan zelal e, yê hinekan rîşo ye. Hinek helbestvan wekî cambazên peyvan bi şeweyekî giran û tevlihev bi peyvan re dilîzin.

Di helbestê de sivikî û giranî, zelalî û tevlihevî bi şeweyê helbestvên ve girêdayî ye û li gor teşeya nivîsîna wî/wê durvî digre. Reng û jîndariya helbestê bi şeweya nivîsîna helbestvên pêk tê. Helbestvan rastî û xeyalê şîrove dike, teswîr dike û dixê qalibekî. Reng, tehm û lezetê didiyê.

Hinek helbestvan hem di helbestê de û hem jî di nivîsîna roman û çîrokan de ji xwe re bi peyvan dilîzin. Bi riya peyvan şibandinên mecazî, tiştêkî bi tiştêkî din şîrove kirin, bi serê xwe hunerek e û ev huner hunera mejî ye, nîşana hişmendiye ye. Helbet pêkanîna vî tiştî karê herkesî nîne.

Divê mirov tu carî ji helbestvanekî pirs neke û nebêje: "Tu çima helbestê dinivîsî?" Çawa ku mirov ji yekî pirs bike û bibêje: "Tu çima xwarin, vexwarinê dixwî?" Yan jî "Tu çima radikevî?" Pirs "Tu çima helbestê dinivîsî?" jî dişibe van pirsan. Ji bo helbestvanekî helbestnivîsîn, wek pêwîstiya xwarin û razanê ye. Çawa ku dema xewa mirov bê, divê mirov raze û dema mirov tî û birçî bibe, divê xwarin û vexwarinê bixwe, dema ji helbestvan re xiyaset (îlham) bê, divê ew helbestê binivîse.

Mirov di pirtûkên helbestan de dibîne ku hinek helbest dirêj, hinek jî kin in. Helbet helbestên dirêj jî û yê kin jî li gor xwe xweş in. Di helbestên dirêj de temaya gelek tiştan heye, mijar berfireh e. Hebûna temayên curbicur helbestê dewlemend dike. Lê di helbestên kin de jî tema heye û kinbûna helbestê xweşbûna wê ji holê ranake. Hinek helbest, herwekî çarîn, ji çar rêzan pêk tên û gelek xweş in.

"Hewa û jiyana vî welatî

Li yê sirgûnkirî nayê

Ew roj bi roj difikirin

Bi hesreta welat dinalin"


Di vê çarîna ku min nivîsiye de temaya bêrîkirin û hesreta vegera welêt di dilê yên sirgûnkirî de heye. Di çarçeva vê temayê de mirov dikare helbestê dirêj jî bike û gelek çarînên din lê zêde bike. Lê kinbûna wê jê tiştêkî kêr nake.

Kesên ku ji helbestê fêr nekin, dema di nav helbestekê de tiştên ku hevdu nagrin, anku nakokiyê dibînin, rexne dikin û wê helbestê dixin bin erdê, bînpê dikin. Jiyan bê nakokî nabe. Nakokî nebe, civak pêşve naçe. Pêşveçûnên berbiçav ji encama nakokiyên derdikevin. Gelek nivîsên pexşan û malikên helbestan xweşî û dewlemendiya xwe ji nakokiyên heyî digrin. Tevlihevî û nakokiya di nav wan de rengekî cuda dide wan. Tu tiştêk sedî sed bêkêmanî nîne. Di nav helbestê de hebûna nakokiyê nirxa wê danaxe jêr, hunera wê a heyî ji holê ranake. Di helbesta herî baş de jî misoger kêmanî heye. Helbet ev jî dîtînen min in, bîr û baweriyên min in. Dibe ku ev dîtînan ji hinekan re gelek şaş bê.

Helbest yek cure nîne. Duriv û şemalên wê, şêwe û naverokên wê curbecur in. Hinek helbest bi kêş û rêzbend in, hinek serbest in. Helbesta lîrik, dramatîk, bi kêş û rêzbend, serbest, klasîk, modern û post-modern û herweha gelek şêwe helbest hene. Li cîhanê bi sedan, hezaran helbestên evînî, romantîk, simbolîk, avantgard, futurîst, kubîst, simbolîst, surrealîst û gelekên din hatine nivîsîn. Hunera helbestê tim pêşve diçe, xwe nû dike û bi duriv û teşeyên nû tê afirandin. Helbestvan neçar nîne ku xwe di nav durivekî de dîl bike. Ew li riyên nû, li durivên nû digere, xwe bi xwe re hunera xwe diguhirîne, pêşve diçe.

Di helbestê de hunera gotinê xwe bi haza (xweşiya) estetîkî dide nîşandan. Xweşiya estetîkî can û rih, reng û jîndariyê dide helbestê. Di helbestê de evîn, jin, jiyana, bajar, gund, çiya, kendal, newal, deşt û zozan, lawir, mirov, firandina çûkan, vebûna gulana, rêveçûna rê û dirban, rêwîti û dîtina cih û welatan, xweşiya çiya, derya û xwezayê wisan tê wênekirin, ku mirov jê haz digre, xweşhal dibe.

Loma jî divê xwendevan pirtûkên helbestan bixwînin, jê haz bigrin û dilxweş bibin.





Serdar KÖMÜRCÜ

Lê tu çû!

Ey Xwedê!
Ma gelo te dît?
Wê rojê xem dibarîya!
Dibarîya dibarîya dibarîya!

Gelo heskirina min
Tu çarî wê karibe
Bi vî parsê min î kalind?
Ev parse minî hov û ji pola!

Çi bêjim!
Ez kovî bû li ser çîyayê tazî û asê
Û tu xezalek bû, li şênîya
Û li nav baxê gula

Tu çû!
Mîna felekê
Te paşê xwe da min û tu çû!
Û ez mam!

Çima!
Hatin di himlê xwe de
Her tim
Mezin dike çûyînekê?
Û jîyanek jî gellek mirinê!

Nizanim, çend mirin
Hiltê di dilê jîyanekê de?
Û çend jîyan
Ji bîr dibe, bi mirinekê?

Çûyîn, çend mirin e?
Hatin, çend jîyan e?

ERSÎN TEK

PEYV

“-Mîrê min tu çi dixwinî


-Peyv, peyv, tenê peyvan...”(Shakespeare)

Erê. Peyv, peyv, tenê peyvan... Heke meriv dixwîne, dinivîse, diaxive, dikene, diqêre, dipelîne, direve, ser dikeve, berze dike, dixapîne, hez dike, maçî dike, bêdeng dimîne yanê ew zerf û etîketên ku em her demekê û her derekî bikar tînin peyv in; êdî me bivêt an nevêt... Peyv malê me hemûyan ên hevpar in û em hemû jî bikar tînin. Nizanim eva çarenûsa me ya hevpar e gelo, an jî bêçaretiya me ye...

Em bi wan firçeyên ku bi peyvan hatine çêkirin xêz dikin sûretê jiyane. Her kesek vê sûretê temaşe dike lê her kesek tiştên cuda dibîne û difikire. Bi rastî ew peyvên xweyî tahm û wateyên cuda, di kûrahiya xwe de malê kesî nînin, tenê malê Xwedê ne. Ji ber vê yekê halê me wek halê Sîsîfos e. Ew peyvên şêfî û kêmbêr hinek caran dişibiyan mûyî, hinek caran dişibiya kêvir, hinek caran dirûvê hesin didin. Pîr zehmet e bi peyvan behskirin û nivîsandina ji peyvan. Wek îroniyekê, wek paradoksekê...

Peyv mîna çemekî ne. Meriv li ber devê wî çemî rûdinê û xwe temaşe dike, jiyane temaşe dike, mirinê temaşe dike. Paşî jî mirov dikeve di nava wî çemî, dixeniqe û dimeşe...

“Di destpêkê de peyv hebû” dibêje Încîla Yohannayî. Beriya peyvê jî tenêtî. Û piştî peyvê jî hebûna xwe her domand tenêtîyê...Destpêkir di cihê dawîbûna peyvê de; destpêkiribû peyvê beriya gotinê. Peyvan tenêtiya xwe dabû jibîrkirinê û tenêtî di hundirê însên de her bi peyvê re jîya. Her tenêtî ji me re vegot peyv û di nav tenêtîyê de heliyan, tune bûn. Tenê peyvjan vemirand û her ku hatin hişê însên tenêtî gewre bû, tab lê nedihat kirin.



Xwandevanê hêja, em hêmû jî di tarîtiya xwe de gazî hev dikin. Ji bo vî karî amûr û qasidê me tenê peyv in. Ji ber hindê peyv dê her bê kifayet û kêmbimînin, têra me nakin; ti caran nagehin hawara me, di tenêtiya çolistanên dilê me de. Çi heyf...

Ew rûyê peyvan ê ku em di nav rastiya rût û tehl ya jiyane de dibînin û bikar tînin mîna pêleyîstokên zarokan in. Zarok çawa bi wan pêleyîstokan keyfxweş dibin û wextê xwe derbas dikin; em jî bi wan peyvjan keyfxweş dibin, rojên xwe diqedînin û umrê xwe xelas dikin. Tenê xwe dixapînin...

Ya rûyê din?

Belê peyvan rûyekî xwe yî din jî heye kû nayê ditîn û tenê tê hestkirin. Ew rûyê wan ji ber mirovan direvin, xwe vedişêrin. Ew rûyê veşartî ye ku me di nav destê jiyana rojane de derdixîne û me berdide di nava çolên heqîqetê; qeyd û zincîrên evîn û firqetê, hebûn û tunebûnê zendên me dide, me azad dike. Ev rû ye kû me di meydana hejarî û tuneyiyê de eşkere dike. Peyv êşeke mezin in di hûndirê me de...

Peyv ji aliyekî din ve jî sirrên alemên dûr û veşartî didin me. Bi hewla peyvan em xwe digihînin wan sîrran; siya heqîqetê jî şikefta Platonî derdixînin. Ji ber hindê dil û mêjiyê însên de şerê xilaf û nakokiyê mezin dibe. Eva jî îmtihanek e. Di destê mêriv de tenê gotin û nivîs hene. Di herdu aliyan de jî tiştên ku em bikar tînin tenê peyv in. Em dixwazin ku bi xêra peyvan trajediya xwe vebêjin, agirê hûndirîn bitemirînin. Lê bêfeyde ye. Peyv kêmas in, bêçare ne. Peyv nikarin me bigihînin sirrên wehdetê, nikarin trajediya me rave bikin û xelas bikin, nikarin agirê hûndirê me bitemirînin. Peyv derew in, tiryak in... Peyv ezmûna mirovahiyê ne. Ew Îblîsê ku dibe hezar reng û dikeve hezar eyaran bi neynika peyvan xuya dibe. Ew peyv li ser zimanê Îblîsî dibe şîr û şekir. Însên dixapîne. Paşî jî ew peyv di rihê mêriv de bêhneke genî dihêlin û difirin. Însên xayîntiyeke mezin dike. Bi peyvan hewla xapandina Xwedê dike. Lê nikare serbikeve. Paşî jî di nav herriya xwe de digevize, ber xwe dikeve. Peyv di hûndirê xwe de xwîn û êgir vedişêrin; însên dikujin û disojin. Şerê hebûnê di navbera însên û peyvan de her dimeşe. Şerekî bênav û bêdawî... Peyv; çarenûs, qîmet, pîvan... Însan; verîşina asîmanan e û di nava êş û eleman de tenê maye. Di nav mirî û mirinan de xewna bêdawitîyê dibîne û dubare dike. Çarmixa xwe, yanê peyvên xwe li ser piştê xwe digerîne. Çiyayê Cudî û heta çiyayê Turê bi lingên westiyayî dimeşe ber bi qûrbaniya xwe ve. Bi seranser çîrokeke dûr û dirêj e...

Xwedê xwe, hêza xwe, bêdawitîya xwe û me ji me re bi peyvan rave dike. Tenê şertekî Wî heye; teslîmbûn. Ji ber hindê peyv barekî giran dihêlin li ser milên me. Em nizanin, an jî em jibîr dikin...

Peyv û diyarde... Ravekirina diyardeyan peyv in. Yanê bêdawitî nayê teşe kirin lê bêdawitî heta neyê teşe kirin nayê dîtin û fêm kirin. Mezinahiya Xwedê di vir de ye. Çimkî mêjiyê însên heta teşeyê nedê, nikare fêm bike û têbigêheje. Di vir de peyv hem dibin çare hem jî dibin sînorek. Eva jî rastî û têkçûna mirovahiyê ya fizîkî ye.


Efsaneya Babîlê...

Ew tiştên ku em dijîn an jî wisa hîs dikin hemû jî xewnek in. Xewna tunebûnê... Di vê xewnê de zeman berze ye.

Peyv jî xwe di ber piştê zemên de vedişêrin.

Peyv di navbera jidayikbûn û mirinê de, di navbera şev û rojê de gora me dikolin. Wek çerxeke bêmentiq e. Şîzofrenî. Fikirandina ji der îhtîmalê...

Ez dibêjim qey tenegehêştin hêsan e, ravekirin sext û giran e. Lewma cihê ku peyvên mêriv têrê nekin divê meriv dev jê berde, pênuşa xwe bişikêne...




Cahit Aybar


BO TENÊ EM

Ey roj tu bo me dixeyîri
Ey şev bo me didizi keç û kurî,
Ey bavî bakrofe û babelîsk
Hûn bo ser me dibarînin ax û berî.

Ey gund û bajêr, war û zozan,
Hûn bo li me bûne zindan,
Ey çol çolistan û sehra,
Hûn bo me bûne goristan.

Bo tenê em man jar û bedbext,
Ey top û tang û çek û rext,
Hûn bo me gulle dibarînin.
Hem ya hene,
Tenê me nînin tac û text.





Îkrâm Oguz

DENGBÊJÎ Û AXAFTÎNA STRANBÊJAN

Gotinek ji gotinên Fîlozofê Alman Wilhelm von Humboldt e.

„Di rastîya jîyanê da welat, ziman bixwe ye. Dûrketina bi hêsanî û bi hêztirin a ji welat jî dîsabi rîya ziman dibe.“

Mirov dibêje qey Humboldt ji sedsalan berê da li rewşa kurdan ya îroyîn temaşe kirîye û ev gotina xwe jî ji bo wan anîye ziman.

Jiber ku Kurd ji zimanê xwe, bi rîya ziman jî ji welatê xwe dûr dikevin.

Dê û bav, di nav mala xwe da û bi hev ra bi zimanê xwe qise nakin.

Yên ku bi hev ra qise dikin, ew jî bi zarokên xwe ra zimanê neyarê xwe bi kar tînin.

Sîyasetvan daw û doza azadî û serxbûna welat dikin, lê bi zimanê sîyaseta xwe, wêlatê xwe bi destê xwe dikujin.

Rojnamevan û nivîskar bi zimanê xwe nanivîsin, yê dinivîsîn jî, tenê nivîsên xwe dixwînin.

Stranbêj pesnê dengbêjîya xwe didin, mixabin bi kurmancî distirên, bi tirkmancî diaxîfin û dijîn.

Dengbêj, ku hunera wî deng, amûra dengê wî jî ziman e.

Dengbêj ku li zimanê xwe xwedî dernekeve û tenê di stranbêjîya xwe ya ezber da bikar bîne, guhdarvan wê çî xwelîyê li serê xwe bike!

Bê gûman, zimanê me heta roja îro hatibe, di wê hatinê ked û para dengbêjan bi girîngîyek mezin cîh digre.

Jiber ku bi sedsalan ziman tenê bi kilam û stranên dengbêjan va zindî ma ye, bi deng û awazên wan xemilîye û berxwe da ye.

Loma ez jî wek kurdek ji kurdên li zimanê xwe xwedî derdikevin û di her xalê jîyana xwe da bikar tînin, ji dengbêjan ra xwe deyndar dihesibînim.

Mixabin ew dengbêjên xwedîyê hunera deng êdî neman, yekoyek xatir xwestin û çûn. Lê deng û awazên wan ên mayînde, îro jî hê xewn û xeyalên me dixemilînin, bîr û bîranînen me jîndar dikin.

Ez bixwe, dema ku li kilam û stranên dengbêjan guhdarî dîm, bi deng û awazên wan ra diçim dema zarokatîya xwe.

Jîyana min, gund, kelecana rojên pêncşemê ku guhdarîkirina radyo ya Rewanê va dixemilî, mîna ava Çemê Erez, bi hêz diherike û di ber çavên min ra derbas dibe.

Carcaran xwe di nav zozanên Çîyayê Şahwelat dibînim.
 Tahma kivkarkên wê yên ku di destpêka havînê da derdiketin, bi tîrêja royê ra dibriqîn û diteyisîn, tên pozê min.
 Dengê ava kanî û çavkanîyên wê yên sar, dibin melodîyek xwezayî û jenga guhê min digrin.
 Dengbêjê ku lê guhdarî dikim, Şakiro be, bideng û awazên wî ra xwe li ser piştta bozî çaçanî kaprêşî rewan dibînim û di nav Şûşar û Tekmanê ra, bi bayê bezê derbas dibim.
 Bi strana Ferzê ra dibim ji teyran teyrê baz û li ser gazan û bêlanên bilind difirim. Bi bayê qulbê ra vedigerim û li ser mile qîz û bûkan datînim...
 Bi dengê Reso ra dibim hevalê Emê Atmanî û bi karwanê wî ra di nav welatê Reşkotanîyan darêwîtiyê dikim.
 Bi dengê Huseyno rê dadikevim deşta Mûşê, li ber devê Çemê Muradê dikevim pêgermokê û ji kul û kesera dilê xwe yê birîndar ra dilorînim.
 Bi dengê Tahiro ra berê xwe didim etegên Çîyayê Sîpanê Xelatê, di nav êlû eşîran da li kok û esaleta Perîxana Mihê digirim.
 Bi kilam û strana Şêx Silê ra, di civatên mîr û hekiman da rûdinê û pesnê bedewîya Seraya Mamed Axa didim...
 Stran diqedin, dawî li xewn û xeyalên min tên û ez careke din di nav bêdengîya jîyanê da ji sêwîtiya welatê xwe hayîdar dibim.
 Loma gotina Humboldt watedar dibînim û dibêjim, welatê rasteqîn ziman be, ew welatê me jî îro tenê di kilam û stranên dengbêjên berê da ma ye.
 Jiber ku dengbêjên me yên îro jî ji welatê xwe dûr ketine û bûne stranbêj.
 Bi kurmancî distirên, bi tirkmancî diaxifin...
 Mîna kesên tat bi stranbêjiya xwe bilbil, bi axaftina xwe ya nîvco jî kerr û lal in.

Di salên 1980yî da ez rastî gelek dengbêjên bi nav û deng hatim û min ew naskirin.
 Di kûçe û kolanên Erzurumê da Şakiro, Huseyno, Zilkoyê Çavirmê, Tahiro û Keremê Kor dît û li kilam û stranên wan guhdarî kir.
 Qasî deng û awazên xwe, di sohbet û axaftinên xw da jî xwedî zimanek paqij û zelal bûn.
 Ew, ji sîyaset a Kurd a wê demê dûrbûn, lêbelê bi dengbêjiya xwe hîmê kurdayetiyê bi hêz dikirin û dixemilandin.
 Di civatên mîr û began da, bi zimanê qedexekirî diaxifîn û distiran, bi stranên xwe ew diparastin û didan hezkirin.
 Lê îro?



Hêjmara dengbêjan jî...

Derfet û îmkanên dengbêjîyê jî zêde ne.

Dengbêj xwedî kilam û stranek taybt nebe jî, bi kilam û stranên dengbêjên nemir va dengê wî wenda nab û dijî.

Jiber ku her stranbêjê ku, ha li kûç û kolanên bajaran, ha li gund û zozanên serê çîyan bijî, ger ku bixwaze, dikare dengê xwe qeyd û dûra jî li seranserê dinyayê belav bike.



Lê yekî mîna Evdalê Zeynikê, pîrê dengbêjan, xwedî derfetc wusa nebû. Loma em îro herçiqas ji kilamên wî hayîdar bin û ji devê stranbêjan bibhîsin jî, ji deng û awazên wî

bêpar man.

Bi pêşvçûna teknolojiyê ra derfet zêde bûn, qasî zêdebûna derfetan jî çerxa pişaftinê bi hêz bû. Ger ku stranbêj li ziman û hunera xwe, em jî li wan xwedî dernekevin, ne kilam û stranên dengbêjan ne jî dengê stranbêjan dimîne.

Çima dengbêj û stranbêj?

Gor raya her dengbêj di heman demê da stranbêj, lêbelê her stranbêj ne dengbêj e.



Ji Huseyno tarîfa dengbêjîyê pirsîne.

Huseyno bi mînakek balkêş, bersivek kin daye û wuha gotîye; „Dengbêjî, tewna Reso, lihevanîna Şakiro û dengê min e...”

Di bingeha taybetîya her sê dengbêjan da jî xeml û zelalîya ziman cîh dîgre.

Ji bo her kesek ziman berdevkê hiş e.

Lê ji bo dengbêj, ziman di heman demê da bingeh û amûra hunera dengbêj e.

Zimanê dengbêj çiqas xurt û dewlemend be, xebata hişewî jî ewqas zelal û kêrhatî dibe.

Dengbêj, bi dewlemendî û zelalîya zimanê xwe ancax dikare biafirîne, dikare bistirê û bi hest û helwesta xwe stranê bixmilîne.

Lê zimanqels û lawaz be, hiş tevlihev, deng jîşêlû dibê. Stran jî bi xwendina ezber vaji xemla hest û helwesta xwedîyêxwe bêpar dimîne.

Loma wek gotina dawîyê dikarim bibêjim, stranbêjên ku xwe wek dengbêj bi nav dikin, ger ku dixwazin mîna dengbêjên berê di dilê kurdan da cîhekê mayînde bigrin, divê ya rûmetê bidin zimanê xwe, fêr bibin û bi kurdîyek zelal û paqij biaxfin, ya jî di bernemeyên xwe da tenê bistirên û dûra bê deng bimînin.

Jiber ku bi axatina xwe ya bi peyvên tirkmancî xwe piçûk dixînin û ji welat, guhdarvan jîpişta xwe didin wan û ji wan dûr dikevin...

RÊBER HEBÛN

Keça Kanî

Evîn î tu gulistan î
Çeleng î tu bêrîvan î
Ji adarê re nîsan î
Ji erdê re tu ezman î
Şîrîn lêvê sipî sîngê
Ji min re tu dil û can î
Ji payîzê re avdar î
Ji havîn re zivistan î
Li gel te her birîn xweş e
Ji giyanê re derman î
Li gel te xemgînê geş e
Nema dijî perîşan î
Xwezî di hambêza te bijîm
Bi aramî bi hêsanî
Xwezî zendên te yên nermûk
Di nav min de bibe kanî



ROSTEM XAMOŞ

Ez Zarok im

ez zarok im , ez zarok im
dîlxweş û ciwan û xîşkok im

wek kevoka ciwan û şîrîn
dixwînim nav golên rengîn

dixwînim awaz û sitran
bû bextiyarî tev kurdan

awazên min xweşiya dil e
te jî peyvin weke gol e

her dem bi peyv û awaza bim
peyama aşîxwaza.





GELÊ KURD PIŞTÎ BÎ DAWÎHATÎNA PEYMANA LOZANÊ DÊ BÎBE BÎ DEWLETEK SERBÎXWE?

KEYHAN MIHEMEDÎNIJAD

101 sal berî niha, piştî şerê yekem ê cîhanî peymanek hate girêdan. Ev peymane bo gelê Kurd gelek cihê dilxweşiyê bû.

Ev peymane li navbera dewleta Osmanî û çendîn welatên zilhêz ên cîhanê li 10`ê Tebaxa 1920`ê di bajarê Sêvira Feransayê de hate wajokirin û bi peymana "Sêvir"ê hate nasîn.

Li wir nûnerê Kurdan "Şerîf Paşa" jî beşdar bû. Pêka wê peymanê Bîrîtaniyayê dixwast beşa Bakurê Kurdistanê ji Tirkîyê cuda bike û wilayeta Mûsilê jî bixe ser wê beşê û dewleteke Kurdî ya serbixwe bo Kurdan ava bike.

Madeya 62 a wê peymanê wiha îşare bi otonomiya Kurdan kiribû: "Komîsiyonek ji nûnerên Feransa, Îtaliya û Bîrîtaniyayê pêk bê û di heyama 6 mehan de amadekariyekê bo avakirina herêmeke Kurdî di navbera Ermensitan, Tirkîye, Rojhilata Firat û aliyê serê yê Sûriyê de bê kirin".

Di madeya 64`ê de jî hatibû: "Ger Kurd daxwazkar in bo dewleta xwe û dixwazin ji Tirkîyê cuda bin, piştî salek bi ser wajokirina peymanê re derbas bû dikarin nûnerên xwe bo Saziya Netewên Yekgirî bişînin. Ger Şêwreya Asayîşê his bi vê yekê kir ku Kurd şiyana dewleta serbixwe heye û vê yekê jî dixwazin, rê bi wan re tê dan û ew dewleta Tirkîyê neçar dikin ku di herêma diyarîkirî ya Kurdistanê de vebikêşe."

Lê piştî sê salan kêmtir, xewn û xeyalên Kurdan nehatine gorê û tev hêviyên Kurdan her di nav belgên peymanê “Sêvir”ê de man. Rêkevta 24`ê Temûza 1923`ê bo gelê Kurd rêkevtek pir nehs bû.

Piştî vê ku Împeratoriya Osmaniyan hate herifîn û Komara Tirkîyê bi serokayetiya Mistefa Kemal Atatürk hate avakirin. Mistefa Kemal tev qewil û sozên ku dabûne Kurdan binpê kirin û di yekem pêngava xwe ya qirêj de dest avêt bi hilûşandina peymannameya “Sêvir”ê.

Di rêkevta 24`ê Temûza 1923`ê de di navbera dewletên Îngilîz, Feransa, Îtaliya û Rûsiyayê de konferansek li bajarê Lozana Swîsê hate lidarxistin. Mebesta wan a wê konferansê darêtina serjinû a qewareya siyasî û cografîya Rojhilata Navîn bû. Di wê konferansê û heman rojê de biryareke nemirovane, dûr ji hemû yasa û pîrensîpeke mirovî û navdewletî li dijî netewa Kurd hate dan. Bi bê agehdarkirina netewa Kurd û xelkê Kurdistanê, axa wê li ser çar welatên Îran, Tirkîye, Sûriye û Îraqê de hate parvekirin, û parçeya pêncem a Kurdistanê jî ku bi Kurdistanê Sor dihate nasîn kevte ser Yekîtiya Soviyatê.

Piştî vê peymanê, Kurd û serkirdêyên Kurdan bêdeng neman û li dijî kolonyalîzman rabûne ser xwe û serhildan kirin. Lê tev ew serhildanane hatine temirandin. Ji serhildana Şêx Mehmûdê Berzencî ya sala 1919`an heta 1932`an ve bigire heta serhildana Şêx Seîd Pîran a sala 1925`an, serhildana Simkoyê Şikaka ya sala 1905`ê ku li sala 1930`ê hate temirandin, serhildana Agirî a sala 1927`ê heta 1931`ê, serhildana Seyîd Riza Dersîmî ya sala 1937`an û avabûna Komara Kurdistanê ya sala 1946`an û... hwd li dijî dewletên dagîrker û dewletên mezin ên kolonyalîstî şer kirin û di wan şeran de hezaran Kurd hatine qirkirin û ji warê bav û bapîrên xwe hatine dûrxistin.

Piştî wan hemû qirkirin û zilm û zordarî, gelê Kurd serê xwe bo dagîrkerên Kurdistanê neçemandin û her li dijî wan di xebatê de ne. Lê ya girîng eva ye axo piştî wan hemû ked û zehmet, kuştar, dûrxistin û qetilamkirin, gelê Kurd digihe bi hêviyên xwe?!

Ger em bînan wan hemû serhildanane danîne ber hev, em dibînin ku dewletên dagîrker çî caran bi tenê nekarîne serhildanên Kurdan ji nav bibin, belkî wan bi alîkariya welatên kolonyalîstî yê Rojavayî û Rojhilatî û nemaze Rûsiyayê karîne serhildanên Kurdan ji nav bibin û ev yeka jî derdikeve ku bandora peymannameya Lozanê li ser wan hebûye û nexwastine îtirafê bi mafê gelê Kurd bikin.

Di vir de divê em bizanin axo di peymannameya Lozanê de îşare bi vê yekê hatiye kirin ku dê piştî 100 salan ev peymanê ji nav here? Pêka gotarên ku li ser wê meselê hatine nivîsandin dane zanîn, “di peymanê Lozanê de îşare bi vê yekê nehatiye kirin ku piştî 100 sal ew peymannameye dawî pê tê û qewareya welatan cardin bê diyarîkirin. Peymannameya Lozanê ji 143 madeyan pêk hatiye û bi ser 17 belgeyan de hatiye parvekirin ku pêkhatine ji rêkvevîname, peyman, daxuyanî û “dependent”.

Tê zanîn ku di peymanê Lozanê de çî basek li ser vê nehatiye kirin ku ew peymanê piştî 100 an 200 salan bê hilûşandin.

Di niha de divê gelê Kurd û nemaze serkirdên Kurdan di hizra vê yekê de bin ku her ji niha ve ji bo piştî bi dawîhatina peymanê Lozanê çî bikin.

Tirkîye û nemaze Erdoxanê tundajoyê di hizra tev desthilata Osmaniyan de ye û ev bîr dike ku piştî bi dawîhatina peymanê Lozanê tev deverên Kurdan û deverên derdorê xwe dagîr bike.

Mideheke Erdoxan qîre qîr û gure gurê dike û bi berdewamî û di gotarên xwe de basa pawanxwaziya Tirkîya Îslamî-nasyonalîstî dike û ew bi berdewamî basa sala 2023`an dike û ew dibêje bo gelê Tirkîyê sala 2023`an saleke girîng e.



Ew basa peymanê Lozanê dîke û li ser vê bawerê ye ku cardin tev desthilata Osmaniyan bi dest ve bîne.

Tirkîyayê bi dagîrkirina Efrînê heta Sîdekana Başûrê Kurdistanê dixwaze herêmek aram biafirîne û pêşbikeve, û Erdoxan her ji niha ve bîr ji piştî Lozanê dîke. Êdî divê gelê Kurd hişyar be û di hizra vê yekê de be ku piştî vê peymanê çî bikin û nehêlin xewn, pîlan û pîlanên Erdoxan bibine rast.

Divê her ji niha ve yekrêziyek di navbera serkirdeyên siyasî ên çar parçeyên Kurdistanê de bê pêkanîn. Û li diyasporayê jî bi heman awayî yekdem û yekrêz bin û li ser vê yekê xebatê bikin ku piştî Lozanê xewnên Kurdan bînine gorê. Di niha de ya ku dujmin û welatên din teslîm dîke, yekdemî, hêz, şiyar û yekrêzî ye.

Divê serkirdeyên Kurd tev rêkarên navdewletî bigirine pêşiya xwe û ji rêya navdewletî ve wê meselê çareser bikin. Di niha de welatên Rojavayî û Rojhilatî bawerî bi danûstandineke saxlem û

tendirust hene û ger netewa Kurd di her çar aliyên Kurdistanê de û li wir û li diyasporayê navendekê jiserkirde û pîsporan pêk bînin, û ew dikarin ji rêya danûstandineke tendirust ve welatên Rojava û Rojhilatî neçar bi îtirafa mafê gelê Kurd wek dewletek serbixwe bikin. Ger ji niha ve, ev yeka sernegire û gelê Kurd û nemaze serkirdeyên siyasî yên Kurdistanê li pey vê meselê nekevin, eva bi qazancê Tirkîyê dawî pê tê û Tirkîye jî dê roj bi rojê li ser bîra paremayî ya împatoriya Osmanî axa Kurdistanê dagîr bike û welatên Rojavayî û Rojhilatî jî hevdem digel Kurdan dê mêzekerê vê karesatê bin. Divê nivîser, rojnamevan, çalakvanên siyasî û medenî û evên ku şiyana nivîsînê û gotinê hene, dengê xwe bilind û pênuşa xwe danêne ser lînûsê û biqîrînin û binivîsin, êdî bes e xwexwarin û dijayetîkirina yektir û bes e. Bi cihê xwexwarin û dijayetîkirin, di hizr û bîra piştî Lozanê, yekgirtin û serxwebûna Kurdistanê bin.

Hasbeg Koksal

HEYVA ÇARDEŞEVÎ

Li êzmîn, di nîvronîya şevê da heyva çardeşevî, bi tîrêjên xwe yên sorzerikî, bi şewqekî melûl giran giran dimeşîya. Hemû rûyê erdê; deşt û çîya, dar û daristan, nal û newal, û gol û çem, di zerîya heyvê da mabûn. Wek rojê bû. Zerîya zîvikî, zerîya zenûn di şevê da olan dida. Te digot qey destê sibehê ye, berbanga şeveqê ye. Te digot qey, agirê dogehê li pişta asîman e û di qulika êzmîn da ronîya bêgermî dide.

Sîya her tiştî, bilivandina heyvêra li dor sîdanan hêdî hêdî dizivirîyan û dirêj û kin, tîr û rîn dibûn û vedikişîyan ber daw û dalingên sîdanan. Di nîvtarîya şevê da eşkalên her tiştî vediguherîyan û dişibîyan şiklên tiştên xof û sawdar.

Ji dûr û dûr ve rûxalê çemekî, yan jî yê goleki diçirisiya...

Ji ku hat, ji ku ve hat, yan jî xwe li wêderê bû? Telpek ewrê gewregirtî xwe li heyva çardeşevî aland. Pê ra her der bi seranser di tîrtarîyê da ma. Bîstek şunve, goşeyê ewrê gewregirtî di cîhê tenik da zerhimî û rûyê heyvê serî da. Heyvê, bi hêdika xwe ji telpa ewr xilas kir û ewr li pey xwe hişt.

Hemû tiştên li ser erdê, bi pêkhatina vê bûyerê hesîyan. Xuşînî bi dar û dehlan ket, bayê xwe di nav gulî û pelên daran da berda jêr.



Gîya û qirş û qal hejand û gilêle bi gilêle ber bi êzmîn rahewa ket. Di heman demê da ji dûr û kûr ve deng bi pepûkek ket, çûçikek çend caran wîtwîtiya. Dû ra hemû tişt dîsan vegeîyan ser bêdengîya xwe.

Te wer zan dikir ku ewrê gewr, xwe di zerîya heyvê da şûşt! Kincên gewregirtî ji xwe derxist û kirasekî cilspî li xwe kir.

Ewrê cilspî, bi rewşekî nazdar û nazenîn ji cihê xwe lîvîya û bi pey heyvê ket. Serê pêşî hêdîka, dû ra bi gavên lezbez xwe gîhande heyva çardeşevî. Mîna destmala hevrişimî ya sîsik, bi goşeyê heyvê girt û xwe vekîşand nîvrûyê heyvê. Ji ber lezlivîna ewrê hevrişim, ne dîyar bû ku heyv dimeşîya. Bi lez û bez heyvê rawirt û ket pêşîya heyvê. Heyv, êpê paş ve mabû. Ewr, çawa hat wisa jî ji navê hilhat û ji ber çavan winda bû.

Strêkên ku diketin bin bandora ronîya heyva çardeşevî ya sîgiran; heta ku heyva sîgiran dibihûrîya û diçû, bi rûmetgir tirêjên xwe melûl dikirin û vedimirandin. Piştra bisemtika çirayên xwe vêdixistin û di hîvronîyê da diçirisan.

Êdî heyva çardeşevî ya sîgiran, berê xwe dabû asoyê. Di her gavê da girs dibû û zerîya rû lê kêmbû, ber bi sortîyê ve diçû. Lacîwerdîya asîman, bi seranser vediguharîya tîrlacîwerdîyê.

Heyva çardeşevî ya sorzerî diçû ava...

Di pêşîda berlêva xwe danî ser lêva asoyê. Dû ra, wek sênîya sip û sor xwe giran giran berda hêmbêza alîyê rojavayî. Hêdî hêdî ronîya xwe ya ber bi lêvê asoyê ve jî vekîşand. Ezman û her tişt di şeverêşê da man. Bi hezaran stêrk di sayiya asîman da diçirisiyan. Di tarîya şevê da tenê vîre vîre stêrkan olan didan...



RÛBAR ELÎ

TU BI XÊR HATÎ

Tu bi xêr hatî
Û spas dikim
Ji bo heyva te anî
Daleqand li asîmanê dilê min
Yê çîk tarî

Tu bi xêr hatî
Tu zanî tu tişteke min tune
Ji xeynê çend hêviyên bejî,
Çend zarokên bênav
Yên ji çîrokên dayika min mayî
Û
Çend beybûnên
di bin piyê gamêşan de perçiqî...

Te av da hêviyên min
Nav da zarokên min
Star da beybûnên min

Tu bi xêr hatî
Û spas dikim
Ji bo heyva te anî
Daleqand li asîmanê dilê min
Yê çîk tarî.





Konê Reş

**BI XÊRA MÎR CELADET
BEDIRXAN
ZIMANÊ ME JI AXAFTINÊ BÛYE
ZIMANÊ NIVÎSANDINÊ**



Bi helkeftina ku 15ê vê tîrmehê/ 2021, (70) sal di ser koçkirina Mîr Celadet Bidirxan re derbas dibe, bi min xweş e ku hûn serwestî van gotinên min bibin: Erê Mîro! Bi xêra serhildana Botan giyanê Kurdperweriyê di hinavê bav û bapîrên me de hat çandin.. Erê mîr Celadet Bedirxan! Bi xêra ked û westa te, bi xêra Hawar û Ronahiya te, bingehê edeb û wêjeya kurdî a nûjen, bi tîpên latînî li ber me hat vekirin..

Belê, bi xêra mîr Bedirxanê mezin, kur û neviyên wî, roja îro em xwe peyebilind di nav netewên cîhanê de dibînin; bi saya mîr Bedirxan yekemîn serhildana kurdî a netewî destpêkiriye..

Bi saya kurê wî Miqdad Medhet Bedirxan, bingehê rojnamevaniya kurdî ji me re hatiye danîn û bi saya neviyê wî mîr Celadet Alî Bedirxan û Hawara wî, hîmê zimanê me hatiye danîn, zimanê me bûye xwedî alfabeyek xweser.. Zimanê me ji axaftinê bûye zimanê nivîsandinê ku roja îro piraniya Kurdan bi alfabe ya wî dixwînin û dinîvisînin.

Erê, bi xêra herdu kovarên mîr Celadet Bedirxan; Hawar û Ronahî û Stêr û Roja Nû yên birayê wî Dr. Kamîran Bedirxan nivîskar û helbestvanên bejin bilind di hola afirandin û çanda kurdî de hatin xuya kirin, mîna Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can, Hesen Hişyar..hwd. Hem jî bi weşana Hawarê re, helbesta kurdî ya nûjen bi pênuşa Mîr Celadet, Dr. Kamîran û Qedrî Can û kurteçîroka kurdî ya hunerî bi pênuşa Dr. Nûreddîn Zaza serê xwe bilind kirin. Eger mirov li dîroka malbata Bedirxaniyan vegere û berpêl bike, wê bibîne ku Bedirxanî bi tevayî di sirgûn û zîvariyan de hatine kuştin û mirin.. Ev yek dihêle ku em navê wan bi tîpên zêrîn di dîroka gelê xwe de binivîsînin.

Mîr Celadet yê ku gotiye:

(Miletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi du qeweta, du çekan diparêzin: Ol yek, Ziman dudo. Lê heke ola milletê serdest û bindest yek bibe, hingî çek yek bitenê ye, û bend tenê ziman e..)



XIZAN ŞÎLAN

ÇAVZEYTÛNA MÎN

çavzeytûna min
li tunebûna te
tovê xeman li ser zeviya temenê jar
hate reşandin
bedena xeyalên xewle
di qêrîna bêdengiyê de
dilerize
hestiyên pişta demsalên rengîn
xûz bûn
pelên dara hêviyên keskeşîn
weşiyar
li ser kolanên hinavên min
mij û dûman kumişî
çavzeytûna min
bêyî te
ez bûm kêlê goristaneke
bêxwedî
hemû bajar ji min re xerîb
û biyanî ne
xwezî di gewriya min de bû girêka
nehatî vekirin
rojên derdgiran
li movikên pişta henasa min
siwar bûn
çavzeytûna min
piştî çûyîna te
parsûyên singa helbestên jankêş
ji hev de ketin
keservedanên kûr
li titûna cixara min hatin
pêçandin



XIZAN ŞÎLAN

HELBESTVAN

û di dûmanê cîgera peritî de
difetisim
awaza têlên tembûra dilzîzbûyî
hate birîn
çavzeytûna min
li dûrbûna hesreta te
stûna konê bextewariyê
qelişî
rondikên êşê diniqutine
giyanê tenik
bîranînên rengşîn li eniya xwe
reş girêdan
kelecana dilê perpitî
di qefesa singê min de
gurpegurp e
bêrîkirina te
ez sergêj û sermest kirim
û li nav pêlên kûrahiya ramanên tevlihev
min siya hebûna xwe
winda kir.



REMEZAN BAKUR

**LI KURDISTANÊ
NASYONALİZIMA
BAWERÎ Û BÎRDOZÎYAN**

Minaka xirab: Mir Mihemedê Rewandizî (Paşayê Kor)

Di diroka welatê me de, bi hezaran minakên xirab hene, yek ji wan jî, hewl û bizava Mîr Mihemedê Rewandizî ye. Mîr Mihemedê Rewandizî, bi ziretopizî û xwînrêjandineke giran, hatîye ser textê mîrekîya Rewandizê, piştî hatîye ser textê mirekîyê, dest bi hewl û bizavên serbixweyîyê kirîye, lê mixabin hewl û bizavên wî, bûne kurdkûjî û xwekûjî.

Çi danûstandin û li hevkerin bi mîr û axayên kurda re nekirine, yekser dest bi êrişên giran kirîye, ev jî nişana qelsî u lawazîya kurdane ya diplamasî û danûstandinê ye, hê jî wisa dom dike, destpêkê êrişî herêma Soran kirîye dûv re, herêma behdînan û paşê herêma dasinîya û şengalê.

Dema berê xwe daye herêma Behdînan, bê dan û standin û bê hevdîtin êriş kirîye ser eşîreta Zêbarîyan, da mîrekîya Amêdiyê bixe bin desthilatdarîya xwe û dema êriş kirîye ser Zêbarê, serokê eşîreta Zêbarîyan, Silêman Axayê zêbarî, daxwaza hevdîtinê ji Mîr Mihemed kiriye, Mîr Mihemed qebûl nekiriye û gotîye Silêman axa : "Ez çî hevdîtina bi kesekî re nakim, were rayê." Piştî hevdîtin pêk naye, şer di navbera mîrên Zêbarîyan û lêşkerê Mir Mihemed da çêdibe û her diçe şer giran dibe. Mîr Mihemed li dola Zêbarê bi gotinên mezin û kalên herêmê, çar sed mîr ji eşîreta Zêbarîya kûştine.

Li ser vi şerê giran ,stranek hatîye gotin û li herêma Behdînan û Colemêrgê hê jî ev strantê gotin, stran wiha dest pê dike.

Dola zêbarê hay lê lê hay lolo
Mir Mihemedo hay vê carê wo
Dola zêbarê hay lêlê hay lolo
Doleke kûr e hay lêlê hay lolo
Şeşxana lûr e lûr hay lêlê hay lolo

Mîr Mihemed, piştî qetil û xwina gelîyê zêbarê berê xwe daye herêma Dasinîya jêr û Şengalê. Wê demê Mîrê Êzîdxanê, Mîr Eli bû, Mîr Elî da baweriya Mir Mihemed pê bê û bizanibe ji wî na tirse, bi tena serê xwe çûye pêşwazîkirina Mîr mihemed.

Mir Eli daxwaza bi hev re xebitîne ji Mîr Mihemed kiriye û jibo piştgirîyê, dilsozîya xwe bi lêv kirîye lê Mîr Mihemed daxwaza tişteke din ji Mir Eli kiriye, gotîye, were şehde bide. Mir Elî gotîye; "Heke ûmmeta Îslamê kê mabe, bi şehdedana min zêde nabe, heke zêde be bi şehde nedana min kê mabe, dev ji vê daxwaza xwe berde, pêşnîyara min binirxîne, "

Piştî Mîr Elî şehde nedaye û dev ji baweriya xwe ezdayetîyê bernedaye, Mîr Mihemedê Rewandizî ew girtiye û biriye Rewandizê li wir kûştîye û ferman bi ser şengalê da rakirîye, qetil û xwîneke giran li şengalê rijandîye.

Kesek bi kûştîna xelkê xwe, welatê xwe ava nekirîne, heke Mîr Mihemedê Rewandizî li şûna êrişkirina ser eşîrên Kurdan, lihvetin kiriba, eşîrên herêmê qe ne kiribane eşîrên kurd wê ji wî rê bibane hêzeke hezêz.

Lê kurdkûjî kir û ji wî ra jî bû xwekûjî, hêj birakûjî û xwekûjî li nav me kurdan dom dike.

Gelo Mîr Mihemed xwestibû bibe xelîfê Îslamê yan jî bibe şahê dewleteke kurdan, li dîroka nêzîk, kurd bûne pasevanên baweriya islamê, hewl û bizavên netewebûnê mane lawaz. Ji ummeta îslamê, eşîretên ereban jî bûne xwedîdewlet.

Di pêncî salên borî de kurd bi birdozîya sosyalîzîmê hatine mijûlkirin û xapandin.

Bîrdozîya netewe azad nekirîne, herwiha dîl girtîne û bindest kirîne, her netewe ne bi bîrdozîya, ferheng û zagonên tora xwe ya urfî hebûne, xwe parastine û azad bûne.

Ji vê minakê û gelek mînakên din dîyar e ,siyaset, diplomasi û lobî, alîyê me Kurdan ê qels û lawaz e, alîyê me yê xurt şer û şoreşin divê her kurdek bizanibe bi destketina encamên baş, bi siyaset, diplomasi û lobîyan e.

Çend pêxember hatin û çûn, çend bîrdozî serdest bûn û têk çûn. Ol û idolijî demkî û mirdar in, ya mayînde çanda netewên qedîm e, bi hezaran salan li tevnê hebûnê hûr û kûr hatîye ristin û hûnandin.

Ne hewce ye em li sergoyên xelkê rêbaz û bîrdozîyên gemargirtî berhev biken û ne hewce ye em bibine pasevanên ûmmetan. Ya qenc ew e, em bi hemû bawerîyên xwe, li çanda xwe û Welatê xwe xwedî derkevin.

Îdameke li taximê gund*

Keyayê xweliyê pêpeloka temenê winda
bike,
nava jenerîka mirinê me.
Ji bin xwîna min de dipeliqin
şeytanên mêrgên feyrûzî,
firîşteyên şevdêr.
Kê keçaniya ewra sayewer bi brûskên
qeşayê ve qelaşt hingaft?
Şehîna nifşa çalan
ji asîtana jêrîn bi hîrehîr e.
Lawîna mehînen enîronî
dibore, ji min dûr e.

Keça bejahiyê pê li gangilokan meke!
Ma pîrhebokê ji te re negot?
Gulgeniman ji lepên gulperiyên bezok
bilindtir,
tu car serî hil nedane.
Ger li pey çerxa êvarê vekulimî,
xwêya êrd di xwîna dêv de heliya,
bitirs, bide girî!
Simitandî ye tehtik,
kiloxa rabirdûyeke nediborî,
kiloxa hêvîke mirok e.

Bo şehîdên şer mestirîn,
lêbelê ji şahidan re.
Pêşbîniya tolvedanê mekin,
belkî ji tolvedêran hez nekin.
Cerkî evîna biyan ji dilsoziyê ve ket,
Medya zaroyên xwe dixwe.
Helbesta Ovid li ser,
li perava behreke reş
Winda ye, winda.

** Ji bo giyanên hevdeh hezar qurbaniyên
kiryarên diyar û nediyar ên salên nodî.*

AZAD EKKAŞ





DENNIS DARGUL

Ciyayên bilin li ber te berxwedan,
Çukên Esmanan, ji ber te silav dan,
Li ber bejna te, deşt û bahniyan renk dan
Sor e, nexşê dawî ya giyanê Şehidan,

Tu her dem, dê berz u gewher bî,
Cihê bihejî dê her çax bi sebir û aram bî
Sibera te bese, dê gel xak û welat bî
Evinî eve dê tu her û her bilind û bilind bî

Roja piroz tirêjên erd u esmanan,
Bila her şev be jî, roja me bixudan,
Rengê xwezayê da deşt û zozanan
Sor e, nexşê dawî ya giyanê Şehidan

Tu kevoka Aştiyê, ser me digerî
Strana azadiyê ber bay dibejî
Bihar eve ye, gav bi gav ronak dibî,
Evinî eve dê tu her û her bilind û bilind bî.

Li ber sibera te em xwedê dan
Li ber bejna te, Egidan giyan dan,
Li Dilê Kurdistan, dirok ronî dan
Sor e, nexşê dawî ya giyanê Şehîdan

Tu dê dîrok, wêje, helbest û hêvî bî,
Bes tu bixaze, tu her derê dê bilin bî,
Şayane, li ser xak tu her erd û esman bî,
Evinî eve dê tu her û her bilind û bilind bî...

ALA MIN

Xemla Pîroz ya Şînahiya Esman,
Nexşa vehandî ya xaka niştiman,
Evina piroz ya erd û esman,
Sor e, Nexşê dawî ya Giyanê Şehidan,

Li ber 21 tirêjên rojê xwe delalinî,
Destan, me ji te xwed, pir bi evînî,
Xwin me rijand da tu her xwe jor bihejî
Evinî eve, dê tu her û her bilind û bilind bî

Îhsan Bîrgul

ZIMAN Û SIYASET

Eger we nivîsên beriya vê nivîsê yên di Bernamegehê de xwendibin , yê were bîra we ku nivîsên beriya vê nivîsê li ser ziman bûn. Em ê dîsa bi ziman bidomînin. Bi mijareke herî zêde tê piştguhkirin. Mijara zimanê siyasetê. Em ê di vê nivîsê de mijara zimanê siyaseta bakur bi çend mînak vejenînin.

Ji ber ku çepgirên Tirk siyaset ji derve anîn, Kurdan jî a rast Kurdên çepgir jî ev siyaset bi zimanê wan ji wana wergirtin. Siyaseta Kurd ya bakur a herî xurt -yanî kevneşopiya ji HEP'ê bigire heta îro- her gavê qala ziman dikir, hêj dike. Lê tu car ziman nebû armanc, tenê wek amûr ma. Wekî qatek cilên taybet yên meriv ji bo rojên taybet veqetîne û tenê roja lazim bike li xwe bike. Ji bo ku em baş têbigihêjin tenê li axaftinên siyasetmedaran yên bi "silav hevalno" destpê dikin, bi "xatirê we hevalno" diqedin binêrin bes e... Îja hûn ê bêjin problem çî ye?

Problem ev e ku bi kîjan zimanî siyasetê bikî, siyaseta te jî li gorî wê teşe digire. Bo nimûne; di sala 2002'an helbestvan Ahmet Tellî namzetê me yê parlementeriyê bû. Namzetê bloka " Ked, Aşîfî û Demokrasiyê". Ez jî xebatkarê hilbijartinê bûm. Em tev çûne taxekî.



Ahmet Tellî dê li buroya hilbijartinê biaxiviya. Wexta Tellî derket hemberî girseyê wiha got " Dostno! Wekî Nazim gotî ew dijminê hêviyê ne". (Jixwe piraniya girseyê di berdewamiya axaftina wî ya din de jî zêde tişteke fam nekir)....

Hûn têgihîştin ne wisa, sedan kesan belesebeb roja jidayîkbûn û mirina Nazimê helbestvanê " niştiman" bibîrnaynin. Di her gotina te de navê wî ango kesên din hebe, tu nikaî gazincan jî ji girseya xwe bikî. Ya din; Nazim gul jî be ya civata xwe ye kul jî be ya civata xwe. Ji bo me çî...



Pir mormal e, tu ji civata xwe re qala çî bikî, ew ê bi wê re rabe û rûnê. Nexwe çîma ciwanên Kurd şûna Cigerxwînê ji xwîna xwe, Nazimê pesinnetew bibîr bînin. An jî ji wan ciwanên ku Nazim bibîrtînin çend kes Evdilla Peşew dinasin! Peşewê remza xîreta helbestvaniya netewî. Bi min pir kê mî in. Çîmkî li vê erdnigariya em lê dijîn, civak bi du tiştan dirûv digire. Yek medya ye yek siyaseta e. Çî cure siyaseta dibe bila bibe. Rewşa medyayê jixwe li holê ye. Ya siyaseta jî ne kê mî wê ye. Rewşa siyaseta ango zimanê siyaseta Kurdî ji herduyan jî xirabtir e.

Em bi mîna keke din nivîsa xwe bidin ser hev. Ez ne şaş bim Newroza 2012 an jî ya 2013'an bû. Li navçeya me şahiya Newrozê hebû. Gel bi coşeke mezin li hev civiyabû. Serokê navçê ya Partiya Heremên Demokratîk derket ser dikê.

Bi Kurmanciyekî Serhedî - hinek jî Kurdiya standart tev dikir- hitabê gel kir. Ji ber ku zimanê wî zelal û Kurdî bû her kesî bi baldarî û kêfxweşî guhdar kir. Wexta encumenê bajar yê giştî derket ser dikê, piştî silavdayîneke bi Kurdî, dest bi axaftina Tirkî ya bi tije têgehên siyasî kir. Bi berde wamiya axaftina wî re gel dev ji guhdariya wî berda, ji bilî çend kesan her kes bi tiştêkî din re mijûl bû....

Wekî gotina dawîn ango kevirê serê lodê, heta em dev ji siyaseta ziman bernedin, zimanê xwe nekin zimanê siyaseta xwe, çavên me yê li deriyê xelqê, em ê siwarê hespa wan bin...



Ciwan Serhedyan

EZ Ê WERIM

Va ye dîsa payîzê her çar hêl pêçan,
Ewr ezman giran in ez dîsa bêy te me.
Xwe li rûyê min digrin libên baraneke hûr,
Ji keziyên te dûr, pel neman li daran payîze.
Xuya ye,
Xeyala bihev şadbûna bin baranê da,
Ji destên me xuricî dîsa.
Şev çûn ji dest tu zanî,
Bila sibehên min bimînin ji te ra.
Lê tu nepirse ku ez ê kengê werim,
Ez ê werim ku payîz rê bide,
Ez ê li ser zivistanê ra ra gav bidim
Bi bişxivîna xaşxaşkên nûbiharekî ra,
Bi dengê bayê sibehekî ra,
Bi xuşîna avên biharekî ra
Ez ê werim
Ku kedera qedera min rê bide,
Ez ê bi revê werim...



SIRAÇ OĞUZ

Dr. Nûrî Dêrsimî Ronahîya Çavê Gelê Kurd e!

Dr. Nûrî Dêrsimî, xweşmêr û ronakbîrekî Kurd bû. Divê her Kurd wî baş nas bike, ku ked û xebata wî ya mezin neyê jibîrkin. Rol û berxwedana wî, bi taybetî ji bo ciwanên Kurd bibe mînak.

Dr. Nûrî Dêrsimî di sala 1892an da, li gundê Axzonîkê hatîye dinê. Dibistana seretayî li gundê Xozatê, ya navîn jî li Xarpêtê diqedîne. Di sala 1911an da, dest bi Zanîgeha Stenbolê beşa bijîşkîyê ya ajalan dike.

Ji ciwanîya xwe da, tevî kar û xebata neteweyî dibe. Di sala 1918an da dibe endamê Komela Bilind ya Kurd, ku serokê komelê zanyarê Kurd ê gewre Seyîd Ebdilqadir ê kurê Şêx Ubeydellahê Nehrî ye. Ji bo ku gelê xwe ji bindestî û koletîyê rizgar bike, bi dilsozî dixebite. Sedem beşdarbûna wî ya di çalakîyan da tê binçavkirin. Piştî berdanê, ji Stenbolê bi rê dikeve, diçe welatê bav û kalan û li Dêrsimê bi cîh dibe.

Di sala 1921î da bi Elî Şêr ra, ji bo amadekirina serhildana Qoçgirîyê dixebite. Demek şunda tê girtin, lê bi alîkarîya Seyîd Riza serbest tê berdan.

Girtin û zîndankirina wî, hêvî û bawerîya wî kêr nake, b herawayî têkoşîna xwe ya netewî berdewam dike. Di dema serhildana Dêrsimê da jî ew ek ji rêberên serhildanê yê sereke ye.

Mixabin, dema ku serhildana Dêrsimê têk diçe, ew neçar dimîne û bi deh hevalên xwe va berê xwe dide binxetê. Ji bin xetê diçe Urdinê, di sala 1940î da jî li bajarê Helebê bi cîh dibe. Kar û xebata xwe ya di warê rewşenbîrî sîyasetê da li wir didomîne.

Piştî dardakirina Seyîd Riza, dewleta Tirk ji bo kesê ku serê Nûrî Dêrsimî bîne, 4000 hezar zêrên Osmanî xelat datîne. Dema dewleta Tirk dibîhîze ku ew li Urdinê bi cîh bûye, ji hikûmeta Urdinê radestîkirina wî dixwaze, Urdin daxwaza dewleta Tirk red dike.

Di sala 1952an, pirtûka xwe ya bi navê „Di Dîroka Kurdistanê da Dêrsim” (Kurdistan Tarihinde Dêrsim) dinivîsîne û li Helebê çap dike. Mixabin ew pirtûk ji alî rejîma Sûryê va tê qedexekirin. Di pirtûkê da komkujîya Dêrsimê ku, wêrankirina ji 200î zêdetir gundên Kurdan û kuştina 15 000 hezar jin û zarok, kal û pîrejanan bi belgeyan cîh digrin.

Nûrî Dêrsimî mala xwe ji Kurdan ra vedike. Gelek Kurd, li Helebê û li Cizîra Rojava li mala wî û bi alîkarîya wî hînî zimanê Kurdî dibin. Ji zanebûn û ezmûna wî ya kûr sîd wergirtine. Berî koça xwe ya dawîyê, di sala 1963an da li goristana “Henan” ya nêzîkî bajarê Efrînê ji bo xwe û jina xwe, Ferîde Dêrsimî ra du goran li kêleka hev çêdike. Li ser kêlika xwe ew rêzên li jêr dinivîsîne.

Li ser vê rêya dijar
Min jî kire pir hawar
Da ji bo we jî rojekê
Dinya bibe gulbihar!”

Dr Nûrî Dêrsimî di roja 22ê Tebaxê, di sala 1973an da li Helebê koça xwe ya dawî dike û di nav refên şehîdê Kurdistanê da cîhê xwe digre. Ew li Şêx Seîd, Elî Şêr, Seyid Riza, pêşewa Qazî Mihemed û hemû navdar û şehîdê Kurdan dibe mêvan. Dr. Nûrî Dêrsimî, di pirtûka xwe da bangewaziya xwe li keç û xortên Kurdan dike û dibêje:

“Tolhildan!..

Ji bo paqijkirina lekeya li ser namûsa Kurd;

Tolhilda!..

Ji bo kêmkirina qîrîn û hawara bi sedhezaran zarokên Kurd ên hatine singûkirin;

Tolhildan!..

Ji bo aşkirin û kêmkirina hawara keç û bûkên Kurdistanê yên ku avêtine geravan û di nava agir de hatine şewitandin;

Tolhildan!..

Ji bo bicihanîna armanca qurbanîyên ku bi qehremanî di bin sêdarê de, mirin bi dirûşma; „Bijê Kurdistanê azad û serbixwe!” pêşwazî kiriye û taca şehadetê hilgirtiye;

Tolhildan!..

Ji bo selihandina welatê maderê wêrankirî yê bi navê Kurdistanê;

Tolhildan!..

Ji bo paqijkirina welat ji laşê gemarê çeqel û keftarên ku li diyarê kurdan dilorin;

Tolhildan!..

Ji bo ku bidawîkirina hewte hewta
 kuçikên ku dikevin dû kehbika bi navê
 Medeniyet' û êrîşî me dikin;
 Tolhildan!... Tolhildan!.. Tolhildan!..
 Bi tenê ev gotine ye, wastiyeta ku li ser
 cesedên şehîdên me, bi xwîn û hestirên
 çavan hatiye nivîsandin!..
 Divê her Kurdê xwedî namûs, her mirovê
 ku dilê wî bi hestên kurdbûnê lê dixê, her
 ciwanê ku di demara canê wî de xwîna
 kurd, diherike vê wasiyetnameyê ji bîr
 neke. Heta ku wê bi cih neynî, rehet
 neke, bi rehetî ranezê û bixebite!



Em deyndar in, li ser riya nîşê kurd ku
 dîroka me ya duh bi xwîna xwe
 nivîsandiye bimeşin û rêwî bin li ser şopa
 ku wan bi xwîna xwe diyar kiriye!
 Emê bi xwîna xwe asoya sor a
 serxwebûna kurd ronî bikin. Emê bi
 volkanên giyana xwe roja helesor û ronî
 ya rizgariya kurd biafirînin!

Çavê dîroka Cîhanê li ser me ye.
 Şehîdên me, çav li rê li benda me ne!
 Bi hezaran qurbanîyên ku me pêşkêşî
 Xwedayê Azadiyê kirine, li bendê ne ku
 em gorekê jê re amade bikin. Li bendê ne
 ku em abîdeyekê ji bo bîranîna wan ava
 bikin !..
 Ev abîde, Kurdistanê azad û serbixwe ye!
 Ev abîde, dewleta Kurd e, ku di nava
 civata neteweyan de cihê xwe yê bi rûmet
 û bi şeref bigire.
 Em giyana şehîdên xwe bextewar bikin
 Bijî Gelê Kurd ê ku xwedî qehreman û
 leheng, bijî Kurdistanê azad û serbixwe!"
 Vet. Dr. Mehmed Nûrî Dêrsimî





DILAZAD A.R.T

NÊRÎNEKE GIŞTÎ LI SER EDEBÎYATA NÛJEN YA KURDÎ

DESTPÊK

Ev xebat wek kurteyêke edebîyata kurdî ya modern e. Di vir de armanc wek tegehên sereke yên ku bi edebîyata kurdî ya modern ve giredayîne bêne pêşkeşkirin. Ew kesên ku di demeke kin de li ser edebîyata modern bixwazin bibin xwedî agahîyan dikarin ji vê xebatê sudwerbigrin. Bi taybetî ev xebat ji kesên ku li zanîngeha beşa ziman û edebîyata kurdî dixwenin wek nivîseke kurte hatîye nivîsîn.

1. Çend Gotinên Bingehîn Ji Bo Modernîte

Paşxaneyê modernîte; sanayî, sekulerîzm (dinyayî) û rasyonelîzm (aqilmendîye). Modernîte, kar di nav mirovan de parvekiriye ango karbeşî derxistiye pêş. Modernîte mirov giredayî beşekê kiriye.

Yanî kar minimize kiriye. Bi vî awayî takekesî derxistiye pêş.

Berê navenda her tiştî Xweda bû.

Di modernîte de navend bû zanî û hiş. Zanist û ehlaq û hûner li hember Dêrê (Dîn) û Qesrê (Rêvebirî) derdikevê. Rexne vê demê pêşde diçê Bi awayekî eşkere ji îro xuya dibe ku serkeftbûye. Modernîte be Şoreşa Fransîz destpêkir. Ku sê têgehên bingehîn derxistin pêş. Ev têgeh; wekhevî, biratî, azadî (3 rengê ala Fransîz ya îroyîn). Bi modernîte re mirov li pey şopa xweyî kevin geran. Ku bi navê revîvalîzm tê naskirin.

Revîvalîzm; vegera cewherê xwe. Di modernîte de jiyana tabula rasa ye. Tabula Rasa; lewhaya vala ye. Ku tu çi li sere binvîsîne tu dikare ji nûve jiyaneke derxê meydanê. Nîrxekê dî ya modernîte îcadkirina matbaye ye. Bi matbaye re raman zû belavbûn.

Bi matbaye re;

1. Zimanên netewî bûne zimanê perwerde ye
2. Edebiyatên netewî avabûn
3. Kevneşopeke edebî destpêkiriye.

2. Modernîteya Kurdan

Di dema Osmanîyan de li Kurdistanê matba li Wan, Bidlîs û Diyarbekir tenê hene. Lê ne di destê kurdan de ne. Modernîteya kurdî, modernîteya rewşenbîrî ye. Rewşenbîrî jî bi rêya edebîyate derketîye pêş. Ji xwe modernîte pêşî di edebiyata kurdî de tê xuyakirin. Destpêka edebîyata modern ya kurdî bi Hecî Qadirê Koyî (1815 – 1897) dest pê dikê.

3. Qonaxên Edebiyat Kurdî

3.1. Qonaxa Yekem; Stenbol

3.1.1 Komele û Weşanên Wan

1. Kurdistan Azm-î Kavî Cemîyêtî 1900. Rojnameya Kurdistan di navbera salên 1898 – 1902yan de 32 hejmar derxistin.
2. Kurd Teavûn we Teraqqî Cemîyêtî 1908. Kurd T. ve T. Gazetesî di sala 1908 9 Hejmar derxistin.
3. Kurd Neşrî Mearîf Cemîyêtî 1910 – 1911. Bi navê Kurd Numûne Meşrutîyet Îbtîdaîsî dibistanek vekirin.
4. Kurd Talebe Cemîyêtî (Hevî) 1912. Dibin navê Hêvî de; Rojî Kurd (Reveberî di deste Bedirxanîyan de bû.), Hetawî Kurd (Reveberî di deste Baban de bû.) û Yekbûn hatin derxistin.
5. Kurdistan Muhibban Cemîyêtî 1912.
6. Kurdistan Tealî Cemîyêtî 1918. Kovara Jîn 25 Hejmar weşandin.
7. Kurd Tamîm-î Maarîf we Neşrîyat Cemîyêtî 1919.
8. Kurd Kadınları Tealî Cemîyeti 1919.

* Peyman; 1908, Îttîhat we Teraqqî Cemîyêtî ya Diyarbekirê derdixist.

3.1.2 Nivîskarên Qonaxa Stenbolê

Ebdirehman Rehmî; Memê Alan, piyesa yekemin e. Xelil Xeyalî; Di Jînê de bi navê Kurdîye Bidlîsî, di Hetawî Kurd de bi navê Bave Naco, M.X nivîsandiye. Ji xeynî vana Pîremerd, Kemal

Fewzî, Hemzeye Muksî, Memduh Selîm, Seîdê Kurdî, Kurdîzade Ehmed Ramiz, Ebdullah Cewdet, Mihemed Mihrî jî ji ekola Stenbolê ne.

3.2. Qonaxa Duyem; Silemanî, Mehabad (1920 -....) Kevneşopîyek (Tradîsyon) berdewam e. Li Başur; di sala 1988de 166 çîrok çap bûne. Ji bo tradîsyone 2 bingeş pêwistin;

1- Navend, ji bo bicîh anîna xwestekan.

2- Perwerde, derdora kevneşopîyek edebî.

3.2.1. Nivîskarên Qonaxa Silemanî – Mehabad Hesên Kizilcî; Kenê Parsek

Rehmî Qazî; Peşmerge

Pîremêrd; Diwan

Abdullah Goran

Hemîn Mukrîyan

Hêjar

Cemal Nebez

Şêrko Bêkes

Abdullah Peşew

Ferhad Shakely

Ferhad Pîrbal

Şêrzad Hesên

3.3. Qonaxa Seyem; Şam

Di sala 1932yan de destpêdike.

Hawar, 1932 - 1943, 57 hejmar

Ronahî, 1942 - 45, 28 hejmar

Roja Nû, 1933 - 46, 73 hejmar

3.3.1. Cureyên Edebî Yên Ku Di Vê Qonaxê De Hatine Nivîsîn.

Sehitî (ceribandin), şano, adaptasyon,

kurteçîrok, helbesta serbest, werger

3.3.2. Nivîskarên Qonaxa Şamê

Celadet A. Bedirxan, Kamuran A. Bedirxan,

Qedrîcan, Osman Sebrî, Nureddîn

Zaza, Cegerxwîn

Helbesta peşîn ya serbest Celadat nivîsiye.

Navê we Bilûra Min e.

Hevind; piyasa, Celadet Bedirxan, piyasa

duyemin e. 1933

Memê Alan; Cîhad

Hevind; Şerê Welat e

3.4. Qonaxa Çaremîn; Erîvan (Qafqasya) 1935 -1991

Ev qonaxa edebî bi taybetî kurdên ku li Erîvanê bicîhbûne avakirine. Ji bo hilweşandina Yekîtiya Sovyetê ev sedem di sala 1991e de bi dawî dibe. Lê dibe neye jibîrkin ew kes piştî sala 1991e ji xebatên xwe dewam kirine.

3.4.1. Nivîskarên Qafqasya û berhemên wan

Ereb Şemo, Şivanê Kurmanca, 1935 (Roman yekem)

Eliyê Abdurrahman, Xate Xatun

Egidê Xudo, Dê û Dêmarî

Heciyê Cindî, Hewarî

Tosine Reşîd, Min Berîya Şevên Tari Kir

Eskerê Boyik, Çanda Kurdên Sovyetê

3.5. Qonaxa Pencemîn; Dîaspora, Swed, Dîaspora, belavbûna mecburîye.

Diaspora kurdên Swedê diasporayeke edebî ye. Hêstên kollektîf, nasnameya netewî Hêstên şexsî

Netew û surgun; netewetîya surgunê

3.5.1. Nivîskarên Dîaspora

Li Swed; Mehmet Uzun, Mahmut Baksî, Hesên Metê, Firat Cewerî, Rojen Barnas, Laleş Qaso, Bavê Nazê, Şahîne Bekirê Soreklî, Mustafa Aydoğan, Enwer Karahan

Li Belçîka; Medenî Ferho

Li Fransa; Fewaz Hûsên

Li Elmanya; Helîm Yusif

3.5.2. Kovarên Li Dîaspora

Nûdem, Armanc, Apec, Roja Nû, Kurdistan, Press,

Kurmancî, Bîrnebûn, Vate, Hêvî

3.5.3. Enstîtûyên Li Dîaspora

Enstîtûya Parîs, Enstîtûya Bruksel

4. Çend Agahîyên Taybet

4.1 Çend Agahî Li Ser Qonaxa Erîvanê

Kurdistan Sor, 1923 - 1929

Surgûnên Kurdan

1937 surgûna Sibiryayê, bi destê Stalîn

Reya Teze, 1930 - 1996, 4800 hejmar derketîye. Dibistana Tehrîkum (Erîvan) 1931

Dibistana Mamostetiyê li Şuşayê ya Qerebax, 1932

Radyoya Erîvanê, 1955

Realîzma Sosyalist (şoreşgerî), 1934

4.2. Metnê Modern

Metîn bi 2 alîne

1. Çîrok, bûyer an rêzebûyer; leheng, cîh, dem, ev berhem çi qiset dikê?

2. Vegotin, ev berhem çawa hatiye nivîsandin?

Yanî; çi dibejê, çawa gotiye? (vebejêr)

4.3. Elfabeyan Latînî Kurdî

1. Elifbeya Kurdî Latînî, Lazo (Agop Rozaryan), 1921

2. Elifbeya Kurdîya Latînî, Musayip Axundow, 1923

3. Elifbeya Kurdî Latînî, İshak Monagolov û Erebe Şemo, 1929

4. Elifbeya Hawar, 1932

4.4. Çîrokên Neqedîyayî

1. Çîrok, Fuat Temo

2. Le Xewma, C. Saib, 1926/27

3. Mesela Wijdan, A. M. Caf

4. Awatî Dil, Pîremerd

5. 12 Siwarey Meriwan, Pîremerd

Ji van çapan %53 li Kurdistan (Silemanî, Hewler, ...)

%45 li Bexdaye derketine. Zimanê van çîrokan %96 bi Soranî (kurdî)ye. Jiyanewe (1925) çîroka ku di qonaxa duyem de hatiye nivîsin. Li Bakur; Çîrok

1913 Fuat Temo - 1979 Meyro, M.E. Bozarslan

(Hawar, Ronahî, Reya Teze) % 99 li Stenbol ê, Du zimanî (Kurdî - Tirkî)

Encam

Di vê xebatê de hat dîtin ku modernîteya kurdan di nav rewşenbîran de dest pê kiriye. Modernîteyeke edebî ye. Ev edebiyat bi gelek sedemên cihê di nav gelê kurd de belav nebûye. Bêhtîr dinav kesên zana û rewşenbîr de maye. Lê dibê ew kêmayî tenê ji bo kurdan neyê gotin. Gelên rojhilat bi tevahî di vê rewşê de ne. Disa jî li gor tinebûna dewleteke serbixwe ev xebat hêjayî malê dinyaye ne. Dibe kurd vancewheran biparezin û ev doza ku li erde maye dibe werê bilindkirin.

Zozan Sarica

EVÎN û ÊŞ

Te evîn kir êş
Û berda bedena min
Te em kirin xeyalek
Li ber çavên min
Û bextewarî ji min dûr xist
Te hêviya min kir mirin
Û di bin erda sar de veşart
Ne evîn ne jî hêvî man
Bûne koçber li ser warê xwe...
Bes bixapîne min di wan şevên bêy
xwedî de.
Êdî her!
Her
Û veneger!
Berê xwe bide ezmanê bilind
Da ku bayê xurt de
Kes dengê lingên te neke.
Da ku çûyîna te
Weka mirinê sar û bê deng be...



MERVAN SERHILDAN

Xewna Min



Ma heta kengî ez ê dilzar û gazinbar bim; ma heta kengî di bin barê xeman de ez ê gilî û gazinan bikim; ma çawa dibe ku aramî, bextewarî, kêfxweşî û dilşadî ewqasî ji min dûr diçin? Gelek caran sedemên hejariya xwe ji xwe dipirsim, 'ma hema di çariyeke xewnekê de be jî, çima û ji ber çî ye ku di vê jiyane de serdemêke aram nabihurim, demsaleke hêminî û şikiriye jî nayê bîra min?..' Wekî çavdêrekî li derdora xwe dinêrim; bi koman, bi biran, bi colan û piraniyeke bêjimar mirovên aram û dilşad dibînim; di ber xwe de 'mirovên ku xwediyê bextê çê ne jî, hene' dibêjim û bi şaşwazî li wan mêze dikim. Ev mirovên bextewar, ev mirovên rûken û dev li ken, ev mirovên ku li ber sura ba û bablîsokan bablekan dilîzin, gelo çawa dikin, çilo dikin ku ewqasî şên û şeng in; gelo çawa bi ser ew dika ken û hîkehîkê dikevin? Gelo sibehekê ji xewê radibin û bextê çê di dawa xwe de dibînin,

an jî bendewariyên xwe di curmê xewnên efsûnî de dikutin û li gorî dilê xwe bi teşe dikin; an ew di nav xewn û xeyalan de dijîn, jiyana wan ji rastiye qetyaye û her xwe dixapînin, lê ez fêhm nakim? Şênîyên vî bajarî kêfê diqewitînin, yan jî devê birînên xwe hişk dijidînin; min jî û xwe jî dixapînin. Şênîyên vî bajarî xewnan dispêrin hev, barên hêvî û aramiyê li dû hev rêz dikin, karwanên miradê bi rê dixin. Lê her çî bext e ku ez nikarim hema xewnekê jî bivînim. Hertîştî, herkesî, her qewimînî û her nîşanên dîrokî, pir an jî hindik fêhm dikim; lê gelo çima hê jî nikarim hînî dîtina xewnekê bibim?..

Dema ku xort bûm, carekê deriyek li min vebûbû; rastiyeke wekî xewnan razber bû, yan jî xewneke di ekla rastiyan de herikber bû, kelecaneke hejîner rû dabû ku dilberekê bi awirên xençerî ez efsûn kiribûm. Bi carekê bablîsoka eşqê li serê min xistibû; di nav rengîniya bişirînên wê re û ji dûranî ve min du

ramûsanên neşikandî li gepa wê ya rastê, du jî li gepa çepê reqandibûn; min ew hemêz kiribû û çengî ser pişta xwe kiribû. Min jê heskiribû, min bi sermestî ji lênêrîna jiyane û xwezayê heskiribû; yan rastî, yan jî razber, ma çî ferq dikir gidîno? Şolî bû, jixwe nivê şahidên bûyerê bi sond û selewat digotin ku 'ev geşedan heqîqeta req bû'; nêvî jî digot 'heyra ev qewimîn û xericîn xewneçîrokeke serxweşan bû'. Lê dostino, lê roja ku min xwazgînî şandibûn mala bavê wê, roja ku xwazgînî rûniştibûn, xençera bextreşiyê di noqa min de cit kiribû; "ez wî nasnakim, min ew ne dîtiye û ne jî bêhniyaye; ma ez dîn im ku pê re bizewicim" gotibû. Careke din termê ku di mezêlê dawîn ya vê goristana zindiyane de hişk mabû, meytê ev sêwiyê li ber çavên we bû... Na na, bawer bikin ew rewş, ji vê mirinê jî xerabtir bû... Aya gidî bêbavê, ji Xwedê bitirse, ji Xwedê! Te got ez pê re nazewicim, min fahm kir, ez fêhm dikim; te ramûsanên duqor veşart û venegotin, ez fêhm dikim; te hilkutîna li ser pişta min ji bîr û bala xwe biriye û tune hesibandiyê, ez wê jî fêhm dikim; lê ev derewa ku tu dibêjî 'ez nasnakim, qey di xewna xwe de ez dîtime, ez qet lê rast nehatime, ma ez ê çawa pê re bizewicim?' fahm nakim. Ez vê bextreşiyê qebûl nakim, red dikim, red! Tiyê bivînî, hûn ê bivînin; wê herkes, hemû civak û hemû sêwî bivînin û bibin şahid ku ez ê jî rojeke xêrê, yan jî şeveke ji şevên miradê xewnekê bivînim. Hingê du peyvên ku min di pêçeka bîranînan de hilanîne, em ê ji hev re bikin berbejn!.. Hey malnexerabê, ka tê ew şabaşî û şêrînkirinên bin dara mazî li kîjan xerabsemte bavejî; ka ew soz û qewlên ku me bi dualî ji hev re digot

'Xwedê şahid e, bibe jî tu yî û ne be jî tu yî', ku tu ji min çêtir pê dizanî, tê bi çî binixumî?... Ez bigorî li herêmekê, li erdnîgariyekê, li ew welatê ku canik û camêran di ber sozekê de dihajotin ser mirinê; dema dewran diguhere, dema bext xera dibe hemû hestên dilsoz, hemû nirx û pîvanên pîroz diherimin û kert bi kert xwediyên ew sir û razên eşqa delodîn jî bi xwe re dihetikînin, kêlî bi kêlî. Ey dîrok, wijdanekî bêdeq bibexşîne, bila dilketiyên xem û xeyalan, bila lehengên xewn û çîrokan tu carî exlaqê qedîm wenda nekin li vî welatî!..

Şev dadigere û ji nişka ve 'Min dît û we jî bihîst' dibêjim vê carê ji bestan û pê de diçim dem bi dem û dan bi dan, "Hehaay, digotin 'tu nabînî, tu nikarî bivînî xewnekê, xêrekê, xweşbîniyekê', a vayê min jî dît, a vayê ez jî xewnê dibînim; çî her şev û çî jî hew carekê... Bila mizgîniya min li we be hogirno, di şêst salên temenê bêmirad de, vayê min jî xewnek dît, ji nirx û nîşanên welatê rûmetê. Bila ev jî ji bo we diyariya min be, ey xwendevanên hestiyar; bila ev jî ji bo we xelata min be ey guhdarên ku guhdengên xwendevanên hestiyar in û li vê xewneçîrokê guhdarî dikin..." Heman şevê, yan jî şevek di pey wê kêliyê re 'min dît, we jî bihîst' min gotibû; xewneke vîzyoner di hişê min de afirîbû, hertişt bi hestên xwerû hatibû sêwirîn; ji têgihîştineke bûyî, kemilî û sitewyayî bêtir, dişibiya reşnivîseke vîzyonê ku di hişê min de bi dirûva çîrokî hingivîbû; lê Xwedê zane xewn bû. Kê didît û kê dibihîst, dixwestin ku metnê çîroka xwe bi lezgînî ji wan re jî ragihînim... Ê ma dibû? Lewra hêj teşedana edîtoriyal pêk nehatibû, hêj sererastkirina rastnivîs û rêzimanê nebûbû; hêj min nivîs qet nenivîsîbû; hertişt

bi hûrgulî di serê min de teşe girtibû,
'vîzyoneke afirî' li rastê bû; vîzyon zîzyon
bû, xewn xewn bû lê her tişt razber bû,
divêtî bi lêkirineke lezgîn hebû...
Geşedaneke pêl bi pêl bû; te yê bigota
qey ew deng bi ava kaniyeke nirxan şuştî
bû. Dengê li ber guhên hestyaran olan
dide, te yê bigota ji kaneke rahmanî
derketibû; nerm, zelal, bi olan û
dengvedanê: 'Hîkmeteke çiqasî watedar e
ku Xwedê kurd xweliqandine' digot û
didomand, 'çiqasî zîrek in ku di pêşbirka
man û nemanê de ewlik derketine;
serbilindiyeke çiqasî pîroz e ku pêşengiya
cîhana qedîm kirine û heta niha
têkoşiyane; sûdwariyeke çiqasî girîng e ku
li ser erdnîgariyeke pîroz weridine...'
Ezbenî hinek temî û têbinî çiqasî şêrîn û
xweş in, li ser asoyên hizr û ramanan wekî
loda nirxan hildidin. Lê dîsa ew deng:
'Qewmê kurd çiqasî bi tenê ye, gelo bala
we jî dikişîne; lê ew tenêbûn û tenêmayîn
jî bi qeysa malê dinyayê hêja ye; lewra
her kê şaşitî kirine li rûyê wan gotiye, her
kî nebes û bêkêr maye, ew guherandiye,
raye ji destên şaş û nebaşan derxistiye!..
Xewneke şevan e; min dît, we jî bihîst.
Navendeke mihub, dilxwaz a kurewî geh
bi saya qasidan û geh jî bi hewldana pî û
baskan di navbera kurdan de navbêncîtî
kiribû û di encamê de hemû dînamîkên
kurd, hemû partiyên kurd, hemû sazî û
dezgehên kurd li ser nirxên azadî,
demokrasî û serxwebûna neteweyî, li
avahiyeke dîrokî gihandibûn hev. Lê ji
alîyê hundir de te yê sond bixwara ku ev
avahî, berhemeke modernîteyê bû;
çarmedor kamerayên qeydan, ekranên
televîzyon û komputeran bûn. Herwiha li
her çar qoziyên avahiyê amûrên weşana
zindî û li dora wan jî hewldaneke bi lez a
nûçegihan û rajnamegerên bi kelecان
hebû.

Di hundirê avahiyê de dengê rojnamegeran
bi hîbehîb li nav hev digeriyan ku hinekan
jê bi telefona destan nûçe didan, hinekan bi
siyasetvanan re hevpeyvîn dikir û hinek
rojnamegeran jî bi beza moşekan
nirxandinên analîstan radigihand; kurtepista
hîs û hestan, qeqeba deng û bangan bû.
Lê nûnerên kurd bi biryardariyeke giştî û bi
îradeya neteweyî civata xwe bi çar
zaravayan digerand; te digot qey ceribînên
hezarsale yê tije temî û şîret tev
ferikandibûn. Bi kurdiyeke fesîh û tev hest û
bawerî, tifaqeke çiqasî şênber di navbera
hêzên kurd de afirîbû, Xwedêyo bênezer!
Çiqasî bi rewşeke germ li hev rûniştibûn;
ligel hemû zext û destwerdanên dewletên
dagirker, hêzên kurd bi hev re stratejiyeke
neteweyî afirandibûn, karbeşî kiribûn,
lijneyên dîplomasiyê, siyasetê, çandê,
civakê, ahengsaziyê û avahîsaziyê ava
kiribûn. Ezbenî, di jîyanê de car heye ku
kêliyê berberî temenê mirov giştî ye. Tu li
hundirê vê kevalê binêre, di çirkekê de
qinyatê pê tînî ku wê ev hewldan azadî û
serxwebûnê bîne. Vê gavê, bayekî efsûnî
disure hogirno, bayê azadî û serxwebûnê li
ser war û wargehên Kurdistanê bagera
sînerjiyê vedijene... Rojeva neteweyî û
navneteweyî çawa tê dagirtin, tê beralîkirin
û bi çî awayî sûd jê tê wergirtin, kurdan
nîşan didan. Li hemû welatên girîng û ji
hemû parzemînan cîhanê alîkarî û piştevanî
dihat ragihandin ji bo azadiya ev qewmê
qedîm. Û hewl didan ku hemû gel û civakên
ku li hêrêmê tûşî nefret û şiddeta dewletên
dagirker bûne, di bin baskên feraseta kurd
de vehewînin... Delal û simsar bi ser rîyan
ketibûn, ala serkeftinê di destê mazlûman
de bû, pîrozbahiyên neteweyî dest pê
kiribû; rîya azadî, edlayî, federalî û
serxwebûnê heta dawiyê vebûbû...

Hehaaay, digotin 'tu nabînî, tu nikarî bivînî xewnekê, xêrekê, xweşbîniyekê', a vayê min jî dît, a vayê ez jî xewnê dibînim; çi her şev û çi jî hew carekê... Gelo îcar jî tiştêk, gavek, pêngaveke ku kêma mabû hebû?

Mixabin dostino, dengîni hişk û çort tîn ji derve, jê wêdetir, ji dûr û nêzîk; dengîni tîn ji nav bajêr, ji taxên navberê, ji aliyê malê dengîni tîn. Sed mixabin dostino, gelo hûn jî sosret û karesata ser serê min dibînin, dibihîzin? Li min û ev bextê makûs binihêrin, hemû dengên ku tîn ev çîroka taybet, takekesî ya vî bêmiradî diderewînin. Hemû dengên ku tîn, xewna min a bi tenê, xewna min a ku di tevahiya şêst salên rijî de dibînim hew carekê, diderewînin; xewna min a xas û xalis ku ji serpêhatiyên min daweriviye wek hubrê, diderewînin û ji destê min direvînin; xewna min a ku kêliyê berî kortala li goristanê, diderewînin, dest datînin ser wê û ji min distînin bi şûnik û mîrkuştên zext û zorê. Lê mixabin dostino mixabin, hê jî ew dev ji min bernadin û bi şêwazeke çort dibêjin, "Sêwî û guriyê li wê newalê, kuro li cihê xwe rûne, aşbibe, bitebite vê sibehê. Em ewqas xal û xwarzê, ewqas ap û birazê, em ewqas kom, em ewqas hevgir û eşîr; em ewqas eklektîst, populîst, pragmatîst, em ewqasî îtihatî û Kemalîst li vê derê amade bin û wekî çêlikên hehecikan devên me wekirîbin; nabe ku xewn û xeyaleke nexşîn di bêrika sêwî û bêmiradêkî Çiyayê Mazî de bimîne; ev xewn ne ya te ye, her te çawa, bi çi somê, li ku, bi çi dirûvê û bi çendî caran dîtibe jî, tavilê rabe ser xwe û biterqize biçe ew qoziya dera hanê; ma bayê sor bi me ketiye ku em bihêlin ev çîroka hubrî bi daw û dêlên te re bikişê?..

De ka zû dakeve ji ser wê qube û dîwanê, guriyo ev xewn ne ya te ye bi tenê, me jî dîtibû berê, lê ji kesî re ranegihandibû ferezê, ji kesî re negotibû heta vê çirkê û tu jî li cihê xwe rûne, bes bibêje 'ya min e ev xewn'; em ji te re nahêlin bi her sê navên Xwedê... Ev xewn a gelan e, ne ya te ye û ne jî ya kurdan e bi tenê; êdî bes bîne ser xwebîr û xwebalê, herwiha êdî bes bavêje binî wê destnîşanê, hey bêmiradê Xwedê!.." Heqîqetîni hene di xewnan de didin der; heqîqetîni hene wekî tîş û tîrêşan li dilê xwediyê xwe dikevin, hêdîhêdî û beraber. Herwiha hinek heqîqet jî hene ku ji kêr û gûzanan jî tûjtir û notir in, ruh ji xwediyê xwe dibin, hebûna xwediyê xwe li nebûnê diqewimînin bê ser û ber; li ser dika eşqê xwekuj tevdiqerin, ta bi goristana zindiyên hetikber... Heqîqeta herî dijwar jî wê kêliyê xwe dide der; ger bîra civakî teqiyayî be ezbenî, hemû nîrxên ku tê de gewimîne hişk dibin, dişewibin, heder dibin heder; wê çaxê bi reqîn serê mirov li kevîrê gorê dikeve bêdawî û bêveger. Lê ji bîr neke ey eşqedilê lêgerîner; ew bîr ferz e, bêyî wê bîrê tu nikarî bibî bîrewer, lewra bext li hişkeleyê diasire, ji dara hêvî û bendewariyê hew pelek jî namîne ji sêwî û bêmiradên vî qewmî re, ne li binî û ne jî li ser. Ey xwendevan, vebêje û ragihîne, her te kîjan kurd dît biqîre, "bîr nebe nabe, bîra gelî nebe şoreşa azadî û serxwebûnê nagihîje encamê, bi gef û halanên ji ezber" bibêje û bibilîne, "hertişt dibe belkî lê bêbîr û bêferaset dagirker def nabe bi çend riste, hevok û çarînen ji ezber..."

Ji dûranî ve dengê dayikekê dibihîze bêmiradê di kortala du metro kûr û du metro fireh de, bi keser: Heyfa hinek xewnan ku namînin ji xwediyên xwe'r!..



ÇAYAN OKUDUCI

Venekir

venekir li bin keviran tava teze
di singa kevoka çavbeloq de helinek talan kirî
helînek bi destê birayek hatiye honandin
di destê din pelçiqandin
axxx... axxx...

behna te li ser dilê min hêjar û bêpar
û min rast nekir maseya pê şikestî
kumandaya xerabûyî axavtina xwar

şîv şor av şolî xewn tirş
çaya tehmasarkî dike kekel
çend meselok û tinazên cîrana min a zikreş
hey belqîtiyê hey çavnebarê
dê were vir de li min neçîkînê nefes

yar û dost
dost û nexweş
nexweşî û hevsar

di bîrek reng gewr de dinya biçûk em mazin
bûn
na, bi telak bi selak cil mezin laş çivik dil zîz
hespek mirî li pey siwarek xwînşêrîn
di hindir de qiyamet û tofana ciwanî

îro jî tav himbez nekir laşê min ê li bin siya
zordaran
îro jî te astengiya xwe ranekir
hey bêbexta dildar, taca te di dilê zarokên
bênavdar de
îro jî devkenîn behna xwe neanîn
îro jî bê te bêhevî û bêba
îro jî kehla tinebûne bi dengê te nekir gurre
gur

qedeha xwe birjîne nav qedaha min
bi sed kur'anî
bi rengê ahûra mazda
bi dengê xizir
li benda te me wek esmanên tijî
li benda te me wek tava berf komkirî

de xwe birjîne çi xem çi şabûn çi elem û kul
de birjîne gunehên xwe î sosret
razî me

bi porên xwe î morî lêde cana min
lêxe bi sing û gurzê xwe
ez gunehkarê te tu leneta baxçê min
dê were li min behn neçîkîne



MEHMÛD

BADILÎ

Vexwendina Li Malê

"Li bîra min naye rojekê ji rojan min gotinek dabe rûyê wê ku bi hestên wê vede, yan min hewl dabe ku ez tîrên xwe ber bi xweyîtiya wê ve nîşan bikim taku hesta wê ji keçikanî bixînim, ya rast ez berdewam hişyarbûm ku ew sînorê pêşber di navbera me de hatibû nixîşandin derbas nekim ku ji alîkî ve di rêya hevaltîya me ya xurt de peyda bûbû, ji alîyekî din ve bi sedema hin helwest û tundbûnên ku her carê di nava danûstandinê de ji gencîneya wê ya nehişwer derdiketin derbarê nerîneke cuda yan kiryarek ku hinekî ne baw bûya ji hêla kesên hawîr wê bi xwe ve". Ferhad wisa ji min re got û em li hawîr maseyek biçûk rûniştîbûn li qehwexaneya ku li rex "Banka Darayîyî Gelêrî" dikeve, li bajarê me yê ji ber biyabanîya asîman di nava toza zeng girtî de windayî ye. Qet ew di vê rojê de ne wek tor û sixletên xwe bû, lê di vê kêlikê bi xwe de bêhtir rastîyek zêde li wî xuya dikir, û weku ew bi aramî bi şemalên

nîgeranîya di hundirê xwe de dişewite, ji rûçikên rûyê wî dûmana heybetgirtin û xewçirkîyê hil dibe, ji wî re xuya bû ku ev kêlik a herî giring e taku zor kûr li kûrahîya xwe û li têkeliya xwe bi wê keça xwendevan re venêre, ew keça ku ji gund û deşta berfireh hatiye bajêr û di nava alozî û têvilîya kendekorê wî yê civakî û aborî de tevdigere. Çi bi te hatiye, min ji wî re got. Pirsê min wî nelivand, wê gavê ez bi gemjebûnê hest bûm ku min ev pirsê beloq li ser rewşa wî raxist. Ez têgihîştim ku divabû ez tişteki dîtir dûtir axavtina rasterastî zuha bibêjim, lê dixuya ku ew gelekî westîyayî bû, serê xwe xist nav herdu destên xwe piştî ku axînek kûr rahêla, û got: Ez hest dibim ku serê min zor li ser laşê min giran e. Hest dibim weku ez ne ez im, ne ew kesê ku bawerîya xwe bi hemî xelkên biyanî, dost, heval û meriv, dianî.. Tara hestek bi min re çêkir weku ez bi xwe re xayin im.

Min hewl da ku evî hestê êşdar li ser wî sivik bikim, bêguman ev hestekî zor tunde gava yek birame ku xwe bi xwe re xayin dibîne, ji vê hevokê ji min re xuya bû ku giyanê Ferhad û Tara di laşekî de bi hevûdû ve bûye yek perçe, anku ew herdu gihiştine bilindahîya evînîyê, xweyîtiya xwe di xweyîtiya wê de dipelîne, bi kêmanî ji hêlekê tenê ve. Û heger ne wisa be, gelo çima ev hevok "ez xayinê xweyîtiya xwe me" bi lêv kir, divabû gotinek dîtir derbarê vê rewşê bibêje ku bi têkilîya hevaltîyê re ya di navbera wan de guncaw be, nehîşwerî nemaze di bin zext û westîyan û westandinê de tiştê di buxçika dernûnîya mirov de eşkere dike. Û tev wilo jî min ew hest pê neda xuyakirin ku tiştê gotî metirsîbû, û min ji wî re negot ku li wir razek di hundirê te de heye kesek pê nizane ji bilî te pê ve, lê min ji wî re got: ez bawer im ku te giringîyek mezin da ye babetê, rast e em di çaxa alozî û şikestina de jiyana dikin, lê her çiqasî pirsgirêk mezin be jî, ne hoşwere ku ta vê radeyê hebûna te têk bibe. Lê bêyî ku birame got:

Ma tu bawer dike ku ez mirovekî arzan im.

Na, na dosto ez ne wisa qesd dikim, lê her pirsgirêkek çareyek jê re heye, û em dikarin bêhtir bi axivin.

Tiştê heye ku min Tara vexwendî ser şîvê kir. Û pirsgirêk çî ye?

Pirsgirêk ku min ew vexwend mala xwe û ne li cihekî dîtir, lê ewê bi tûjbûn ret kir û ji min re got: Hûn mêr hemî yek in, herîya we qirêj e, ma tu çawa min dibînî.. tekez wek her keçekê.. ez ji te diqehirim.. ji te diqehirim.. dûv re Têlêfon di rûyê min de girt.

Piştî ku Ferhad axavtina xwe bi dawî kir, bêdengîyê êrîşî maseya me kir. Em bi hesanî radestî wê bûn, lê ev mirovê ku ji bêdengî û ezeziyê heznedikir, bû weku bêdengî di xweyîtiya wî de rojbûnek nuh rengê pûtên

xwedawendên li perestgehan anku kevirên li ser rêyan afirandibe, bi pirîskên agirê nîgeranîya di hundirê xwe de dişewitî wek ew darên li daristanên berfireh yên zer û qehwerengî, ma ew dar çiqasî bi ecêbin dema rok agirê bêdengîya xwe ya veşartî di wan de vêdixê, û ma ji Ferhad xemgîntir heye di vê kêlîka narvînîya nediyar de, li xwe dinêre ku her tiştên di nava pênc salan de ava kiriye ji evîna rast û durist û hevaltîya bêhempa tev bû kavi û guneh bi ser wî de hildiweşin, ne ev tenê lê belê xweyîyeke, ba gendijinadina wê li vê cîhanê tevî dadiweşîne.

Ferhad hewl dide ku ji nû ve şiyana xwe bi serhev de, ku bi nerîneke hişmendî li helwestê venêre "vexwendina ser şîvê, vexwendina li malê" yaku kîn û şermîyek bê hûde li bal hevala wî di derbarê wî de lidar xist, lê bê mifa, jixwe hemî tişt tevlihev bûbûn, hewl dide ku xwe bi wê ve bigihîne lê ew çî derfetê nade wî, çî gava têlêfona wê lêdide û nimra wî dibîne di cih de bê dudilî digire. Ew bû, ew keça hizir dikir ku Ferhad hevalekî wek wî nîne di vê çaxa ku hevaltî tede bêwate bûye, ku her tişt bi lez tê guhertin, tê xuyakirin ku hevaltî bi xwe jî di nava van guhertinên zor de nixê xwe winda kiriye.

Ez ne wilo me, tu baş min nas dikî, Ferhad bi dengekî xeniqî got.

Ez zanim, lê vexwendina te ji wê re li malê karekî hovane bi xwe ye.

Na.. ne wek ku tu jî guman dikî, çima tu nabêjî ku ta radeyekê karekî wêrekî ye.. Ma ne rojane ez û Tara pêrgî hev dibûn. Min bi destê wê digirt û em di kolanan re dibûrîn, dema em li gulistanê rûdiniştin û li ber çavên xelkê serê xwe datanî ser sînga min û êş û gandinên xwe bi min dikir, ew hevala ku tev hemî razên xwe xweradestî min kiribû, kêlîkên herî xweş di jiyana xwe de diyarî min kir, rojên xwe yên bêdeng û yên bi xirecir, tevgerên xwe, berhevoka gîrnijînên xwe, wêneyên xwe, helbestên xwe, hemî tiştên ku hiştin jiyana min bi wê re xweş û hesan bike.

Di heman gavê de tu bi şadîbûnê hest dibûyî bêyî ku tu zanibî ji çi deverê têyî..? erê dostê min jiberku em bi nixê tiştê hest dibin tenê dema em wî tiştî wenda dikin.

Ma bextwarî çi ye, bi nerîna te?

Bextwarî biryarek e, ew kêlîka ku behreyê dide te ku tu di derbarê helwestekê de biryarek durist bistînî, bextwarî ew hezkirin bi xwe ye, ew hezkirina ku di her tiştî de tu pê hest dibî, ger ew tişt qeşeng be anku kirêt be. Heger em bixwazin bêhtir şadîbûnê nas bikin, ji xwe ew di nava her tiştên li hawîr me de ye, wisa heger em di çêja hebûnê ya di resenîya tiştan de bigihêjin, û ev bi xwe jî ne bese, lê têxwestin ku çawa em wê bikarbînin, ev tê wateyê ku ew bi hewcedarîya behreya şîyanê ye.

Min hewl da ku di rêya vê pirsê Ferhad li ber min raxist sedemê baş bibînin ku xwe berdim kûrahîya wî, wisa ku ez di rêya gelek pirsan re mejîyê wî hinekî tev rakim, lê bê mifa, herku min pirsek ji wî dikir, bi çavî bîdeng li min dinêrî weku li hêvîya min dima ku ez bi xwe bersivê bidim, tenê serê xwe bi gotina erê her carê dihejand bêyî ku tiştê lê zêde bike.

Piştî bîdengîyek dirêj, Ferhad hewl da ku vexwendina xwe ji nû ve bi rêkûpêk bike, lê vê carê vexwendina xwe bi zîmanekî felsefeyî nû kir, bi kêmanî yek derbarê wê dikare bibêje ku vexwendineke mînakî ye bi ramanên hestwerî hatiye stiran, dema got: Heger şadîbûn di her tiştî de ye, ev tê wateyê ku şadîbûn di malê jî de ye, vexwendina min ji wê re li malê, anku vexwendina min ji wê re ji bo şadîbûnê ye. Û madem hevaltî û hezkirin du hevalcêwîyên ku ji hev venabin, jixwe şadîbûn encama van herdu pilebilinda ne, her çiqasî li wir hezkirin hebe wisa li wir bextwarî jî heye, û ev yek wisa bi temamî li ser hevaltîyê jî bi kar tê di heman gavê de li ser her tiştî çê dibe.

Lê tev van tiştên heyî mirov nikare bi ew cêja rasteqîn hest bibe, heger mirov ne serbest û azad be, di wê kêlîka ku min Tara vexwendî li mala xwe kir, ez ta dawî serbest bûm û di heman wê kêlîkê de ez di xweşîya azadîyê bi xwe de dijiyam, û ez bi poşmanîyê hest nabim heger ez a dilê xwe bibêjim ku ez di vexwendina xwe de ji wê re gelekî wêrek bûm, jixwe ku di dana birayrê de şadîbûn heye, ev tê wateyê ku di kêlîka wêrekîyê bi xwe de jî bextwarî heye. Lê heger tu dibînî ku vexwendina min ji wê re li malê hovîtîye, vêca dikarim bibêjim ku hemî hovîtî bi rengê jî rengan xweşîbûnin, vêca hovîtî bi xwe jî şadîbûne, lê bi rengê dîtir ne wek ku di serê gelek kesan de digere.

Lê ya giring ji van hemî tiştên ku me anîn zîman, nuha bi temamî ez têgihîştim û weku berê jî min xwe nas dikir ku ez di her kêlîkê de ji jiyana xwe bi xwe re bi yê dîtir re rastgo me. Û nuha min nas kir ku retkirina Tara ji vexwendina min re, hewldanek bû ku bala min ber bi xwe ve bikişîne ku ew ne ew xweşîya germ e yaku mirov li nava dîwaran wê bi dest xwe bixîne, tevku ez bi xwe bi yekcar û ne rojekê ji rojan bi vî rengî di wê de hizir nebûme, anku min ji quncikên xweşîyan tenê li wê nenêrîye, ji ber ku ewê xweşîya rastî û ronîyê di bin baskê bayê serbest de di her pêrgîbûnek me de bi min re parve dikir, lê ez dixwazim hestê xwe ji te re eşkere bikim ku retkirina wê ji vexwendina min re, ji nû ve hestê min arihand ku ez xweşik babetê bixwînim bi kêmanî ji alîyê dilsozî ve û hewl bidim tiştên ku di kûrahîya wê de cihgirtîye nas bikim.

Ma ev ji we re xuya nake ku ev xort mirovekî biyan û bê serûber e, ma gelo pênc sal ne bes bûn ji wî re ku hastên wê yê rasteqîn derbarê xwe nas bike..? ji wê axavtina wî, ji min re xuya bû ku ew ne bi hişê xwe ye, weku ew di têkilîya xwe de ya bi Tara re di guhê gayî de razayî bû.

Tenê nuha li tiştên rasteqîn yên ku di gêdûgên giyanê wê de cih girtine hişyar bû, nuha ez bi tena xwe ji nêzîk ve li wî guhdar dikim, çi dibihîzim, jixwe weku şirûveyên min yên berê derbarê hevoka bi "xweyîtiya xwe re xayinim". Lê bê mifa ye, çiku hemî tiştên li hawîr me û wisa ta xwediyê qehwexaneyê jî xewê zora wan biriye, ez bawer dikim ku di vê dema dereng de Tara jî di xew de ye, çiku ewê biryar da ku ji jiyana wî bar bike piştî ku ghişt baweriyekê ku ew tenê mîna darekê ye, Ferhad xwe li ber siya wê sihek bê navûnîşan radixîne, taku ji xwe re rêyek din bigire, rêyek ku nêzîkî jînweriyê be, li gorî têgihîştina civaka me be, bi wateyek dîtir ku ew jî wek hemî keçên li hawîr xwe jiyan bike, ku hema derfet di jiyanê de ji wê re were zû bi dest xwe bixîne, bêyî gelekî xwe mijûl bike biryara razîbûna xwe bide derbarê yekem xort ku were li deriyê dilê wê bide anku li deriyê mala bavê wê bide. Jixwe ewê wisa kir piştî deh roj derbasbûn di ser vexwendina wê re ya li malê, jiber ku bi rastî ew ji jiyanê tengijî, ji rexnên dêya xwe derbarê rewşa xwe bêzar bû, rast e ew bi serbestiyê di têkilîya xwe de bi Ferhad re hest dibû, û ewê berxwedan û rikberîya awirên xelkê dikir, lê vê dawiyê têgihîşt ku dê darek bê ber bimîne, ewê bijî û mezin bibe bêyî ku ber bide.

Ma gelo derbarê têkilîyên hevaltîyê yek li hêvîya armancan dimîne? ma ne hevaltî di cewhera xwe de nirxekî bilind bi xwe ye, bila armanca me hevaltî bi xwe be dûrî mebestî û berjewendîyan, gelo çi seyrbûn di vê yekê heye, jixwe em mirov in, em hevqas komek ji dilsozîyê ne, vêca hevaltî dibe ku bê veguheztin û bibe têkilîyeke evînî, ne wisa..?. Ferhad wisa got dema ku em ji qehwexaneyê derketin.

Xuya ye hinek ji têlepatîyê di navbera ramanên Ferhad û Tara de peyda dibe, lê xuya ye ev têlepatîya derûnî bi xwe dereng hat, jixwe şev pîrr dereng bû ye, kesek li kolanê nema ye, ta kûçik bi xwe di xewnên kûr de ne.

Hat xuyanê kirin ku Ferhad gelekî dereng ket, dereng ket ku mija tevlihevîyê ji ser dil û giyanê xwe rake, bê sedem gelekî di bédengîya xwe de ma, qet bawer nedikir ku dê Tara wisa bi lez û bez biryara koçbûnê bide, û destên wê koçberî destên yekî dîtir bibin, henaseyên wê tevî henaseyên yekî dîtir bibin, di dema ku ewî li dawîya wê şeva derengî de biryara xwe da ku her tiştî bi dawî bike, dê deynekî ji Banka Darayî ya Gelêrî bikişîne daku karibe bi renekî fermî destên wê bixwaze, ewî rastîya hastên ku di hinavê kûrahîya xwe de cih girtine vê dawiyê kişif kir, lê pîrr dereng bû.





MAMO KADER

Di Navbera 2 Metreyan
û Valahiyê de

Hestî bi dirêjkanî
hawarên lêş bi axê ve didirûn.
Ni'hîtên ramediyayî
kirrîn û froştina bêhnê biçikînin.
Kevirê sêrî
seriyê hertiştî dibirre û yê mêjyekî jî.
Hestî kedî bûn.
Xunav nema pejalan didoşe.
Nema dem têmen hêvan dike.
Tenê ruh
asîmên qulaj dike, nefesa Xwedê dipêve,
di navbera planetan de, azad, azad dide
lotikan.
Dema diweste,
Stêran ji xwe re dike palgeh,
û qîtan bi ava erdê de ber dide.



RÛMET MED

Di navbera salên 1932-43an de, deh salan di gelek filmên komediyê de û bi giştî ji sala 1917ê heta 1974ê ji zêdetirî 140 fîlman weke lîstikvan cih girtine. De Sica derhêneriya ji zêdetirî 30 fîlman kirine. “Rose scarlette” (1939) yekem film e ku ji aliyê Vittorio De Sicayî ve hatiye kişandin. Piştî vî filmê derhêner hin filmên civakî û rexneyî birêvebirin ku tê de li ser jiyana zarok û karakterên ciwan ên marjînal sekinî. Yek ji mînakên vê demê “I bambini ci guardano” (1942) ye û ev film ji hêla realîstîkê gelek girîng e ku De Sicayî li dû vî filmê, piraniya projeyên filmên xwe digel senarîst Cesare Zavattini re çêkirine.

Derhêner Vittorio De Sicayî di filmên xwe yên vê demê de qala xizaniya mirovan a ku piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn (1946-1950) derketibû holê kir û bi filmên wî li seranserê cîhanê deng vedan. Sicayî wekî derhênerên Rossellini û Visconti yek ji nûnerên herî serketî yên rêbaza Nerorealîzmê ye. Sînemager di vî filmên xwe de li ser mijarên çînî û xizanyên rojane ya mirovan sekinîne.

Fîlmê wî yê bi navê “Sciuscia” ku di sala 1946ê de hatibû kişandin, behsa jiyana du boyaxvanên Romyayî dike. Derhênerê navdar Vittorio De Sicayî dû vî filmê, di 1948ê de filmê xwe yê klasîkê sînemayê “Ladri Di Biciclette” dikêşîne ku ev film yek ji mînakên baştirîn ên Rastîbîniya Nû ye kû bandoreke mezin li hunera heftemînê kiriye. Di filmê de Antonio Ricci bêkar e, rojek bi xwe karekî peyda dike û ji bo vî karê duçerxeyeke/bisîklet dikire. Ev duçerxeya wî di karê çêkirina seywanê/afîş de ji aliyê kesek nenas ve tê dizîn. Piştî vê buyerê bi zarokê xwe yê 10 salî ye, kolan bi kolan duçerxeya xwe digerin. Fîlmê “Ladri Di Biciclette” li bernameya gelek Xelatên Fîlman ên wekî BAFTA, Rûmeta Akademî, Gilovera Zêrîn û Bodilê di gelek beşan de xelat wergirtin. Fîlm bi giştî bi lîstikvanên amator ve li taxên bajarê Romanyê hatiye kişandin û atmosfera rastîn a jiyana diguhêze li sînemayê.

Pêşengê Sînemaya Rêbaza Rastîbîniya Nû; Vittorio De Sica

Dema ku behsa sînemagerê mezin Vittorio De Sicayî tê kirin, filmê klasîk ê bi navê “Ladri Di Biciclette” tê bîra mirov ku ev film li ser jiyana zarokê û bavê wî ye û bandoreke mezin li hunera sînemayê kiriye.

Derhêner û lîstikvanê navdar ê Îtalyayê Vittorio De Sica bi gelek filmên xwe yên ku di navbera dawiya salên 40 û destpêka 50an de hatine kişandin, tê naskirin û li gor rexnegir û derdorên sînemayê yek ji pêşengên sînemaya rêbaza Rastîbîniya Nû tê qebûl kirin.

Vittorio De Sica li bajarê Sora ya Îtalyayê hatiye dinyayê û hêj 16 saî bû dest bi sînemayê kiriye.

De Sicayî di sala 1951ê de bi filmê yê nû yê “Miracolo a Milano” re derdikeve li pêşberî temaşevanên sînemayê ku tê de hêmanên çîrokî û vegotina civakî ya nûjen cih digirin. Piştî salekê jî filmê wî yê bi navê “Umberto D”yê tê û ev film ji hêlên rexnekirina civakî û estetîkê balkêş e.

Piştî salê 1953yê ji bo derhêner Vittorio De Sicayî heyameke cuda dest pê kiriye û lê filmên wî yên berê car caran bandorê li filmên wî yên nû dikin. Filmên vê heyamê; “Stazione Termini”(1953), “L'oro di Napoli” (1954), “Il tetto” (1956) ne.

Derhêner, piştî salên 50an êdî ji bo çêkerên filman ên Amerîkayê filman kişandin. Di despêka salên 60an de du filmên wî yên “Il Guidizo Universale” (1961), “I sequestrati di Altona” (1962), gelek têne ecibandin ku mijara filmê “I sequestrati di Altona”yê ji romana wêjekar û nivîskarê navdar ê Frensayê Jean-Paul Sartreyî ji bo perdeya spî lê hatibû anîn.

Sînemagerê biserketî Vittorio De Sicayî di sala 1974ê de filmê xwe yê dawîn ê “Il vaggio”ê kişandiye ku di nav filmê de lîstikvanên navdar ên Sophia Loren û Richard Burton dilîzin. Ev fîlm qala çîroka du evîndarên ku ji ber rewşa civakê nikarin bigihîjin hev, dike. Derhêner û lîstikvanê mezin Vittorio De Sicayî di sala 1974ê de li Parîsê çûye dilovaniya xwe.

Fîlmên wî li dîroka sînemayê bûne klasîk û gelek fîlmên wî li Festîvala Fîlman a Navneteweyî ya Berlînê û li Xelatên Fîlman ên Akademiyê (Oscar), Gilovera Zêrîn, BAFTA, David di Donatello, Bodil û Jussiyê xelat girtine.

Fîlmên din ên derhêner Vittorio De Sicayî : “Maddelena... zero in condotta” (1940), “Teresa Venderni” (1941), “Un garibaldino al convento” (1942), “I bambini ci guardano” (1943), “La porta del cielo” (1944), “Coure” (1948), “Anna di Brooklyn” (1958), “La ciociara” (1960), “Boccaccio '70” (episodio La riffa, 1962), “Il boom” (1963), “Ieri, oggi, domani” (1963), “Matrimonio all'italiana” (1964), “Un mondo nuovo” (1966), “Caccia alla volpe” (1966), “Le streghe” (1967), “Sette volte donna” (1967), “Amanti” (1968), “I girasoli” (1970), “Il giardino dei Finzi Contini” (1970), “Le coppie” (episodio Il leone, 1970), “Lo chiameremo Andrea” (1972), “Una breve vacanza” (1973).

Çavkanî:

<https://www.imdb.com/name/nm0001120/>

https://tr.wikipedia.org/wiki/Vittorio_De_Sica

https://en.wikipedia.org/wiki/Vittorio_De_Sica

“Yüzyılın 100 Sinema Yönetmeni.” (Rûpel: 46, 47).

Nivîskar: Jasper Kaldewey, Anke Stahl, Michael Venhoff, Michael Wengemann. Wergêr: Aysu Erinç û Ethem Erinç. Afa Yayınları. (1999)

(28.06.2021)



Ehmedê Goyî

Kî hat kî çû? Derd ma dil de,
Ceger li wan bîbû xwîn.
Daxwaz ma dilê bilbil de,
Cegerpel dûr ket ji dîn.

Dîn û îman tew Welat e,
Li himber dijmin bi kîn.
Yekitî j'bo me xelat e,
Mizgînî! Ka Cegerxwîn!!

Mele Şêxmûsê Hesarî,
Rabe ser xwe dil bi şad.
Şahîya me ya hevkarî,
sergovend e Mem û Zîn

Xwîna j'cegerên te hatî,
Bêxe pêna Usa bi vîn.
Neqş bike helbest dilşadî,
De mezin bibe civîn.



MUQADES AGIRÎ

STÊRKA HELBESTAN MESTÛRE ERDELAN

Di gelek civakan de, di gelek qadên jiyane yên zanistî de, her çiqasî pêşî li ber pêşketina jinê hatibe girtin jî, dîrok nîşanî me dide ku, jin ku xwedî derfet bin çiqas hûnerên bedew derdixin holê.


Wekî her qadên zanistî, di wêjeyê de jî jin, bi pênuşa xwe, wekî deryayekî diherikin li ser rûpelan. Meriv dikare bibêje ku jin, hestên xwe yên kûr û hestên xwe yên nazenîn dikin yek û hûnerên nemir li pey xwe dihêlin.

Yek ji van jinên jêhatî, serketî û bi bandor Mestûre Erdelan e ku, hem dîroknas, hem jî helbestvaneke gewre ye ku, di nav Edebiyata Klasîk a Kurdî de cihê xwe girtiye.

Mestûre Erdelan (1805-1847)

Mah Şeref Xanima Kurdistanî ango Mestûre Erdelan, helbestvan, nivîskar û dîroknasa Kurd e.

Di sala 1805an (li gor hin lêkolîneran di sala 1804an) de li bajarê Sine jidayik bûye. Bavê wê Ebûl Hesên Beg ji malbata Qadirî bû. Malbata Qadirî li mîrgeha Erdelanê



malbatek xuyanî û ronakbîr bû ku, bi huner, zanist û dîrokê ve eleqedar dibûn. Bapîrê wê rêveberê xezîne (darayî) yê mîrektiya Erdelanê bû.

Dêya wê ji malbata wezîrên bajarê Sine'yê bû. Ango Mestûre Xanim ji malbateke desthilatdar bû.

Mestûre Erdelan, zimanê Kurdî, Farsî û Erebi ligel bavê xwe Ebu El Hesên Begê Qadirî dielime.

Hê di zarokatiya xwe de, eleqeya wê ya ji bo xwendin û nivîsandinê hebû. Piştî ku digihîje temenê salên

perwerdehiyê bi piştgiriya bavê xwe, dest bi xwendinê dike. Lewra di wê serdemê de xwendin ji bo jinan ne tiştêkî hêsan bû û ne jî pêwîst bû.

Lê ji ber bavê wê mirovekî zane bû keça xwe dide xwendin.

Mestûre, di pêvajoya jiyana xwe ya perwerde de pir zîrek bû. Zimanên Farsî û Erebi jî gelek baş dizanibû.

HELBESTÊN XWE BI ZIMANÊ KURDÎ Û FARSI NIVÎSANDIYE

Mestûre Xanimê, piraniya helbestên xwe bi zaraveyê Kurdî ya Goranî nivîsandine. Her wiha bi zimanê Farisî û zaraveyê Soranî jî helbestên wê hene.

Tê gotin ku gelek helbestên xwe jî, bi zaravayê Kurmancî nivîsîne, lê mixabin helbestên wê yên bi zaravayên Kurmancî heya roja me ya îro nehatine.

DI ROJHILATA NAVÎN DE WEKE DÎROKNASA EWIL A JIN TÊ ZANÎN

Mah Şeref Xanim, helbestvaneke gelek baş û dîroknaseke navdar bû.

Ew di Rojhilata Navîn de weke dîroknasa ewil a jin tê zanîn.

Bi taybetmendiyên xwe, bala zanyarên biyanî jî dikişîne.

Ji ber kesayeta xwe ya zana, gelek helbestvan û nivîskaran di berhemên xwe de qala wê jina bi nav û deng kirine. Ew ji hêla helbestvanên navdar ên mîna Mewlewî ve hate hezkirin û pesnê wê hat dayîn. Nav û berhemên Mestûre Xanimê di nav Edebiyata Kurdî ya Klasîk de cih digire. Her wiha gelek nivîskar û helbestvan ji vê jina zana, îlham girtine.

BERHEMÊN MESTÛRE ERDELAN

Baweriya îslamê û Rîsaleya 'Îbadetê. (Bi Farsî) Dîwan (Dîwan-î Masturah Kurdistanî) – Farsî û Kurdî

Mêjûy Erdelan (Khronika Doma Ardan: Ta'rih-i Ardan/ Dîroka Erdelanê bi zimanê Farsî hatiye nivîsîn.

Dîwana helbestên wê, "Dîwanî Mah Şeref Xanima Kurdistanî" cara yekem ji aliyê Hecî Şêx Yehya Marifetiyê Kurdistanî, berpîrsê dîwana Mearifa Kurdistanê ya wê demê, sala 1925an li Tehranê hatiye weşandinê, nêzîkî du hezar malikên helbestan hildigire.

Mestûre Erdelan, digel helbestvaniyê, wek dîroknivîsekî jî pirtûkek bi navê "Dîroka Erdelan" jî nivîsiye. Ev berhem di sala 1946an de li Sine ji aliyê zanyarê Kurd, Nasir Xanê Azadpûr ve bi farisî hatiye amadekirin û weşandin.

Her wiha Hejar Mukriyanî, xebat wergerandiye ser Kurdiya Soranî. Lê ew bi xebata Mah Şeref Xanimê tenê nemaye, hin xebatên li ser Mîrektiya Erdelanê jî kiriye nav vê xebatê.

Pirtûka Mestûreyê ya bi navê "Dîroka Erdelan" li Moskowayê di sala 1990'an de bi zimanê Rusî tê çap kirin.

Mah Şeref Xanimê, her wiha pirtûkek olî jî, amade kiriye di derbarê "Şerîeta îslamê" de. Pirtûkên wê nîşaneyê lêhûrbûn û lêkûrbûna wê ya di derbarê ol û dîrokê de dide nîşandan. Wê bi xwe "12 ilm qedandiyê". Pirtûkê olî bi zimanê Erebi xwendiyê.

Li gorî hin çavkaniyan dîwana helbestên Mestûre ji 20 hezar beytî pêk tên.

Lê belê, dîwana wê ya helbestan, ji ber jiyana wê ya koçberî, zehmetî û qeyranên nav mîrektiya Erdelan winda bûye.

Hevjînê Mestûre Erdelan Xesrew Xanê Erdelan, dadgerê wê derê bûye û bi mirina wî re mîrtiya Erdelan dikeve destê Qaçar an. Bi êrîşên serweriya Qaçaran ên di sedsala 19.an de ya bi ser mîrtiya Erdelan, Mestûre tevî malbata xwe neçar dimînin ku, koçî Silêmanî bikin û ligel mîrtiya Baban bi cih dibin. Tê gotin ku Mestûre Erdelan, di vê pêvajoya koçkirinê de gelek zehmetiyan re rûberû dimîne. Lawê wê Riza Qolî Xan ku xelefê bavê xwe Xesrew Xanê Erdelanê bû, tê girtin û wî davêjin zindanê. Mestûre di pirtûka xwe de, wiha qala jiyana xwe dike: "Ez a bêqîmet û hejar ya navê wê Mestûre -ku ez keça Ewlesen Begê û neviya Xwedê jê razî Heme Axayê Kurdistanî me- ji ber ku bavê min gelek hez ji xwendinê dikir û ez jî keça wî ya yekê bûm, gelek hez ji min kir, ez dam xwendinê. Min gelek xwe dabû kitêban, hemî cûre kitêb dixwendin, di nav wan de min gelek ji dîrokê hez dikir."

MIJAR Û ŞÊWAZA HELBESTÊN WÊ

Mah Şeref Xanim, di nivîsên xwe de zimanê sade bikartîne. Meriv di rêzikên helbestên wê de dewlemendiyeke bêhempa dibîne.

Îro, mîna saqî! ji çîmenan re demsal payîz e
Meyê bide, nefikire bê meh remezan e
Li şîretên şêxî nefikire û ji dest re,
Ne çerxiyek û du û sê, ev fitwa min ji pîrê magan e

Wekî mijar ji dema ku tê de ye bi gazince. Di helbestên xwe de, qala hesretiya bajarê xwe Sine'yê dike.

*Çima ev çerxa felekê, zulmê dîke ew gelekê
Dilê mine nazik xweşik, kun kirî wek elekê*

*Çavê min kir kanîya xûnê, poşman kirim ji hebûnê
Gelo çima min çî kirî, dîlkê mi bû wek êtûnê*

*Herdem ji çavên min dizê, sed çem û sed sîrwan
û zê*

Ew derdê min dîtî bibêj, ka kê dîtîye kû û kê?

Jiyana xwe û kevneşopiya gelê xwe, bi awayekî vekirî di misrayên xwe de rêz dike.

Mah Şeref Xanim, bi girêdayiyê gelê xwe û axa xwe bûye.

Yek ji mijarên helbestên wê jî evîn e. Tê gotin ku, bi hevjinê xwe Xesrew Xan re gelek bextewar bûye. Zewaceke dilşad derbas kirine. Meriv di van rêzikên helbestên wê de vê hezkirina wan dibîne.

*Ji bilî ser têkiliya wî min awir tune ye
ji xwe ji bilî wî min fikir tune ye
her çiqas henaseya min ne li bîra min be, ji wî û min*

*Ji bilî henaseya sar min bîranîn tune ye
bextewar im li ber dûrbûna ji bejna wî ya bedew
Ji bilî xema wî qet min xemgîn tune ye*

Mestûre di vê helbesta xwe da, di derbarê jiyana û serpêhatiyên pêxember, ewliya û îmamên wekî Yehya, Îsa, Mûsa, Meryem, Yûsif, Yaqûb, Eyûb, Yehûda, Salih, Muhemed, Elî û şerê Kerbelayê û êxsîrbûna binemala Hesên û Huseyîn, jehrîdana Îmam Riza û gelek bûyer û serpêhatîyan dinivîsîne.

*Yan min kirî zulmên di zor li zarokên pêxemberî
Min berda gewriya wan kuran ew camika pir zeherî*

*Min kuşt gelo zarên 'Elî, îşkad ji Zehrayê mi dil
Min kir serî hola serî, min kir dilê Ehmed bi kul*

*Ma min kot û zincîr kirî, di gerdena Secadî da
Yan newgulên mala nebî, bêtore min ber badî da*

*Min canikên peyxemberî, aware çolan da gerand
Xewa şevan jî min gelo ji çavê sêwiyan herimand*

*Gelo min jehrdayî kirî, lawên nebî min kuştine
Yan kuştina wan sêwiyan tawan û hem sûcê min e*

Mestûre Erdelan, di sala 1847'an (ku li gelek cihan de jî 1848 derbas dibe) li Silêmaniyê di 44 saliya xwe de jiyana xwe ji dest dide.



Ezîzê Gerdenzerî

ÇIL ROMANÊN KURDÎ

Van paşwextiyan kete li ber destê min pirtûka nivîskar, lêkolîner û xizmetkarê edebiyeta kurdî, Lokman Polat ya bi navê "Çil romanên kurdî". Pirtûk 191 rûpel e. Ew ji aliyê weşanxana Sîtavê de û bi dîzaîneke bêqisûr, hatiye çap kirin. Ev pirtûk ya danasîn, nirxandin û şirovekirina çil romanên kurdî ye.

Bi gotina nivîskar sêsedî zêdetir romanên kurdî hene. Lê bi nêrîna nivîskar, gava meriv bi çavekî rexnegerî bala xwe dide wan berheman, kîjanan ji aliyê nivîskarên wan de wek roman hatine destnîşan kirin, bi dest xwe de tê xuyakirin, ku gelek ji wan çîrokên dirêj in û vegotinên tevlihev in, hinek ji wan jî novêl yan kurteroman in. Bi nêrîna me, dibe ku sedem jî ev e, ku hinek nivîskarên kurd dibêjin, ku romana kurdî tune. Lokman Polat 140 romanên kurdî xwendiyê û nirxandiyê. Wî sê pirtûk: "Bîst romanên kurdî", "Pêncî romanên kurdî", "Çil romanên kurdî" daye weşandin û niha ew bi navê sî romanên kurdî pirtûkeke din dinivîse. Nivîskar wisa jî pirtûkek bi navê "Romanên Nivîskarên Kokkurd" amade kiriye.

Em ê niha behsa pirtûka nivîskar ya bi navê "Çil romanên kurdî" bikin. Pirtûk bi zaravê kurmancî hatiye nivîsar, zimanê nivîsarê ne giran e, zela e û bi hêsanî tê xwendinê.



Nivîskar, bi kurtayî şirovedike naveroka her romanekê, her romanekê dinirxîne, dîtin û nêrînên xwe derbarê her romanekê de dinivîse. Ramana ewlin ya li vê pirtûkê de behsa wê tê kirin, romana Haciyê Cindî "Hewerî" ye. Lêkolîner bi awayîkî şêkirdariyê behsa ked û emekê nivîskarê navdar yê ji Ermenistanê, bavê folkilora kurdî, mamosta, profêso Hacıyê Cindî dike û qîmetekî bilind dide romana wî. Lêkolîner dinivîse, ku bi dehan pirtûkên wî nivîskarê bi nav û deng yê ji bo çapê amedekirî hene û hêviyê ne, ku weşanxanên kurdî dest bavêjin wan û çap bikin. Li vê pirtûkê de wisa jî behsa romanên sê nivîskarên din yê ji Ermeanistanê tê kirinê: Eskerê Boyîk "Xezeb", Eliyê Evdilrehman "Şer li Çîya" ("Şêx Zayîr"), Tosinê Reşîd "Mestûre".

Di çar romanên kurdî de, yê li vê pirtûkê de hatine çap kirin, behsa Komkujîya Ermenîyan ya Mezin (1915 - 1923) tê kirin: Hesênê Metê "Gotinên Gunehkar", Dewran Evdîrehîm "Reşeba", Mehmet Devîren "Kortika filehan".

Lehengê Roman Hesenê Metê ermenî ye, navê wî Merkûs(Markos) e. Markos li ber çavên xwe dibîne, ku bi çî awayî eskerên Roma Reş yê noli keftarên xwînxwar, dadikutine li nava gundê wan. Hevala dayîka Markos, Domîna xanim, kîjan keça mîrekî kurdan bûye, wî li mala xwe de vedişêre. Bi vî awayî ew ji xezeba Roma Reş, ji kuştinê xelas dibe. Eskerên Roma Reş bi hovanê zarok, zilaman, kalemêr û pîrejînên ermeniyên dikujin, keç û jinên wan yê bedew dikine hundirê dêrê, dest davêjin namûsa wan, paşê wek hêsîr li tev xwe dibin... Kurteromana Mehmet Devîren "Kortika filehan" awa destpê dibe: "Li herderê welêt de binê her şopên kevnar de axînek heye, êşek veşartî ye. Ev şop dilop bi dilop bi xwîne hatiye avdan. Ev şop berê me dide gundekî bi êş û elem. Di binê kevirê de jiyaneke veşartî heye. Sop berê me dide nava gund(gundeki girêdayê Dêrika Çiyayê Mazî) û deriyê hewşekê ji me re vedike..."

Gund, gundê fileha(xaçparêzan) bûye, li ku xêncî ermenî, aşûrî û keldaniyan wisa jî êzîdî dijîtin. Hewşê de keç û bûkên gund li ser tevnên kom bibûn û kulama "Lawikê Metîn" digotin. Axayê wî gundî wisa jî sêzdeh gundên doranê wê kurd bû, navê wî Evdilkerîm. Rojê jî fermandarê dewleta Roma Reş tê gund û Evdilkerîm re dibêje, ku dewletê ferman derxistiye, kuştina filehan helale, kî wan bikuje diçe cinetê. Leşkerê dewletê bi axa û xulamên wî ve êrîşî xaçparêzan wisa jî êzîdiyan dikin. Ewan keç û bûkên xweşik nakujin, lê wekî din ji zarokên zikên dayîkan de heta kalemêr û pîrejînên li nav cînivînan de dikujin. Gund dişewitînin. Keç û bûkan direvînin, dibin. Nivîskar dibêje: "Qetlîama ermeniyên û filehên din (keldanî û êzîdiyên kurd jî tê de) trajedî bû, jenosîd bû ji aliyê dewletê ve û bi destê leşkerên

dewleta osmaniyên û hinek kurdên hevalbendê dewletê hate kirin.

Babatên romanên kurdî yê behsa wan li vê pirtûkê de tê kirin bi pir cûreyî ne. Gelek roman derheqa 29 serhildanên kurd û kurdistanîyan de ne. Pir romanên nivîskarên kurd yê evîndariyê ne. Nirxên romanên kurdî jî ji hevdu tî cuda kirinê. Hinek roman bi zimanekî qels, bi zimanekî giran hatine nivîsar û çetin tîne xwendin. Hinek nivîskaran navê berhema xwe kirine roman, lê ewan çîrok yan jî serpêhatiyên dirêj in. Pir roman jî kurteroman, novel, romanok in. Kêmasîke romana kurdî jî ew e, ku romanivîsên jin yê kurdî tunene. Pirtûka Zerîfe Demîr "Kela bilind" kurteromana yekem e ya ji aliyê nivîskara kurdî ya jin ve hatiye nivîsar û berhemeke nirxgiran û hêja ye.

Bi dîtina Lokman Polat, wisa jî bi nêrîna me, romana kurdî heye. Lê mixabin, gelek weşanxanên kurdî giraniya xwe didin li ser weşandina romanên erebî, ecemî, tirkî yê xwediyên wan bi esilê xwe de kurd in. Bi vî awayî gelek weşanxanên kurdî ne ku ji bo dewlemend kirina zimanê kurdî kar û xebatê dikin, lê behsa edebiyeta ereb, ecem û tirkan dikin. Gelek nivîskarên esilê xwe da kurd, yê niha li dewletên Ewropî û Rûsiyê de dijîn, ewan berhemên xwe bi zimanê zikmakî nanivîsin. Sedem jî ew e, ku kar û xebata nivîskarên kurd nayê nirxandin, nayê qîmet kirin. Weşanxanên kurdî ne tenê heqê xebata nivîskar nadine wî, lê gerekî nivîskar bi xwe pere bidin weşanxanan, ji bo ku ewan berhemên wî çap bikin.

Lokman Polat xêncî çar pirtûkên lêkolînan derbarê romanên kurdî de, wisa jî 12 roman û kurteroman nivîsiye û daye weşandin. Pirtûka "Çil romanên kurdî" pirtûkeke serketî, nirxgiran û hêja ye. Pîroz be.

ROJBÎN ÖZKAN

Çîrokek ji devê bavê min Melle Muhammed: ARRAF (PISPOR)

Melayên welatê me her yek di berîkên wan (cêvên wan) de bi sedan çîrok û serpêhîfîyên ku divê mirov tomar bike(qeyd bike) û jê sûd werbigre hene.

Bavê min Mela Muhammed jî Xwedê me bide xatirê duayên wî, yek ji van alimên Kurdistanê ye ku di Medreseyan de perwerde dîtiye û ji wê ava teberik wexwarîye.

Gelek caran bavê min ji me re çîrok û serpêhatîyên sûdwer dibêje. Lê mixabin ji ber ku em zêde bi karê dinya derewîn ve xeriqîne, em wan çîrokan tomar nakin. Par zivistanê wan rêjên pandemîyê ên giran de ku taybet kalemêr ji mal dervediketin, em li dora bavê min kom dibûn me digot bila bêhna wî teng nebe. Wî jî ji me re hîn çîrok an serpêhatî vedigot. Yek ji wan çîrokan gelek bala min kişand û min hingê ew nivisand. Niha dixwazim bi destura we ji we re parve bikim.

Demek ji demên berê zilamek bazirgan/tucar di rêwîtiyekê de hêştira/deveya xwe wenda dike. Li çolê li hêştira xwe digere. Pêrgî/rastî sê zilaman tê û ji wan pirsra hêştirê dike. Yek ji wan kesan dibêje:



“Ma gelo hêştira te rehwana e?”

Zilam dibêje:

“Belê hêştir rehwana e.”

Zilamê dî/din dibêje:

“Ma gelo dûvê hêştirê hebû an na?”

Zilam dibêje:

“Nexêr duvê hêştirê tune ye”

Zilamê sêyemin jî dibêje:

“Ma gelo barê hêştirê dims e?”

Zilam şaşmayî dimîne dibêje:

“Belê barê hêştirê e dims e.”

Naxwe/Ew çax hûn diz in. We hêştira min dizîye.”

Her sê zilam xwe didin ber sonda dibêjin nexêr em diz nîn in. Lê bazirgan ji wan bawer nake dibêje hûn ê li gel min werin em ê herin dîwana mîr hûn derdê xwe ji mîr re bêjin.

Her sê mirov ji boy ku bêsucîya/mesûmiyeta xwe bidin dîyar kirin, pêşniyara/teklîfa bazirgan qebûl dikin û diçin dîwana mîr. Zilamê bazirgan hemû bûyerê yek bi yek ji mîr re dibêje.



Mîr ji her sê zilaman rastîya bûyerê/hedîseyê dipirse. Ewna ji mîr re dibêjin:

“Em ne diz in, lêbelê em di rê de pergî rêça hêştirek rehwan hatin. Ajalên/heywanên rehwan rêça wan ji yên dî cuda ye. Her veba di seranserê rê de mêş kom bibûn. Mêş tenê li cihê ku şêranî lê hebe kom dibin. Û di rê de rêx li ser hev kom bibûn. Hêştirên ku duvê wan tunebin rêxê belav dikin.”

Piştî ku mîr guhdaîya zilaman dike; ji bazirgan re dêbêje. Wele ev camêr diz nîn in. Ewna tenê mirovên arraf in. Tu here ji xwe re li hêştira xwe bigere. Mîr her sê zilaman di koşka xwe de dike mêvan. Ji xulamên xwe re dibêje sifreyeke dewlemend amade bikin û qedrê mêvanan baş bizanibin. Dema ku sifre amade dibe mîr li paş derî mêvanên xwe dizîka guhdaî dike.

Yek ji wan dibêje; Ew goştê berxê ye ku bi şîrê se/kûçik mêtîye. Yê dî dibêje; hevîrê nan jinek di nexweşîya heyzê de sitraye. Yek dibêje ev tirîyên ji rezê goristanê ye. Yek jî dibêje; mîrê me pinc e.

Mîr li paş derî gelek hêrs dibe, bangê şîvanê xwe dike, jê dipirse bê ka berx bi se daye mijandin an na?

Şîvan dibêje belê ji ber ku şîrê mihê kêmbû min berx bi se da mijandin. Duv re mîr bangê xidama malê dike jê dipirse bê ka dema hevîr sitra bi heyz bû an na? Xidam dibêje belê. Duv re bangê rezwan dike dipirse ev tirî ji kîjan rezê bû, rezwan dibêje ji rezê nav goristanê ye. Duv re diçe bal dîya xwe jê dipirse dibêje dayê rastîya vê bûyerê çîye? Dîya wî dibêje; kurê min bavê te zarok jê çenedibû. Ez carek bi xûlemek re razam û bi te ducanî/hemle bûm.

Mîr şûrê xwe dikşîne tê bal mêvanan dibêje de îcar bêjin we ji ku ev tişt zanîn?

Mêvan dibêjin; goşt li ser avê diket. Pezên ku bi şîrê se bimêjin goştê wan bi ser avê dikeve. Behna axek giran ji tirî dihat. Tenê rezên ku li gorîstanan li ser goran şîr dibin bêhna wan giran dibe. Ji ber ku hevîr baş nehatibû sitrandinê nan sist bû hingê me zanî jinek bi heyzê. Jinên nav heyzê de bişta wan diêşê û nikarin zêde hevîr bistirên. Bes boy gotina dawî bê deng dimînin ji mîr ditirsin. Mîr hêrs dibe dibêje gotinên xwe biqedînin. Mêvan dibêjin; me zanî tu pinc î, lewre li gor edetên me tenê kesên pînc li gel mêvanên xwe ve li ser sifrê rûnanên û paş derî gudar dikin.

Mîr kisek zêr dide wan û dibêje ji vê deverê dûr bikevin hûn diçin ku biçin, bes bila kes raza/sirra min nehese.



Umîd Demîrhan


KURD Û TEORIYA DEWLETÊ

Pêşek

Bêguman gava gotin tê ser siyasetê, berî her tiştî dewlet tê bîra mirovî. Îcar dewlet çi ye, çawa derketiye holê, pêkhatiyên wê çi ne, erka wê ya sereke çi ye? Kurdên berê çawa bersiv dane van pirsan? Ji bo bersivên van pirsan û çend pirsine dîtir em ê di nava gotinên pêşiyên û teoriyên nûjen de derkevin seyranekê ramanî û ramyarî.

Tarîfa dewletê

Têgiha herî kurt a dewletê ew e ku “saziya desthilatdariya civakekê” ye. Derbarê dewletê de tarîfa ku zêdetir hatiye ecibandin “teoriya sê hêmanî” (mîrov, erdnîgarî û serwerî) ye ku dibêje: “Dewlet serweriya civakeke mirovan a li ser erdnîgariyeke diyarkirî ye.” Kurdan jî parastina hêmanên dewletê bi bîr anîne û windabûna hêmanekê wekî destpêka têkçûnê destnîşan kiriye; lewre wan gotiye “ax û avahî, nav û navdayî”, ango wekî ku ax bi avahiyên geş dibe û bi kêrî jiyane tê, nav jî bi navdariyê tê bihîstin; wisa e gava axa mirovî û avahiyên saziyên wî tunebin navê mirovî ji deftera mişkan jî derdikeve.



Her çiqas pêşiyên kurdan di gotinên xwe de tarîfên wiha nekiribin jî, bi diyarkirina hinek taybetmendiyên dewletê ramanên xwe vegotine. Wekî mînak wan gotiye “dewleta ku ba di bin re here, ne tu dewlet e” û bal kişandiyê ser têkûziya saziya wê û erka wê ya bêqusûriyê. Dîsan wan gotiye “dewleta te hebe, dê êl bi te re be” û bi vê kurtehevokê sûd-ziyana hebûn-tunebûna dewletê nîşan daye. Ji aliyekî din ve pêşiyên bi vê hevokê xwestiye ku bibêjin dewlet ji ber pêwistiyeke û bi pêvajoyeke derketiye holê. Dema ku wan gotiye “dewleta pelegewr; qîz avis, bûk stewr” an jî “dewleta pelegewr e, bi şev sahî ye û bi roj ewr e” wan diyar kiriye ku her çiqas dewlet mezin û xurt be jî, hemû mezinahî û riswatiyên wê veşartî ne.

Heke “teoriya sê hêmanî” ya dewletê hinekî were berfirehkirin, girîngiya “mirov, erdnîgarî û serwerî”yê dê baştir derkeve holê.

Li gorî tekstên pîroz Xwedê mirov ji axê afirandiyê û bi hînkirina navan serweriya wî ya li ser gerdûnê sepaniyê ku hevahanegiyek di navbera tarîfên beşerî û armanca afirandina mirovî ya îlahî de heye. Wisan e, divê ev her sê hêman baş werin şîrovekirin; jixwe pêşiyên kurdan jî li ser mirovê çê-neçê, xak û serweriya mirovî gelek tişt gotine: “mirov bê deng nabe, serdar bê zor nabe; mirov bê dost û dijmin nabe; mirov bi bendê xelqê naçe bîrê; mirov bi doma dirêj digihêje mirazan; mirov bi hişê xwe giran û sivik dibe; mirov bi paşatiyê nabe mirov; mirov bi werîsê her kesî xwe bernade bîrê; mirov bi xurtî distîne, lê bi sistî dide; mirov bi zimanê xwe tê giredan; gava mirov bimire, deyn namire; mirov carekê dixape; mirov cîranê dewlemendan be, birçî namîne; mirov çar dîwaran datîne, giliyê wî tê de dimîne...”

Teoriyên derbarê pêkhatina dewletê de

Pênc teoriyên sereke yê derbarê pêkhatina dewletê de hene ku pêşiyên kurdan ji mêj ve bi awayekî nerasterast li ser wan axivîne; lê ji ber ku nehatine senifandin nifşên nû ji wan bêhay in. Ev pênc teorî: teoriya malbatê, teoriya zindînasîyê (biyolojîk), teoriya lihevhatin û hevpeymaniyê, teoriya aborî û teoriya hêz û têkoşînê ne.

1. Teoriya malbatê

Li gorî “teoriya malbatê”, kakilê dewletê malbat e ku çavkaniya wê ya sereke pêwendiya jin û mêrî ye. Ji belgeyên sedsala 5an a BZ xuya ye ku cara pêşîn Konfuçyûsê çînî (551-479 BZ) qala vê teoriyê kiriye û li gorî wî, malbat parçeyekî rêxistina civakî ye; ji aliyê malmezinekî ve tê rêvebirin û endamên din bi fermana wî tevdigerin. Rêxistina dewletê malbateke pirşaxî (dewleta makro) ye û malbat bi xwe jî kakilê dewletekê (dewleta mîkro) ye; ango malbat (kakilê tovekî) geşewe hatiye, şax û peraş daye, berfireh bûye û di encamê de saziya dewletê (dar) derketiye holê. Li gorî Arîstotelesî (384-322 BZ), destpêka dewletê (civaka rêxistî) malbat e; malbat jî ji jin, mêr û koleyan pêk hatiye. Malbatê gund, gundan bajar û bajaran dewlet pêk aniyê ku saziya wan a kemilî ye. Woodrow Wilsonî (1856-1924) jî li ser dewletên mezin xebatên lêkolînî meşandine û gihiştîye wê encamê ku di pêkhatin û geşedana dewletê de pêwendiyên hevniyadiyê roleke girîng lîstine. Dîsa li gorî wî, dewletên destpêkê malbat bûne û di pêvajoya dîrokê de gihiştine asta dewletên îroyîn; ango dewlet malbateke mezin a pirşaxî û pirfonksiyonî ye.

Bi giştî ev teorî sazûmana dewletê dişibihîne malbatê ku bi domana demê re berfireh dibe û hiyerarşiya dewleta xwe li ser bingeha xizmên nêzîk ava dike. Gava malbat veguhere xanedanekê, îcar ev xanedan bi eşîrên nêzîk û hevalbendan re peymanan girêdide û bi vî awayî xekek bi xekek berfireh dibe. Di çarçoveya vê teorîyê de dewleta kurdan a dîrokî Medistan jî konfederasyoneke eşîrên kurd û hevpeymanên wê ye. Bi rastî gelek gotinên pêşyan ên kurdan hene ku tu dibêjî li ser mal û malbatê nehatine gotin, qey mebesta wan dewleta mirovî bûye: “maleke ava, çêtir e ji sedên xerab; mal ava nabe bi xap û viran; mala bê sermiyan wêran e û derdê bê derman e; mal li ser malê nabe; mala aşiqan bi malbarkirinê xerab û kavil dibe; mala bê aqûbet zû belav dibe; mala bê malxwe kes nizane mezin kî ye; mala bê malxwe mîna xwarina bêxwê ye; mala bê pisîk, mişk tê de pelewane; mala bê sermiyan wekî pezê bê şivan e; mala ku bizmar lê tunebe, mirov nikare çakê xwe dayne wir; maleke bi tifaq beramberî êlekê, êleke bi tifaq beramberî dewletekê...”

2. Teoriya zindînasiyê (biyolojîk)

Li gorî “teoriya zindînasiyê (biyolojîk)”, pêkhatin û damezirîna dewletê dişibihe mirovî; wekî ku mirov tê ser rûkalê cîhanê, dewlet jî bi hinek bandoran jixweber derdikeve holê, bi gera dem û dewranê re bi pêş dîkeve û di dawîya dawîn de mîna mirovan dimire. Îcar ev dewleta organîk, wekî mirovan ji gelek endaman pêk tê, bi vî rengê zindî dijî û pêkhatiyên civakê kar û barên van endaman (organan) bi cih tînin.

Teorîsyenên vê ramanê pêkhatiyên civakî yên dewletê wekî laşên mirovan bi nav dikin û li gorî her peyrewê endamekî mirovî destnîşan dikin ku Platon, yek ji parêzvanên herî navdar ê vê teorîyê ye. Platon di berhema xwe ya bi sernavê “Komar” de ev mijar aniye rojevê û alegoriyeye wiha saz kiriye: “Çawa ku mêjî tevgera mirovan bi rê ve dibe, serwer jî civak û dewletê bi rê ve dibin. Çawa ku dilê mirovî hêmaya wêrekî ye, ewlekarên ku civakê diparêzin û ewlehiyê peyda dikin jî hêz û wêrekiya civakê (dewletê) temsîl dikin. Çawa ku dev û aşîk (mîde) pêwistiyên laşê mirovî dabîn dikin, hilberîner jî pêdiviyên welatîyên dewletê peyda dikin.” Platon gotinê tîne ser wê yekê ku di navbera sazûmana mirovî û ya civakê de berwariyek (xêzeke paralel) û wekhevîyek heye û wiha berdewam dike: “Wekî ku cendekê mirovî li ser sê beşên sereke rawestiyaye, sazûmana civakê jî li ser sê beşan ava bûye: yên ku di civakê de serwer in, yên ku şer dikin û yên ku diravan berhev dikin”. Li gorî wî, yek ji van beşan parçeyekî zêhna mirovî ye ku di hizire, dirame û mijarên rengrengî dijmêre; ev beşa ku hişmendiya mirovî nîşan dide, di tevn û avahiya civakî de taybetmendiyên berwarkî yên çîna serdest rave dike. Çawa ku hişmendiya mirovî tevahiya laş û tevgerên mirovan bi rê ve dibe, çîna serdest jî her gav sexbêriyê li beşên din ên civakê dike. Beşa din a mirovî ji hizirîna zêdetir daxwazên xwe pêşkêş dike û di rastiyê de daxwazên hundirîn ên mirovî temsîl dike ku çîna hilberîner nîşan dide; bi gotineke din çîna karkeran di sazûmana civakî de qalîteya organîzmeyeke zindî rave dike. Beşa sêyem jî hesta hêrsê ya mirovî ye ku qehremanî û mêrxasiya wî derdixin holê; di avahiya civakî de

leşker û peywirdarên parastinê vî aliyê mirovan pêk tînin. Mirov dikare bibêje ku Platon mirovî organîzmayeke zindî dihesibîne; dibêje ku ji hêla rêgezên karîgeriyê ve tevn, sazûman û avahiya civakê û ya mirovî dişibihin hev. Bi kurrtaşî li gorî wî, sazûmana dewletê organîzmayeke zindî ye ku ji organên cihêreng pêk tê û her endamek karekî diyarkirî dimeşîne.

Gava mirov çavekî li gotinên pêşiyên ên kurdan digêrîne, dibîne ku kurdan jî nêzikî vê alegoriya Platonî hin tişt gotine ku divê baş werin nirxandin. Di destpêkê de divê bê gotin kurd ji aliyê mecazî ve peyvên “serî”, “mêjî”, “hiş” û “aqil”î hertim bi wateya hêza serweriyê bi kar tînin; her wiha wateyên wêrekî, vîndarî û biryardariyê li peyvên “dil” “hinav” û “qelb”î bar kirine: “serê her kesî, li ser sînga wî ye; serî çiqasî bimîne, qûn ecêban dibîne; serî mezin e, lê aqil tê de tune; serî qûç e, binî pûç e; serî tê birin, ziman nayê birîn...” “dile rûtan bi xeman xweş e; dilê şivên bixwaze, dikare ji nêrîyê şîr bidoşe; dilê te ku fireh be, cihê me dê hebe; dilê te naşewite, bila pozê te bişewite; dilê tirsonek sînga gewrê nabîne; dilê xerîban tim ber bi malê ve ye; dilê xweş her lê bihar e; dilê yekî kete kevirekî, heft salan ew bi xwe re gerand...” Dîsa di çand û zimanê kurdî de wateyên dîplomasî û nûneriyê li “dev” û “ziman”î hatine barkirin; her wiha hinek sînor ji bo dagirtina zikan hatine kêşan: “zik bi razan û mizdane têr nabe, bi xebat û kedê têr dibe; zik heye, çal e; zik ne sifre ye ku hemû kesî bike xwe; zik têr e, çav birçî ye; bila zik têr be, hez dikî bila ji tovê dêr be; zikek du minetan hilnagire; zikê xwe hîn neke du nanan, bejna xwe hîn neke du kiras û xeftanan, ji te re li hev nayê hemû dem û dewranan; zikê wî têr, xew lê xêr; zikê zarokî tijî ye, lê dev nagere...”

” “devê ku hînî viran bû, qûna ku hînî tiran bû ray lê nabe; devê ku pîvazê nexwe, bîn jê nayê; devê xelqê ne doxîna mirovî ye ku bê giredan; devê xwar, ken lê nabe sitar; dev dixwe, lê çav şerm dikin/lê rû şerm dike; dev ji alfabejê berdaye, bi devê zirneya zer girtiye...”

3. Teoriya lihevhatin û hevpeymaniyê

Li gorî “teoriya lihevhatin û hevpeymaniyê”, berî damezrandina dewletê mirov di serdemeke bi navê “dewleta xwezayê” de dijiya; piştî mirovan bi hiş û daxwazên xwe biryar da ku ji serdema xwezayî derkevin, dema ku dev ji vê heyamê berdan, wan di nava xwe de lihevhatinek (peymana civakî) çêkir û ji vê hevpeymaniyê dewlet derkete holê. Wisan e, sazûmana dewletê di encama hiş û vîna mirovî bi xwe de hatiye damezirandin; di heyameke ku mirov ne xwediyê pergal, desthilatdarî û dewletekê bûn, serdemeke xwezayî dijiyan û piştî wan bi peymaneke civakî dawî li serdema xwezayî anî. Dema ku koma mirovên lihevhatî derbasî asta civakê bû, di dawiya dawîn de gihişt qonaxa herî pêşketî ya civakê û dewlet ava kir.

Ji sê parêzvanên teoriya lihevhatin û hevpeymaniyê Thomas Hobbes (1588-1679) diyar dike ku berî dewletê rewşeke aloz a şer û qirênan hebûye; lê belê mirovan xwestiye ku ji arîşeyên şeran rizgar bibin û di aştiyê de bijîn.

Li gorî wî, tirs mirinê û hêviya parastinê sedemkarên damezrandina dewletê, ango peymana civakî ne; her wiha mebest ji avakirina dewletê jî “ewlehiya kesane” ye. Parêzvanê duyem John Lock (1632-1704) jî diyar dike ku “peywira dewletê dabînkirin û parastina mafê milkiyetê ye”; sedema bingehîn a ku mirovan di bin banê dewletekê de dicivîne, destpêşxêriyeke civakî ye û her kes ji bo parastina mal-milkê xwe li ser hinek rêgezan li hev dike.

Parêzvanê sêyem Jean-Jacques Rousseau (1712-1778) jî destnîşan dike ku xwezaya mirovî di destpêkê de durist û baş bûye, lê bi dem û dewranê re ev pergala xwezayî rûxiyaye; lewre endamên civakê nûnerên xwe hilbijartine, ji wan nûneran desteyeke berpirsiyar pêk aniye û ji bo vegerandina pergala hilweşiyayî tevgerê hevpar ava kiriye û di encamê de dewlet û sazîyên wê derketine holê.

Her çiqas kurd neteweyê şerwan û mêrxas be jî pesna şeran nedaye û li gorî wan “şer ji bexwedîtiye çêdibe”: “şer ne xweş e, lê şername xweş e; şer jî şer e, nîvşer jî şer e; şer û nîvşer hevalên hev in; bi xatirê jihevhatinê lihevhatin...” Kurdan dema ku gotiye “danûstandinê bi mirovê ehmeq re meke” bal kişandiyê ser aliyên danûstandinê ku divê kesên eleqedar bi berpirsiyariya xwe rabin, ji ber ku “sozê mêran soz e, ne toz e” û gava “serdar daketin bindar rabûn...”

4. Teoriya aboriyê

Li gorî “teoriya aboriyê”, pêwendî û bûyerên aborî bandorê li ser bûyerên civakî û siyasî yên civakê dikin û di encamê de sazûmana dewletê derdikeve holê; wisan e, sazûmana dewletê ji layê kesên ku bi fikarên aborî tevdişerî hatiyê damezrandin ku berjewendiyên xwe biparêzin û bi piranî wekî “teoriya marksîst” jî tê binavkirin. Li gorî parêzvanekî vê teoriyê Friedrich Engels (1820-1895), di pêvajoya dîrokî de dewlet ji bo parastina milkiyeta taybet derketiye holê.

Parêzvanekî vê teoriyê yî herî girîng Karl Marks (1818-1883) jî dibêje ku cîhan di çarçoveya berjewendiyên aborî tê rêvebirin. Teoriya marksîst a aboriyê sazîyên civakî wekî “binesazî” û “banesazî”yê dabeş dike ku sazîyên binasazîyê jî bi ser xwe re sazîyên banesazîyê diyar kirine.

Sazîyên binasazîyê bi “awayên hilberînê” re eleqedar dibin; lê sazîyên banesazîyê bi mijarên wekî rewîşt (exlaq), mafnasî (huqûq), ayîn (ol, bawerî), huner, çand, helbest, zanist û wêjeyê re eleqedar dibin. Sazûmana dewletê sazîyê banesazîyê ye ku berjewendiyên aborî û awayên hilberînê diyar dike. Li gorî Karl Marks û Friedrich Engels, “heta roja îroyîn jî tevahiya civakan li dijî hev xebitîne û dîroka wan tekoşîneke di navbera çînan de ye; çînen zordest û bindest hertim tekoşîneke veşartî li dijî hev meşandine”. Kurdan jî welat û civat daniye rêza herarajorîn a jiyane; mebesta avakirina wê û sedemên parastina wê diyar kirine: “welat him dê him jî bav e, ne tê kirîn ne jî tê firotin; welatê xelqê ji mirovî re nabe welat, mala xelqê ji mirovî re nabe mal; welat xweş e bi welatiyan; welat welatê bav û kalan, nayê kirîn û firotin bi zêr û diravan...” “civat li mala pîrê ye û pîrê li mala xelqê ye; civat li mala Fatê ye û Fatê li mala Xatê ye...” Ji aliyekî din ve kurdan gazî şopandina bûyerên cîhanê kiriye da ku tevgera wan a civakî ji ya xelqê kêmtir û lawaztir nemîne; ji ber ku pîvana her tiştî heye, pîvana mirovan jî xelq e û xelq ji her aliyê ve mirovî kontrol dike: “xelq axê dikole, ew li serê xwe dike; xelq bû beg, ez bûm legleg; xelq dewletê çêdike, ez kolozê xwe tûj dikim; xelq ji hewarê tê, em nû diçin hewarê; xelq neynika mirovan e; xelqê mêr kir, me mor kir; xelqê xerîb ji mirovî re nabe dê û bav...”

5. Teoriya hêz û tekoşîne

Li gorî “teoriya hêz û tekoşîne”, dewlet amûreke zordariyê ye ku neheqiya hêzdarên li ser jaran rewê dike; ev cureyê dewletê ji bo parastina berjewendiyên hêzdarên hatiye damezrandin, bi siyaseta dagirkirinê bervepêş diçe û desthilatdariya xwe li ser civaka têkçûyî disepîne.

Wisane, dewlet saziyeke civakî ye ku ji hêla koma serkeftî ve li ser koma têkçûyî hatiye ferzkirin; ji bo ku desthilatdar serdestiya xwe ya li ser têkçûyîyan birêkûpêk bike, hertim li hemberî serhildanên navxweyî û êrişên derveyî rê û rêbazên êriş-ewlehiyê datîne. Armanca dawîn a vê serweriyê xurtkirina dagirkeriyê bi riya qurtkirina aboriya têkçûyîyan e.

Kurdan jî carinan pergala axatiyê rexne kiriye û bi vî awayî dagirkerî rewane kiriye; dema ku pêşiyên kurdan gotiye “axa bi xulam e, xulam jî bi olam e” an jî “axa bi xulam e, xulam jî tûletajî ye” bal kişandiyê ser tevgera çîna serdest û bindest. Her wiha gava wan gotiye “axayê sipîxur bê xulam dimîne” rexne li tevgera serdestan girtiye û diyar kiriye ku hinek pîvan û standardên xulamtiyê jî hene; heke mirov bi qasî mezinahiya navê saziya civakî tevnegere, ew dê nikaribe karker û xebatkaran peyda bike.

Encam: Teoriya piralî ya Ibn Xeldûnî û siha wê ya li ser gotinên pêşiyên kurdan

Teoriya dewletê ya Ibn Xeldûnî (1332-1406) di navbera “teoriya malbatê” û “teoriya zindînasiyê” de ye; lê di heman demê de aliyekî wê yî ayînî jî heye. Li gorî Ibn Xeldûnî, mirov dikare bi qabîliyeta ku Xwedê dayê rêxistinekê saz bike; lê belê ew bi tena serê xwe nikare serederiyê pê re derxe, lewre pêdiviya wî bi piştgiriya kesên dîtir heye, di encamê de ji nava xizmên xwe yên nêzik, dûr û hevalbendên dereke civatekê ava dike û digihêje yekîtiyekê. Ibn Xeldûnî diyar dike ku dewlet jî mîna mirovan çêdibin, mezin dibin, pîr dibin û dimirin; temenê dewletekê ji 120 salî derbas nabe û piştî pênc astan hildiweşe.

Di asta yekem a dagirkerî û damezrandinê de, rêveberiya leşkerî ya hêzdar di bin alaya pêşengekî de tê meşandin. Di vê astê de pêwendiyên hoz û tîreyan pir xurt in; desthilatdarê vê heyamê ne padîşah an jî serokek e, bi piranî pêşeng û serkêşê dozekê ye. (mîrov bê deng nabe, serdar bê zor nabe; mirov çar dîwaran datîne, giliyê wî tê de dimîne)

Di asta duyemîn a yekparêziyê de, pêşeng dizgîna hêzê zêft dike û hevgirtina xwezayî ya ku ew anîbû ser textê desthilatdariyê tarovaro dike û hevparên mekanîzmayê ji holê radike; bi gotineke din, tevgera eşîrî betal dike, şîrîkên kevn ji xwe dûr dixîne yan jî serkut dike, li şûna şêwirmendên pispor karmendên girêdayî xwe li dîwana rêveberiyê kom dike. (serdar daketin û bindar rabûn; axa bi xulam e, xulam jî bi olam e)

Di asta sêyemîn a geşedanê de, derfetên aboriyê zêde dibin û hêmanên çandî bervepêş diçin; pêşeng hem hewl didin ku derhata xwe ya kesane zêde bikin hem jî bi kêmkirina bacên bindestan çavkaniyên darayî yên dewletê piralî bikin ku bajaran bi endazyariyê xweşik ji nû ve saz bikin. Di vê heyamê de her kes para xwe ji destbelaşiya aborî werdigire: huner, zanist û pîşesazî tîrî teşwîqkirin; çînen serdest sexbêriyê li projeyên çandî dikin, geşedan û azadî serdestiyê li rojeva dewletê dikin. (welat xweş e bi welatiyan; xelq neynika mirovan e.)

Di asta çaremîn a têrbûnê de, her kes ji xwe razî û pozbilind dibe; aramî û aşî serdest e, di rêveberiyê de înnîsiyatîfa nûjenxwaz wîndî dibe, rêveberiyên kevn tîrî teqlîdkirin, serdest-bindest wisane bawer dikin ku derketina ji tewereya dewletê wêrankarî ye, ev aramî û serfiraziya wan a heyî jî sermedî ye. Li gorî hêz û serfiraziya damezrînerên dewletê, dibe ku ew rewş bi rastî jî demeke dirêj bidome; lê belê êdî paşvemayîna û perçebûna sergirtî dest pê

dike, dewlet derbasî asta dawîn a şahî, dêzkirin û pûçbûnê dibe. (xelq dewletê çêdike, ez kolozê xwe tûj dikim; xelq ji hewarê tê, em nû diçin hewarê.) Asta pêncemîn û dawîn a dewletê jî pêvajoya berbelavbûna kêf-şahiyan, dêzkirina sermiyana gel û hilweşîna sazûmana dewletê ye. Di vê hengameyê de desthilatdar hewl didin ku bûyerên aborî û civakî li gorî daxwazên xwe yê kesane bi rê ve bibin, lewre derdên bêderman li cendekê dewletê radibin. Desthilatdarê ku piştgiriye ji artêş û burokrasiyê werdigire, ji bo berdeamiya konfor û lawaniya xwe rêjeya bacan hildifirîne; lê belê bilindbûna rêjeya bacan bandoreke neyînî li ser çalakiya aborî dike, derhatên dewletê kêmbûn û encameke berevajî armanca padîşahî diqewime. Îcar hêviyên mekanîzmaya rêveberiyê ji dewletê sist dibin û bêhêvîti radiweşe nava civakê jî; êdî çalakiyên aborî radiwestin, mirov nikare plansaziyên demdirêj bisepîne, rêjeya zayînê kêmbûnê, pest-fişarên gelheyê û pirsgirêkên hawîrdorê li bajarên giran derdikevin holê, hûnaka dewletê dibişkive û vedireşe, rayedarên dûtî navendê li deverên xwe doza xweserî yan jî serxwebûnê dimeşînin, li paytextê jî artêş û burokrat dest bi revandina desthilatdariya serdest dikin, hêza serwerê welêt vedigere pile û sernavan. Di dawîya dawîn de civakeke ciwan û tendurist li derve asta xwe ya rêxistinî dikemilîne û ber bi navendê dimeşe; bi hêseke xurt dewletê dagir dike, avahiya kevn a hilweşiyayî bi erdê re rast dike û sazûmaneke nû ava dike. (mîrov bi xurtî distîne, lê bi sistî dide; dev ji alfabeyê berdaye, bi devê zirneya zer girtiye.)

Çavkanî:

- Amed Tîgrîs (2001), 6762 Gotinên Pêşyan, Weşanên Rewşen, Stockholm.
- Aristotle (1981), The Politics (wergera inglîzî: Trevor J. Saunders T. Sinclair), Penguin Classics.
- Franz Oppenheimer (1922), The State: Its History and Development viewed Sociologically, (wergera inglîzî: John M. Gitterman), B.W. Huebsch, New York.
- Jean-Jacques Rousseau (1968), The Social Contract, (wergera inglîzî: Maurice Cranston) Penguin Classics.
- Jean-Jacques Rousseau (2016), A Discourse on Inequality (wergera inglîzî: Maurice Cranston) Penguin Classics.
- Nîkolay Mîxaylovîç Deyev (1993), Gosudarstvennost' i ekologîçeskoye razvitiye: Politicheskoye problemy teorii gosudarstva, Moskova.
- Peter Bogucki (1999), The Origins of Human Society, Blackwell History of the World, Oxford.
- Plato (2007), The Republic (wergera inglîzî: Desmond Lee), Penguin Classics.
- Samiyeh Bin Umer (2006), "Ed-Dewletu 'inde Ibn Xeldûn", Mecellet'ul-'Ulûm'il-Ictima'iyyeh, Cami'etu Umer Selîcî El-Exwat, El-Cezaîr, c. 1, h. 2, r. 262-275; <https://www.asjp.cerist.dz/en/article/31778> (dema gihiştinê: 24.07.2021; 22:56).
- Serhat Duvenci (2018), "Kuvvet veMücadele Teorisine GöreMezopotamya'da Devletin OrtayaÇıkışı" Uluslararası Yönetim Akademisi Dergisi, h. 1 (1), r. 106-117; <http://dergipark.gov.tr/download/article-file/464348> (dema gihiştinê: 24.07.2021; 01:14).
- Suheyle Zeyn'ul-Abidîn (2016), "Nazariyyet'ud-Dewleti 'inde Ibn Xeldûn", Mecellet'ul-Menar, h. 74-76; <https://uqu.edu.sa/ahsharif/4584> (dema gihiştinê: 24.07.2021; 23:12).
- Thomas Hobbes (2017), Leviathan, Penguin Classics.
- Woodrow Wilson (2005), The Essential Political Writings, Lexington Books, Lanham.

Helbest: Wefaî Leyla Bavê Min Mir

Bavê min mir
Penceşêr ew zû bir
Şam bi tevahî li dû xwe hişt
Dabenceyên wî yên şelûlî li dîwaran xaç kirî ne
Wêneyên kolanên reş û spî
Abdel Nasser li ser xalîyekî Farisî çekiri ye
Diravên zîvîn li binê bîranînan olan didin
Ehmed leyla mir
Dayik li dû xwe hişt
Çavên girtî
Û dilek qulkirî
Rêzeya kernel
Hemî hevalên nebaş
Um Kelsûm di kasêtên xwe yê bedew de digirî
Şanoyên feyrûzê
Bêhna xwîdanê ji çend xaniyên ku me li dû xwe
hişti bûn tê
Hemî laşên me li wir man
Werîn
Mîna nehigan xwe dikujin



Wergera Kurdî ji Erebî: Mîran Dilêr

Bavê min mir ...
Ew gelekî dirêj bû
bi çavên tûj mîna bazê birîndar
Wî muzîka xwe bi xwe re bir
Ew şiyana soberî
Berî ku bibîne ka çi bi me hatî
Heşt zarokên wî
Hemî ber bayê Ewrûpa ketin
Pêlên bilind bû, bavo
Ew bû î ku neviyên te birin dûr
Lawê te ê ku navê te bir
Bû "meyger" iskanên vala tiji dike dibin baskê tarî
yê de
Kurê te yê navîn
Kes nemabû ku wî talan nekiribe
Li peyarê Stockholmê winda bûye, navê wî bi zor
tê bîra wî
Keça te ya herî bedew
Li bajarekî ku li başûrê sermayê ye
Xwîna me li beja belav bû
'Lehengê yekemîn ê nûçeyê'
Te tiliya xwe ya navîn radikir
Kengê ku ew di nûçenmeyê de xuya dibe
Ew di binaxkirina hemî xwîna te de bi ser ket
Bajarê te
Xeta otobûsa te ya kevin
Evîndarên te
Diya te
Wêneyên te
Hemû pûlên ku te hewldana komkirinê dikir
Tu bi tenê mayî di gora xwe de
Dûrî, bavo
Dûr û berdayî
Tu kes serdana te nake
kes ji te re fatihê naxwîne
Hemû zarokên te di deryayê de hatin daqurtandin
Bê ku bimirin
Kî dimîne ...
Li benda şansê xwe
Li ber deryayê.

ÊL BEGÊ CAF : MUX, PÎRMEND Û PÊŞBÎNVANEKÎ MEZÎN Ê KURD Ê JI BÎRÇÛYÎ?

SORAN HEMEREŞ

WERGERA JÎ ZARAVAYÊ SORANÎ: MUHSÎN OZDEMÎR

Dema ez zarok bûm di nava civakeke windabûyî di xwe de, gelekî kêfa min bi naskirina pêşbînîkerê navdar ê cîhanê Nostradamos re dihat. Ew mirovê Fransî nêzîkî sala 1503an li Fransayê ji dayik bûye û pêşbîniya gelek bûyerên piştî xwe kiribû. Her çiqaş îro li ser ravekirin û hebûna pêşdîtinên wî gelek nîqaş hene jî hinek bawer dikin ku gelek pêşbîniyên îroyîn bi zorî têne şîrovekirin û xelk bi zehmetî wateyê dide pêşbîniyên wî. Hin pêşbîniyên wî jê re hatine çêkirin, lê çima ji bo me zanîna wî zilamî di wê zarokatiyê de nîşana sebrê bû, ji ber ku navê wî Ewropî bû û nasîna kesayetiyên Ewropî di wê demê de nîşaneya rewşenbîrî bû û tevî ku ev diyarde hîn bi zelalî tê dîtin. Lê nêzîkî yanzdeh sal berî ji dayîkbûna wî mirovê Ferensî, li Kurdistanê mirovekî zana û pêşbînvaneke cîhanî yê Yarsanî yê bi navê Êl Begê Caf ji dayik bû. Ji ber ku kurd bû, ne tenê li cîhanê kesî navê wî nebihîst, belkû piraniya kurdan jî hay ji pîrmendî û zanayîya wî zilamî nînin.

Berî ku em behsa Êl Begê Caf bikin, divê hinekî em berê xwe bidin çanda pêşbînîkirinê ya di nav kurdewariyê de. Ev çand di çavkaniyên dîrokî de, di nav Muxan de gelekî pêş de bûye.



Li gorî Heredot, Medî ji şeş hozên serekî pêk dihatin; yek ji wan hozan jî hoza Mûxan bûye û jiyana xwe ji kar û barên olî re veqetandibûn. Ev Med/Kurd, piştî şikestina medyayê jî ewqasî bandoreke wan a mezin li ser herêma hebûye, Farsan ji bo ku hêza xwe xurt bikin û desthilatiya Medan kêr bikin, rojekê, bi taybetî ketin nav serbirîna Medîyan û kuştina wan. Roleke mezin a Muxan di jiyana xelkî de hebû. Di wê demê de bêyî Mûxan kesekî nedikarî qurbanîyê bide. Wan rola peywendîya di navbera xweda û gel de dileyistin. Lê di demên kevnar de Mux wekî taybetî ne bi ser olekî taybet bûn, belkû ew mirovên olî bûn û li gor bîr û bawerîya wê demê ew xala têkiliya di navbera xwedayên cur bi cur û xelkî de bûn. Muxan xewn şîrove dikirin û pisporên astronomiyê/stêrnasiyê bûn ku wê dême weke beşeke ji olê dihatin dîtin û difikirîn ku çarenûsa mirovan bi stêrkan ve girêdayî ye. Mux bi astronomî û girêdana wan bi jiyana mirovan re ewqasî navdar bûn, tew Încîl jî di têkildadariya ji dayîkbûna Îsa de behsa sê Mûxan dike, ku wan li rojhilatê ve bi rêya stêrnasiyê ve pêşbînîya ji dayîkbûna Îsa kiribûn û di dema ji dayîkbûna Îsa de gihîştibûnê û diyariya xwe pêşkêşî wî peyamberê ji nû ji dayûk bûyî kiribûn. Pêşbînîyên bi vî cureyî di nav Mûxê Kurd/Medî de beşek ji şîyanên wan ên olî bûn, helbet beşeke baş ji wê zanîna peywendîya xwe bi hişyarî û agahdarbûna wan a li ser bûyerên dora wan ve hebûye, lê di wê demê de nîşaneke olî ji hemûyan re hat dayîn. Çanda pêşbînîkirinê di nav kurdan de hê maye; di nav ola Yarsanî de çend mînak hene pêşbînîya bûyerên piştî xwe kirine. Ji wan jî yek jê Êl Bagê Caf û Xan Almasê Luristanî ye. Êl Bagê Caf di sala 1492ê zayînî de li Şarezûrê ji dayik bûyê û di sala 1553ê zayînî de koça dawî kiriye. Her weke di navê wî de jî xuya dike, Êl Beg bi ser binemalekî Cafî bûye û Soranîxêv e.

Vî mirovî li Şarezûrê xwendîye û heyamekê çûye Bexdayê û piştî serdana hin bajarên Îranê kiriye. Hin çavkanî dibêjin ku Êl Beg ketîye bin gefa Misilmanên Şarezûrê û ji ber wê ji Şarezûrê derketîye û berê xwe daye Hewramanê. Lê çavkaniyeke pêbawer di holê de nîne ku piştigirîyeke zelal jê re bike. Êl Beg heta dawîya emrê xwe bi rêberîya mirovan re mijûl bûye û di temenekî nêzî 61 salî de koça dawî kiriye.

Wisa xuya ye gelek berhemên helbestî yên ola Yarsanî yê vî mirovî hebûne, lê ya ku maye û bi wê jî navdar bûye helbesteke pêşbînîkirinê ya bi navê "Kê we qewlî kê dekat"(Kê bi Gotina kê dike) e. Di vê helbesta nazik de El Beg gelek pêşbînîyên xwe radixîne berçavan ku haveynê matmayînê nin. Gelek destnivîsên wê helbesta Êl-Beg li holê mane. Yek ji ya herî kevin di sala 1854an de hatiye nivîsandin. El Beg, di destpêka wê helbestê de qala wê tiştê dike ku ew bi gotina Goranan dike, hema hema hemû li ser ola Yarsanî bûn û dibêje:

*Min be qewlî Goran dekem qise lejêr hewran
dekem Hemûy le bo Soran dekem îta'etî
dewran dekem Her wa buwe w her wa debê*

Ango:

*Ez bi qewlê Goran dikim-Gotinê li bin ewran
dikim
Hemûyê ji bo Soran dikim-Îta'eta dewranê
dikim
Her wa bûye û her dê wa be*

Li derekî dibêje:

*Merdan merdî gezef deken hem be rastî
xelaf deken
Qisan be tîr qelan deken be rêgey dûr mesaf
deken
Her wa buwe w her wa debê.*

Ango:

*Merdan û peya derew û gezafê dikin li rêya
rast xîlafê dikin
Gotinan ji dûr ve li hevdu dikin
Her wa bûye û her dê wa be.*

Li cihekî din El Beg dibêje:

*Gelê dillim be teng debê seday top û tifeng
debê
Serrî serbaz be şeng debê êran dîlî fereng
debê
Her wa buwe w her wa debê.*

Ango:

*Dilê min pir dibe teng çimkî dibe dengê top û
tifing
Wisa şerê leşker dibe bi fişeng û Îran dikeve
bindestê Freng
Her wa bûye û her dê wa be.*

Vê carê jî dibêje:

*'êl begî dî dillgîr debê ferengsatî zincîr debê
Eran û Rom nexçîr debê ewsa feza tesxîr debê
Her wa buwe w her wa debê.*

Ango:

*'êl Beg êdî dilgîr dibe-Ferengistan hev
digre(mebest Awropî ne)
Îran û rom(Osmanî) destê wan digre û asîman
jî mirov digre
Her wa bûye û her dê wa be.*

Helbesta Êl Beg dûr û dirêj e û di vir de tenê çend rêzik jê hatin gotin. Di vê helbestê de Êl Beg balê dikişîne ser derketina firokeyan û afirandina peywendiyêke dûr di navbera mirovan û damezrandina sîstema komarî û her wiha gelek guhertinên din ên li Kurdistan û cîhanê.

Ji bilî ku pêşbînî û zanyariyên balkêş ji bo wê demê di helbestê de hene, di heman demê de ritmeke pir nazik têde ye û pir hêsane ku bikin stran. Di nav Yarsanan de ev helbest wek ku di vê lînkê de tê jî dîtin bi tembûrê tê gotin:

<https://www.youtube.com/watch?v=m2aMEwjsiPM>

Her wekî hatî gotin, pêşbînîkirin di helbestên Xan Elmasê Luristanî de jî ku ew jî mirovekî Yarsanî bûye, tînin. Xan Elmas helbestên xwe bi zaravayê Hewramî gotine ku wekî zimanê olî yê Yarsanî lê hatine meyzandin.

Ez bawer im eger Êl Beg zilamekî faris, tirk an ereb bûya, îro piraniya xelkê cîhanê û kurdan jî teqez dê ew nas bikran, dibe ku hin ferdên kurd pê serbilind xwe pê bikin û xwe pê ve têkildar bikin. Lê mixabin ji ber ku ev zîlam kurd e, piraniya me hay ji helbestên wî yê kêmpeyda nînin.

*Nîşe: Êl Beg ne Mûx bûye, sedema wekî
Mûx navê wî anîn di vê gotarê
de, berdewamiya çanda bêşnbînîkirina a
Mûx e.*



Newaf Mîro

Êzîdiyo

Dubare
Sêbare
Çarbare
Êşa te hezARBARE ye Êzîdiyo!
Girî û gazin
Şîn û gotin ne çare ye!
Hêviya neke ji navnîşanên şaş!
Bila xwîn û keda te neçe li ber avê û belaş.

Fermana te
Êşa te
Peyva te dubare ye Êzîdiyo!
Êşa te ji piştê ye
Ji pişt ve tu hatî kuştin, firotin û tu tê ajotin!
Tu bi her kesî re bira yî
Lê her kes ne birayê te ye Êzîdiyo!

Duha û qewlên te dubare ye,
Tu ducara ji cîranên xwe re
Carekê ji xwe re dixwazî Êzîdiyo!
Me xêr xwest şer ji me re hat!
Me aşî xwest nan, nav, war û ol ji dest diçin û çûn!
Xêrxwazê xwe be
Hay ji ol û erkanên xwe hebe
Bav û kalên me serî dan û sir nedan
Mirin û dest ji Ola xwe bernedan!
Ji kesekî re nebe benî, leşker û xulam
Dunya deyndarê xîreta te ye Êzîdiyo!

Êzîdiyo,
Peyva te
Fermana te dubare ye
Nebe aşiqê evda
Li me zêde neke dijmin, kul û derda!
Çav bernede deftera pera
Tu ne erzanî, xwe erzan neke!
Hawara te Tawisî Melek e
Sal bi sal êşa te
Ferman û reva te dubare ye Êzîdiyo!



Bahadîn Robar

GIRÎNGIYA ZIMANÊ NIVÎSKÎ

Bêgûman ziman ne bi nivîsê çêdibin. Heke zimanê devkî tunebûya zimanê nivîskî û pêve girêdayî nivîs bi xwe ne pêkan bû. Yanî di destpêkê de peyv û hevok, biwêj û çîrok ne bi nivîsandinê têne saz kirin û verêstin. Lê belê amûr û rêbaza herî zêde zimanî tekûz û mayînde dike bêşik nivîs e. Li gel ku kurd hevdemên sumeran in û bi sumeran re nivîsa mîxî bikaranîne jî di hêla arşîvkirin û veguhestinê de pêngavek xurt û kêrhatî neavêtine. (Heke gavek wisa avêtibin jî serdest û serweran ew bincil kirine. Jixwe ez bawer dikim ku kurdan bermayî û berhemên nivîskî ji me re hiştine.) Kurdan serpêhatiyên xwe bi stranên cur bi cur anîne zimên. Ev serpêhatî bi awayekî devkî nifş bi nifş bisedan salan, heta bihezarên salan hatiye veguhestin û strîn.

Gelek cureyên stranên kurdî hene û kurdan bi van stranên evînên xwe, lorînên xwe, zêmarên xwe, şer û cengên xwe, bêrîkirin û hezkirinên xwe, şîr û şahî xwe, ayîn û dawetên xwe û dîrok û çîrokên xwe, çand û zimanê xwe, ol û baweriyên welat û axa xwe bi stranên anîne zimên. Gelek stranên ku berî sedan salan hatine nivîsandin heta îro jî tenê strîn, bes di

domana demê de çîrok û naveroka van stranên jî ber ku nehatine nivîsandin û tenê bi rêbaza jiberkirinê hatine strandin bi awayek nerasterast ew stran jî reseniya xwe derdikevin. Carinan bi tîpekê, carinan bi peyvekê, carinan jî bi hevokekê wate, mebest, armanc û rastiya stranên diguhere. Her çî qas di hêla parastina zimanê dayîkê de dengbêjî xwediyê rist û rola herî sereke be û yekane dibistana zimanê kurdî be jî têra parastin û pêşxistina hemû aliyên zimên ên civakî, siyasî, aborî, tendirûstî, zanistî û teknîkî nekiriye. Jixwe encex heta astekê dengbêjî bikare zimên biparêze. Dema dengbêjek an jî çîrokbêjek dimire ew zanîn û komasiya çand û zimên jî pê re dimire û winda dibe û diçe. Kesên peyrewên wan heman karî dikin jî li gorî behre, karîn, zanîn û fêmkirina xwe ew stran û çîrok dewr girtine û ji bo nifşên nû vegustine. Bi vî awayî nifş bi nifş ew stran û çîrok heta roja me hatine. Di roja îroyîn de ew ji bo me çavkaniyên herî girîng û jêner in. Ji ber ku pirtûkxaneyek kurdan a weke "Pirtûkxaneya Kraltiyê ya Îskenderiyeya Misrê (B.Z 300)" û "Pirtûkxaneya Neteweyî ya Frensa (P.Z 1368) tune bû kurdan gelek çîrok û dîrok, karesat û guherînên gerdûnî, wêje û çanda xwe ji wêjeya devkî girtine. Wêjeya devkî bûye nivîs, bûye hiş û bîr, bûye pirtûkxane û bûye dibistana kurdan. Lewre heta demek nêzîk hegemon û serdestên erdnîgaya kurdan nehiştine zimanê kurdî di nava gelê kurd de bibe zimanê perwerdehiyê. Zimanê perwerdehiyê di heman demê de zimanê nivîsandinê ye. Zimanê nivîskî jî mekanîzmaya pêşvebirina gencîneya peyvên û hilberîn û gihandina nivîskar û wêjekarên e. Ziman çî qas pêş bikeve raman û jyan jî ew qas bipêş dikeve.

Gencîneya peyvên zimanekî ku ne nivîskî çî qas zêde be jî di vê serdema ku çand û zimanê serdestan bi gelek rê û rêbaz û amûrên cur bi cur û rasterast bandorê dike de ne gengaz e ku zimanê dayîkê (zimanê devkî) xwe li hember van amûr û rêbazên (dibistan, Zanîngeh, îbadetxane, televîzyon, rojname, kovar, çapemeniya civakî, telefon, şano, sînema civîn û civatên) bi zimanê serdestan tê kirin bikare xwe biparêze û pêşve

bibe. Lewre zimanek û neteweyek ku di vê serdema amûrên bişaftin û tunekirinê zêde bûne de dil li ser hebe xwe pêşve bibe divê teqez nivîs û berhemên xwe bi zimanê xwe yê zikmakî binivîsin. Heke ne wisa be, ne gengaz e ku zimanek weke zimanê kurdî ku çar netewe-dewlet dixwazin wî tune bikin bikare rewşa xwe ya heyî biparêze û xwe pêşvetir bibe. Tenê zimanê devkî têrê nake ku ew ziman bikare bijî. Ji ber ku "... ziman û nivîs du pergalên hev cuda ên nîşandanê ne û sedema hebûna nivîsê jî ji ber hebûna zimên e." Yanî heke ziman tune bûna pêwistiya mirovan jî bi nivîsê tune bû. Zimanê nivîskî ango axaftina nivîskî gelek dewlemendî û taybetiyên di hundirîne. Heke mirov hin taybetî û girîngiya wê bîne zimên wiha ye. Di serî mirov dikare bêje zimanê nivîskî mayînde ye. Zimanê nivîskî bipergal û tekûz e. Zimanê nivîskî hînkê û perwerdekar e. Zimanê nivîskî taybetî û reseniya zimên diparêze û qada lêkolîn û xebatên li ser jiyana civakî, neteweyî berfireh dike. Zimanê nivîskî winda nabe û ji bo nifşên nû mîras dimîne û pêşiya nifşên pêşerojê ronî dike. Zimanê nivîskî ji bo pêşvebirin û lêkolînên li ser heman zimanî sûdwer e û materyalên cur bi cur pêşkêşî mirov dike.

Her roj û sala derbas dibe zimanê nivîskî mezintir, geştir û xweştir dibe. Zimanê nivîskî weke awêneyekî her tim li ber çavên mirov e û derfeta sererastkirin û bersivdayîna pêdiviyên demê dide mirov. Zimanê devkî ango zimanê nayê nivîsandin berevajiyê zimanê nivîskî ye. Mirov dikare neyîniya zimanê devkî jî bi çend xalan wiha bîne zimên. Zimanê devkî bêpergal û tevîhev e. Zimanê devkî tê jibîrkirin. Di veguhestinê de dibe ku beşek, hevokek, peyvek an jî wateya esasî ya peyveke kêr bê veguhestin û di wê hêlê de qels bimîne. Zimanê devkî tê jiberkirin lewre hin kesên çîrokbêj û dîrokbêj dema dimirin ew zanîn û zanyariyên wî zimanî jî pê re dimirin. Zimanê devkî nikare were tomarkirin û arşivkirin, lewre her herêmeke wî welatî zarava û devokên cuda diaxivin û jihvefêmkirin qels û kêr dibe. Zimanê devkî li hember aşê bişaftin û tunekirinê nikare li ber xwe bide û zû têk diçe. Zimanê devkî bi salên dirêj di veguhestina nifşên nû de nikare resenî û taybetiyên xwe yên rastnivîsî û rêzimanî biparêze. Gelek caran û li gelek deveran hin

komasî û keda civakê ya bi wî zimanî devkî hatiye kirin winda dibe. Lewre li ser her kesê deman û merc e ku bi zimanê xwe yê zikmakî/dayîkê biaxive û bi heman zimanî binivîse jî. Pêwîst e herkes hînbûn, xwendin û nivîsandina bi zimanê dayîkê weke erkeke neteweyî û fermaneke îlahî bihesibîne û li gorî wê jî tevbigere. Heke em wisa nêzîk zimanê xwe yê dayîkê nebin, di hundirê 15-20 salan de wê zimanê me ji holê rabe, an jî wê ji holê bê rakirin. Lewre aş û beraşê bişaftinê bêwestan û bêrawestan li ser zimanê me dizivire û dibişêve. Divê neteweyên weke kurdan du mînakên di Rojhilata Navîn de hatine jiyîn jibîr nekin. Mînaka yekem derbarê zimanê îbranî de ye. Wekî tê zanîn zimanê îbranî ji holê rabûbû, lê belê bi ked pêşengiya Yehuda û xwedîlêderketina gelê îbranî careke din ew ziman zindî bû û bû bingeha yekitiya neteweyî ya îsraîliyan. Di hêla din de gelê asûrî û keldanî heta berî du hezar salan jî gelên herî bibandor yê Mezopotamyayê bûn, lê ji ber ku dev ji axaftin û nivîsandina zimanê xwe yê zikmakî berdand û man hêviya serdestên xwe ve hema bêje îro ji vê cîhanê qediyane. Ma rast e ku ev gel bi mirinê qeliya û qediya? Na, ne gengaz e ev yek bi mirina fizîkî pêk hatibe. Nexwe çawa çêbûye? Ev gelên qala mijarê ne, ji ber neaxaftin û nenivîsanda zimanê xwe bi demê re şibiyane serdestên xwe û bûne biyaniyên gel û zimanê xwe. Ango mirina spî pêk hatiye. Mirina çandî û zimanî pêk hatiye. Divê mirov ji xwe re îbret û ezmûnan ji van herdu mînan bigire. Mirov dikare mînakek hê balkêştir bide ku girîngiya zimanê nivîskî zelaltir raxe ber çavan.

Dem deman arkeolog an jî hîn lêkolînerên din ku li ser teht û zinaran nivîsên bizmarî û hiyeroglîf pêşkêşî raya giştî dikin û qala bihezaran sal dîroka wan a dirêj dikin. Hin nivîsên berî 5 hezar salan li ser teht û kevalberan hatine nivîsandin di roja me ya îroyîn de derdikevin holê. Ev jî nîşan dide ku ew ziman çawa ye û çawa hatiye parastin. Zimanê ku hat nivîsandin û ew nivîs jî hate zêdekirin, weke ku mirov li ser keviran nivîsandibe ew qas tê parastin û ji bo nivîsên nû tê veguhestin. Zimanê nivîskî weke li ser teht û zinaran hatibe nivîsandin mayînde û qewîn dibe. Bes zimanê ku neyê nivîsandin û tenê bi axaftinê re sînordar bimîne weke nivîsa li ser berfê hatî nivîsandin e. Çawa ku ew berfa çavê tavê dibîne û dest bi helandinê dike ew zimanê nehatî nivîsandin û tenê bi devkî tê bikaranîn jî bi demê re dihele û ew ziman ji holê radibe.

www.arsivakurdi.org

Jİ BO ÇÊKİRÎNA E-KOVARAN

MÎTANNÎ AJANS

mitanniajans@gmail.com